aram

**Em bûn baran…**

Mizgîn RONAK

**Weşanên Aram**
ŞEVDA Basım Yayın Markasıdır

***Çap:*** Nîsan 2011

**Koordînatorê Weşanê:** Mehmet Emin TEYMUR
**Edîtor:** Zerdeşt ROJHILAT
***Yê ji bo weşanê amade kiriye:*** Mizbah FÎSKAYA

**Çapxane:**
Gün Matbaacılık
Reklam Film Basım Yayın San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sk. No: 23/A
Küçükçekmece İstanbul
**Tel:** 0 (212) 580 63 81

**ISBN:** 978-605-5454-24-1

**Şevda Basım Yayın**
Kooperatif Mah. Gevran Cad. Sarıoğlu Apt Kat:4 No: 14
Yenişehir / DİYARBAKIR
Tel: 0 412 229 00 30

# Em bûn baran…

Mizgîn RONAK

AramRoman

## Kurtejiyan

***Mizgîn Ronak;*** di sala 1973'yan de li Amedê hatiye dinê. Di temenekî ciwan de biryarê têkoşînê daye û tevli refên şervanên azadiya bûye. Di wê jiyana ji agir de hêvî û zindîbûna wê zêdetir bûye û her dem bi evîndarî û dilxwazî karê xwe berdewam kiriye.

Di Tebaxa 1992'yan de, li Amedê hatiye girtin û piştî darizandinê; cezayê muebetê girtiye. Li girtîgehên cur bi cur maye. Wek gelek girtiyên azadiyê li girtîgehê bi lehengî li ber xwe dide.

Mizgîn Ronak; bi salan e ligel hemû astengiyan jî; nivîsên xwe yên di Rojnameya Azadiya Welat de berdewam dike. Gelek berhemên wê hene, lê ji ber rewşa heyî ya çap û weşanê, heta niha tenê pirtûka wê ya helbestan a bi navê "Sêv jî me dikujin" hatiye çapkirin.

# PÊŞGOTIN

"Em bûn Baran"...Û ew " bûn Baran" Ba û Baran ji bo mirovên ku di serîrakirinê de ne, wekî kirasekî ne tu car jê nabe. Çima "em bûn baran?" Ev pirsa mêjuyî û hestiyarî di dilê we de çend kulîlk vedike? Ew, kulîlkên ku nayên çilmisandinê. Lewre, kulîlkên niştimanî, kulîlkên mirovahî ne yên ku ji xwe re dibêjin; "em bûn Baran"... Jiyana gerîlayekî, hestên gerîlayekî baraneke her dimî ye. Ne ji wan baranên demdemî, wekî baranên demsalî ne. Ji ber vê jî hest, psîkolojî û ramana gerîlayekî Kurdistanê, demsal demsal in. Di zivistaneka dijwar de ew dikenin, di bihareka honik de ew helbestvan in û di havîneka germ de ew rêwîyên bêdawî ne. Gelo payîz li ku ma? Wekî ku tê gotin: "dilo wez bimrim, dilo hawar, li vê payîzê"... ew jî wiha ne. Geh barana payîzê û geh barana biharê ne.

Di wan çiyayan de, di deştan de an jî di quntara wan bilindahiyan de jiyanek çawa tê dijîn? Ên ku bibînin û nebînin dibêjin nabin wekî hev. Ev rastî ji bo gerîlatiyê hin derbasdar e. Kî dizane şervanek, dema ku amadekariya çalakiyê dike çi dirame? Kî dizane şervanê bi çek û rext û narincok, di dilê xwe de çi vedişêre? Gelo yên ku li gerîla dinêrin niha ji xwe re dibêjin: "ew wekî pola ne, tiştek bi wan nayê" an jî "ew, ji şer pê ve tiştek nafikirin." Ev nêrîn hem rast e û hem jî ji rastiya gerîlatiya Kurdistanê dûr e. Lewre gerîla di serî de mirovek e. Û ew jî xwediyê xeyal, xwediyê hest, û xwediyê evînê ye. Lê evîn û xeyalên rastî û qutsî, ku ne wisa bûna gelo ewê karibûna di bin qeşemê de rabûna dîlanê, an jî bi tilîliyan, bi dirûşman şerê xwe bi meşandana?

Di vê pirtûka ku ji rojek an jî ji demeka gerîlatiyê hatiye himatê, ev rastî xweş dertê holê. Gelê me tê de heye. Kesayetiyên balkêş ên cangorî û wekî din ên ku xwe tam bi biryar nekirine jî tê de hene. Evana tev hatine jiyîn, rastiya demeka dijwar in.

Di demên dijwar û bêeman de nakokî hin zelal in. Û ji van nakokiyan mirov digihîje rastiyan. Jiyaneke ku berê her kesî digot; “tenê şer”. Ne ji van dijwarî û zoriyan bûna ev qada ku tê jiyîn nedihate vê qonaxê. Lê çiqas dijwarî hebe jî di şerê panzdeh salan de ew qas xweşî jî heye.

Ew; ango gerîlayên kurd, bi dilekî zîz, hem kulîlkan neperçixandine û hem jî çavên xwe ji tu tiştê ku li dijî rastiyê ne, neqirpandine. Baran in ew! Dibarin… Axê şil dikin, kulîlkan av didin. Bi şehîdên xwe re, welatê ku tim bi goristan û bi girîn e, dilgeş dikin.

Bi gundîtiyên xwe bi “küçük burjuvazîti yên” xwe ew tev bûne baran. Baranên welatî…

Û her gav û her dema ku tê jiyîn, bîranîneke mezin e.

De ka em veşartoka Kemal, Piling, Binevş, Zozan û koçerên Mamedî vekin û em biçin hêla Tetwan, Bedlîs û zozanên wan deran…

Bila Sîpanê xelatê jî bi me re be… Bila Sîyabend, Xecêya xwe li ba me bibîne…

Bila, xezal jî, bi me re bibezin, di wan çiya û deştan de. Bila mirad di vê jiyanê de bigihîjin hev.

Em bûn Baran… Em bûn kulîlk…

***Fatma Ulkem TEKÎK***

Roj hêdî hêdî diçû ava… Bayê berêvarê şax û pelên darên mazî, çinar, guvîj û sêvan dihejand. Bilbilek dixwend û dixwend. di kûrahiya daristanê de. Dengê wî li newala kûr û asê olan dida û dibû awazek nepenî li ber guhê şervanên jînê, yên li çiyayên Kurdistanê…

Li bakur cihê wan li çiyayê Nemrûd hebû, Nemrûdê Tetwanê-Tûxê. Li rojava çiyayê

Kilxwar ê Norşînê hebû û li rojhilatê wan jî çiyayê Motka hebû. Dikişiyan diçûn, digihîştin

çiyayên Amed û Çewlikê…

Dem dema ceng û cengaweriyê bû… Dem dijwar, bêaram û bê mecal bû… Lewra awarte ne hin dem, nayên vegotin. Ango tu gotin nikare rastiya wan bîne ziman…

Rastiya wan deng û rengê dîrokê ye, birîndarî û hêviya dîroka dil û ramanên mirov e. Ango ew demên awarte dibin gotin, dibin ronahî ji rastiyên lal û kor re… Wek zinarên paqij

û neqişandî, bilind dibin li çalên tarî û bêxêr… Ji çavan re dibin çirûsk, ji lalîtiyan re dibin

awaz, ji bêkesan re dibin stare…

De ka em dîsa vegerin li dema bêaram…

Bayê nermik, dîsa xwe li porê wê yê ku li ser milên wê sekinîbû xist.

Bayê, tim zarokatiyê dianî bîra wê… Zarokatiya baskperperok, zarokatiya li bajar û deştên dûr… Nizanibû çima lê ji serê şefeqê ve xemgîn bû…

Zozanê jê pirsî:

- Qey tu nexweş î?

- Na!...

- Wisa be, te xewnek nexweş dîtiye Binevş…

- Na… Ez baş im… Em ê îro biçin çalakiyan jî…

Zozana Başûrî, keçika çavreş rûgilover, şervana rûken û zimanşîrîn, carina weke dayikan bi hestên xwe fêm dikir rewşa mirovan, rewşa hevalên xwe û heya ku ji destê wê bihata guhdarî dikir. Dîsa pirsî bi dengekî nermik û rûyekî bi ken:

- Helal be Hevala Binevş!

Te dîsa minawere (manevra-şervanên Başûrî, ji ber bandora erebî

wiha digotin.) kir. Em ê biçin çalakiyan. Em ê biçin, lê beriya wê, tu rûken bibî baştir e…

De ka were em biçin ba hevalan, waye dicivin li dora agir… Binevşê got: " haydê em biçin… Jixwe ez jî ber bi wir ve diçûm…" Bi hev re meşiyan di nav şiveriya zivironek û bi

pelên zer xemiliyayî de… Çawa ku nêzî koma ku hêj nû rûniştiye bûn, Kemal dîsa serkêşî kir. Kemal; xortê çavşîn… Dibe ku hemû çavên şîn nexweş bin, ne kûr bin. Lê çavên

Kemal şîn û kûr bûn wek deryayekê… Loma jî ku çavên mirov bi çavên wî diket,

derya dihate bîra mirov û te nikaribû awirên xwe veqetanda ji çavên wî… Ango hin tiştên bi awaz û kûr, hin tiştên dûr, nêzîk û fêmdar hebûn di çavên wî de… Dibe ku çavên wî,

rengê xwe ji kûrahiya Gola Urmiyê û şînahiya Gola Wanê girtibûn. Bi bejna xwe ya hinek bilind û dagirtî, bi mijang, birî û porê xwe yê zer, bi rûyê xwe yê spî û pozbilind tim şiyar bû, li dora xwe dinêrî… Zêdetir jî, giyana wî şiyar bû… Ranediza qet, nediwestiya… Li xwezayê, li rûyê şervanan dinihêrî, dipeyîvi, guhdarî dikir… Dixwest ku, fêm bike, bibe çare û derman… Çawa ku heval bû, kekê-keko jî bû ji wan re… Jixwe bi temenê xwe yê li dora sî salî ji hemû şervanên di komê de mezintir bû… Loma jî carinan digot:

"Binêrin, hûn hêj nûhatî ne, biçûk in… Ez baştir dizanim…" Wiha digot û van gotinan

dibûn rastî di jiyanê de… Bi helwest û tevlikariya wî ya bi coş, dilnizm û fedakar, dibûn rastî ew gotin... Lê wan nêzikatiyên wî yên dilgerm, carinan dibûn bela jî li serê wî… Ango her kes wek wî bi fêmîn û durist nêzî hinek tişt û bûyeran nedibû. Loma jî di vê helwesta xwe de tenê dima û carinan jî rastî sûîstîmalkirinan dihat. Qenciya xwe li hemberî mirovên neliyaq jî dida xuyakirin û dawiyê tewş derdiket keda wî. Jixwe ev rewş ji zarokatiyê de li pey wî bû…

Erê Kemalê çavderya peyivî bi rûkenî:

- Fermo, fermo hevalno! em jî li benda we bûn. Me digot em ji xwe re stranan bibêjin. Jixwe hevalên me yên hozan jî hene… Hevala Binevş, ka werin li vir rûnên… Hevala Zozan, maşallah te dîsa çeka xwe biriqandiye…

Li kêleka hevalên xwe rûniştin… Lê di nava vê civata dilgeş û bicoş de jî xemgîniya Binevşê derbas nebû … Zozan li aliyekî dipeyîvî, li ali-

yekî jî berê xwe didayê, li nava çavên wê, dinêrî û bi dizî digot: "Ooy Hevala Binevş…Tu hê jî rûtirş î, nakenî…" Binevşê tenê serê xwe dihejand û ji bo ku ew rewşa wê pir balê nekişîne, hema bêje bizorê dikeniya, tevli axaftinan dibû…

Ciwanî; bihara mirov û mirovatiyê, rengîniya jiyanê ye. Ciwanî, lehengî û evîndarî, fedayîtî û dilgeşî ye. Tew dema ku ciwanî, li serê çiyayên Kurdistanê be ji bo armancek pîroz delaltir û hêjatir e… Êdî ciwanî destana herî ronahî ye, bi kesbûna yeko-yeko ciwanan, bi evînên dilê wan, zanînên wan… Loma jî ew koma ciwanan a ku li dora agir rûniştibûn, di vê havîna çiyayan a hênik de wekî çemekî diherikîn diçûn…

Gotinên wan, wekî perperokên biharê yên rengîn difiriyan tevli ken û xemên wan dibûn ên ku hêj xwe, ji zarokatiyê xelas nekirine…

-Hevalno, dema ku ez li Botanê bûm rojekê...

Piling:

Hewar! Hevalê Ozkan dîsa dest bi bîranînên Botanê kir… Tu bi xatirê Xwedê kî bisekini Heval, jixwe me hemû bîranînên te jiber kiriye… Ozkan weke her carê ji hêrsan sor bû û got:

-Halla-halla!… Heval destûr bide em bêjin, te gotin di devê min de hişt. Ku bîranînên mirov hebin, mirov çima nebêje… Ne wisa ye hevala Zozan?

Zozan:

-Tu dîsa li alîkariyê digerî heval. Te vê carê ez dît im… Lê weleh ne wisa ye… Me hemû bîranînên te jiber kirine…

Ozkan:

-Heyran hevalno, hûn çiqas kubar bûne… Mirov newêre tiştekî bêje ji we re…

Piling bi ken:

-Te dîsa alîkarî nedît heval!… Ew jî dide nîşan ku ez mafdar im… Û em kubar jî nebûne… Kemal:

-De bes e hevalno, gundîno… Heyrana çavên we gundî û şoreşgerên hêja…

Binevş:

-Hevalê Kemal, wekî ku tu yê piştî "gundîno" bigota " kuçuk bûrjûvano!" Lê te di sansurê de derbas kir û got "Şoreşgerên hêja"

Kemal:

-Aha! Binevşa me keniya û peyivî …Te çawa fêm kir ku min gotina "kuçuk bûrjûva" derbas kir… Min ê çi bigota loo… Hevalno me civîna gundîtiyê xelas kir! Em niha rûpelek nû vedikin… "Ey dîrok veke rû-

pelên xwe!" Hate bîra we? Em ê niha… Jixwe hevalê Ozkan jî dev ji bîranînan berdaye… Newisa?

Ozkan:

-Bila wiha be… Fermana hevalê me ye!...

Kemal:

- Ne xem e heval! Rojê me pir in hêJ… Em niha guhdariya hevala Binevş dikin… Fermo heval!

Binevş:

- Heval ez ê biçûma nobetê… We dîsa bi min dest pê kir.

Kemal:

- Na Heval, dora te ya nobetê nehatiye… Em li te guhdar in .

Binevşê dest bi stranê kir: "Ala rengîn pîroz û xweş… Li ser milê xortan dimeş… Ger ez bimrim, ger ez hebim, cîgerxwîn im serbilind im…" Dengê wê, weke aveke biharê zelal û xweş bû… Ji kûrahiya dilê dê dihat an jî ji kûrahiya dîrokê. Jixwe tim jê re digotin: "Dengê te, ji te mezintir e." Birastî jî wisa bû. Temenê wê hivdeh bû. Ango hêj nû, vê havînê ketibû hivdehan… Lê rûyê wê?... Rûyê wê weke gulê bû… Jixwe hinarikên wê tim sor bûn. Ango sorîtiya zarokatiya xwe winda nekiribûn… Rûyê wê spî bû, lê çav û biriyên wê reş bûn digel porê wê… Pozê wê biçûk, lêvên wê nezirav ne jî stûr bûn. Ango xweşik bû Binevş… Bi rûyê xwe zarok, bi dilê xwe mirovek mezin, bi dengê xwe pîr bû… Zêdetirîn bi dengê wê mirov ew nas dikir, fêm dikir… Ango giyanek dilkêş hebû di dengê wê de. Dibe ku qala mirov dikir û dibû dengê dilê mirov… Dibe ku, hin tiştên di kûrahiya rastiyên dîrokê de kuştî mabûn, şiyar dikir… Ku bi şev bigota, berbang û rojên geş dianî bîra mirov. Ku bi roj bigota jî, lalîtiya şevê, stêrk û heyverona şevê dianî bîra mirov. Ango mirov dibir dûrahiyan dengê wê…

Zozan:

- Te dîsa em mest kirin hevala Binevş… Ez pêşniyar dikim ku heval bibe hozana vê civatê, tim bibêje… Hûn dibêjin 'solîst' dibêjin çi?Ango bila niha tim ew bêje…

Binevş:

- Heval, ka ez hinekî bêhna xwe bidim. Çi hozan-mozana te ye… Bila niha jî hevalê Piling ji me re bêje… Fermo!

Piling:

- Ez dikarim bêjim, lê tu jî soz bide ku tu yê dîsa bêjî…

Binevş:

- Erê heval, ez ê bêjim…

Pilingê piling, çavê xwe girt û devê dilê xwe vekir… Li ser "serhildana mala

Elîyê Yûnis" got… Ji ber ku hemû serhildanên kurdan negihiştibûn serkeftin û bextewariyê,

stranên li ser wan jî, bextewar nebûn, birîndar û dilşewat bûn… Bêmiradiyê, bi piranî mirinê digotin…

Kesî nizanibû ku Piling ji ku ye. Ango dizanibûn ku, ji Tûxê-Tetwanê ye, an jî

Mijê-Mûşê ye. An jî ji navbera herdû deran e… Jixwe çiqas bimeşiyana bi tiliyên xwe

yên nazik wek ê keçikan, çiya û newal nîşan dida, digot: "Ew çiyayê ku ji dûr ve dixuyê, çiyayê Şerefdînê ye. Ew deşt diçe heya filan derê. Ev deran memleketê min e. Ez baş dizanim ha!

Erê Piling, ji wan deran bû. Lê weleh kesî baş nizanibû cihê wî. Jixwe ew qas girîng jî nebû.

Her kes, ji her derê û ji tu derê bû! Ma kanê mirov çawa qala kesbûn û mêrantiya Piling bike!

Erê Piling, piling bû xortekî beza û çeleng bû… Hinek simbêlên qehweyî, ango mûyê nû li ber pozê wî hinekî dirêj hebûn. Dengê wî yê xortanî stûr, kenê wî gur, şervaniya wî dijwar bû… Lê weleh Piling jî hêj zarok bû, nû bi ser panzdeh-şanzdehê xwe ketibû…

Loma jî dixeyîdî carinan û tu zagonên fermî yên 'eyb û şermê' guhdarî nedikir… Dibû kesayetek cuda… Ew Pilingê kenzarok, çeleng û dilgerm diçû, yekî qure, bêkar û bêziman dihate cihê wî… Ji koma hevalan dûr diket, diçû li bin darekê, an jî li ber zinarekî rûdinişt û wisa dima bi saet û rojan… Ango ew Piling çiqas şervan bû, ew qas jî dilnazik bû… Loma jî kesî nedixwest ku bixeyide… Ji porê xwe yê qehweyî û hinek kurîşk jî, pir hez dikir Li ber her kaniyê şeh dikir… Carinan hevalan jê re digotin: "maşalah heval, te dîsa tûncik şil kiriye! Çi dibiriqe jî!" Digot:

-Min baş kiriye Hevalno! Ma çima porê xwe bela-wela û gijik bihêlim? Lê sor jî dibû her car, şerm dikir ji wan gotinan… Kemal digot: "Saetê te xweş be! Bira çima dibêjin saetê te xweş be! Ango siheta te xweş be ne wisa…"

Kemal:

- Tu dizanî hevalê Piling, wê rojê gundiyekî digot: "Çima êdî ew hevalê we yê dengbêj nayê?

Me bêriya wî kiriye." Ez fikirîm- fikirîm min ji hevalan pirsî, lê me nedît ku ew dengbêjê me kî ye? Dûre min pirsî: "Heval yekî çawa ye?" Ji min re got: "Heval tûncika wî hinekî kûrîşk e pir bedew e. Wê gavê min fêm kir ku ew dengbêj hevalê me Piling e.Weleh xweş dibêje û tûncika wî jî xweş e! Ma çima hûn dikenin hevalno? Ew jî rastiyek e… Qey tu aciz bûyî Hevalê Piling… Ji viya xweştir çi heye ku gelê mirov ji mirov hez bike…

Piling dîsa sor bûbû:

- Hevalno, devê min venekin ha! Êwe hemûyan jî nav û deng û çawa bêjim… Ango hûn jî navdar in di nava gel de… Hevalê kemal qe nebe ji min re nabêjin 'çavşîn' û porzêrîn…Û bi piranî jî keçik û bûkên gundan li te dipirsin… Çawa bêjim, dibêjim qey, ji çavên te hez dikin. Jixwe yekî jî digot: "Gelo hevalê we yê Kemal, ji Ewropayê ye?" Qet nebe ku min naşibînin ewropiyan!...

Vê carê Kemal sor bûbû.Te digot qey rih û simbêlên wî, zertir bûne û dibiriqiyan:

- Ya star ! Tu çi yeman î… Te gule li min barand heval! Ku keç û bûk ji min hez bikin jî ne ji bo çavê min in… Ez bi wan re diaxivim loma… Ez ji wan şerm nakim wek hinek hevalên me.

Binevş:

- Hevalno çi dirêj bû ev mesele! Sax bî hevalê Piling! Te ew qas gotin ji ku anî…

Piling:

- Hevala Binevş, jixwe min te ji bîr kiribû. Ji te re jî dibêjin: "Hevala rindik, henarik sor… Hevala hozan û şîrîn." Jixwe xortên gundan jî pir dipirsin li te… Tu çima aciz dibî îcar…

Kemal dît ku dê mij û dûman derkeve:

- Bes-bes hevalno! Piling hevalê min ê hêja, wan nêrînên xwe dikarî paşê jî bidî xuyakirinê… Hevala Binevş, tu jî xwe aciz neke, gundî ji te hez dikin, ev jî tiştekî xweş û watedar e…

Piling:

- Hûn mirov şaş fêm dikin… Gundî ji min jî hez dikin, hevalê kemal! Çima tu viya nabêjî?

Zozan:

- Hevalno! Gel ji we hemûyan jî hez dike. Heya niha gazin ji we nekirine. Hevalê Piling jixwe mesele bi te dest pê kir. Hevalê kemal got ku gel ji te hez dike. Em niha dîsa stranên xwe bêjin… Ma we civata me ji bîr kir? Jixwe hozana me jî amade ye… Em bidomînin, şev tê, em ê bi rê kevin êdî…

Kemal:

- Tu rast dibêjî heval… Jixwe me axaftinên gelek kûr û zelal… Hevalno, bi rastî jî dema me hindik maye… Ooy ooy! Şevek dirêj û bi çalakî li benda me ye. Jixwe nobedar jî amadekariyan dikin . Lê hêj nîv saetê me maye… Em dikarin dengê hozana xwe ya Binevş guhdarî bikin…

Bêdengiyek dest pê kir. Te digot qey yên ku gava din dor nedidan hev, ne ev civat bû… Li benda Binevşê bûn. Lê Binevşê serê xwe dabû ser çokên xwe yên ku herdûyan kiribû yek… Tenê paşiya serê wê dixuya, te digot qey ne li civatê ye… Zozanê destê xwe da ser milê wê û bi ken:

- Ohoo! Hozana me hêj ne amade ye? Heval em li benda te ne…

Binevşê hêdîka serê xwe rakir. Lê nedikeniya:

- Çi ye heval? Ez ne hozan mozan im! Hûn stranan bêjin!

Kemal wan rewşên wê baş dizanibû ji bo ku pêşiya hêrsbûna wê bigire:

- Hevala min, jixwe tu ne hozan î. Em henekan dikin…Tenê stranekê bêje ji me re strana "Dayê ez xatir ji te dixwazim, bi xwendin û zanîn ez serfiraz im" Haydê hevala Binevş, me zûde guhdariya vê stranê nekiriye… Tu dizanî ji bo min wateyek wê ya giring û taybet jî heye.

Binevş:

- Na heval. Ez nikarim bêjim… Ango bi zorê mirov nikare stranan bêje… Dilê min şikiya carekê… Li qusûrê nenêrin…

Kemal:

- Heval tenê wê stranê bêje… Xwezî dengê min xweş bûya min ê tim ji hevalên xwe re bigota… Dilê te çawa şikiya heval… Li me bibore…

Zozan:

- Binevş, tu jî pir ecêb î… Ma tu nikarî stranekê jî bibêjî! Kesî dilê wê neşikandîye Hevalê Kemal, jixwe ji sibehê ve sar û xemgîn bû, li emanan bû…Ooy çi înad e, de bêje heval…

Binevş:

- Hevalno, tika dikim, bisekinin! Rast e ji serê sibê de dilê min şikandi, sar û xemgîn e. Sûcdar jî ez im, kes nîn e… Lê ez nikarim niha stranan bêjim.

Kemal:

- Heval! Me dixwest dilê te derman bikira. Lê xuya ye ku ev ne hêsan e… Lê bi vî awayî tu jî dilê me dişkînî… Em hinek paşê biçin çalakiyan, bikevin nav gulebaranan, tu zanî… Dibe ku hin ji me venegerin jî. Qet nebe em dilê hev neşkînin… Te bigota baş dibû… Dibe ku, Kemal îro hebe sibê tune be… Tu sibê bêjî jî, dibe ku nikaribin guhdarî bikin.

Eniya Binevşê şil bûbû ji xwedanê.

- Heval ka qala mirinê nekin… Dibe ku ez jî sibê neyêm, şehîd bikevim û nikaribim êdî tu stranê bêjim… Mirovan bi gotin û mijarên wiha birindar nekin…

Zozan:

- Hevalno, xêr e?... Em ji ku hatin li ku? Ew maye ku em rabin goristanekê bikolin… Dibe ku çalakiya me bi serkeftin be û tu kes ji me şehîd nekeve… Dereng nebû hevalê Kemal? Ne wisa hevalno, bûye dereng…

Kemal:

- Dereng e, hevalno wexta stêrk derkevin… Em amade bûn jixwe… Em ê li gund ji hev biqetin, bibin du kom… Em hemû baş û amade ne, ne wisa? Xemgînî memgînî nema!...

Binevş:

- Na Heval! Em li benda vê gavê bûn çend roj in… Ez ê… Piştî çalakiyê gelek stranan bêjim ji we re… Hûn çiqas bixwazin… Ya ewilî jî "Dayê ez xatir ji te dixwazim".

Kemal:

- Ax ax heval! Tu yê baş bikî… Lê îşev îşev e, sibê sibê ye… Ku te îşev bigota xweştir bû…

Piling, bi ken:

- Hevalê Kemal, te jî weke Demîrel kir… Ew dibêje "duh duh bû, îro îro ye!" Te jî got: Îro îro ye, sibê sibê ye…

Kemal:

- Ma nerast e? Îşev îşev e, sibê sibê ye… Ooho… Stêrk jî derketin hevalno! Hêdî hêdî bêhna barûdê tê pozê min… Şev jî hênik û xweş e… Heqet hevalê Sînan, herdu dûrbîn jî bi te re ne?... Dengê wî ji paşiya komê hat:

- Ez li vira me heval! Herdû dûrbîn bi min re ne…

Kemal:

- Qey tu nexweş î heval? Çima li wî dawiyê sekiniyî û bêdeng î wiha?

Sînan:

- Erê heval hinek nebaş im… Lê ji çalakiyê re amade me…Ji we hemûyan pirtir amade me…

Kemal:

- Baş e, baş e… Em êdî bi rê kevin hevalno… Jixwe berê me li gund e niha. Em ê xwe bera gund bidin… Parola: "Deşt û zozan" haydê hevalno, rê li benda me ye, serkeftin ji me hemûyan re!

Hemûyan bi hev re gotin: “serkeftin” û bi re ketin… Jixwe rêwîtî bû jiyana wan. Diçûn û diçûn, dîhatin û dihatin, lê dîsa diçûn bêsekn. Dibe ku rê jî ew bûn. Ango ew ciwanên fedaî, naşî, bi xeyal û armanca xwe, bi temen û rastiyên xwe, bi zarokatî nebesî û hêzdariyên xwe re bûn êdî… Û RÊWÎ bûn…

Asîman xemilî bû bi stêrkan. Stêrkên dawiya havînê, stêrkên geş. Li rojhilatê asîman hê jî şopa ronahiya rojê hebû… Ango ji bo berbangên ronahî, xwe tarîtir nekiribû ji aliyên din… Bayekî hênik dihat û dihejand şax û pelên daran, gul û giyayan… Giya û zeviyên ku hişkbûyî bûn, dikirin xişexiş… Jixwe navê tewrekî giyayek beyanî ku kûlîlkên biçûk û rengîn dide, xişxişok e. Ew giya bi hêşîntiya xwe jî, bi hişktiya xwe jî dike xişexiş… Ba nedisekinî, bêhna dûyê sergîn, êzing û qirşikan dianî ji zozan û gundan… Dengê çeman dihat ji dûr. Bayê dengê çeman ji dûr dianî… Tew dema ku mirov tî bûya, bayê dengê avê dianî guhê mirov û tîbûna mirov har dikir… Mirov dixapand jî bayî. Lewra te digot qey waye tu gihîştî avê û dê tîbûniya te xelas bibe… Tu yê bi çeng û kulman , bi tasik û metere û sawilan têr û tijî avê vexwî… Dest û devê te jî şil dibûn bi avê, bi hênikahiya wê… Lê na tewş bû her tişt! Ango bayê tenê dengê avê dianî, ji bo ku tîbûniya te zêde bibe, ji bo ku dil û cîgera te ziwatir bibe, bişewite… Bayê dengê erebe û trênan jî dianî di şevên ronahiyê de… Dilerzînin li qorneyan dixin dûr diçin, diborin ji mirovan û ew deng jî mirov dibe dûrahiyan… An jî berî her tiştî erebe û trênên ku mirov li ku û kengî li wan siwar bûye û rêwîtî kiriye tîne bîra mirov… Carinan berbûkên dawetan jî tîne bîra mirov… Û ew kesên ku mirov wan nas kiriye hemû di nava gavekê de, di saniyeyekê de têne ber çavên mirov… Û pirsek: Gelo vana bi ku ve diçin… Gelo kî ne ev rêwî? Mirovên paqij in an na… Pirs û çerxa bîranînan didome, lê haya tu kesî/ê ji mirov tune. Lewra kes nizane ku hin mirov, hin ciwan, ji nava wan derketine, wekî wan hatine dinê, jiya ne, lê bûne cîhaneke din… Bi pey dil û xeyalên xwe, bi pey rastî û dîroka xwe ketine û çûne… Kes nizane ku ew mirov di wê cihana xwe de li wan dinêrin, ji bo wan dijîn… Bi deng û rengê wan, bi tevgera wan, bîranînên xwe dijîn. Lewra ew; ne ji wan in êdî… Dibe ku dilkevir an jî dilnerm bin, dibe ku wêrek an jî bêxem, zana an jî dînik bin… Lê ew ew in… Nayên fêmkirin… Bêne dîtin jî nayên dîtin… Dimeşin û dimeşin… Dikevin û radibin, dîsa dimeşin… Feda dikin evînên dilên xwe, daxwazên xwe yên ferdî, temenê xwe yê nûhatî…

Nêzî riya gund a bi qîrê bûbûn êdî… Wekî her gavê rûniştin. Çentê wan mala wan bû, di demên wiha de berpişt û balîfa wan bû… Erê çenteyên tijî gule û bombe balîf bûn ji wan re… Her yek cîhanek bû, her yek di cîhanekê de bûn... Her yek heyecanek, her yek xatirxwestinek, her yek leyîstokek bêeman bûn li dijî mirinê… Jixwe leyîstoka wan a herî mezin bi mirinê re bû… Loma jî wekî her gavê dema ku Kemal gotibû "dibe ku ez şehîd bibim" her kes keniyabû, her kes vê bûyera erjeng û bêdeng ji bo xwe xwestibû, ji bo xwe ramiyabû… Ma mirin kî bû û çi bû? Dikaribû kî/kê biqetanda ji axê, ji armancê û ji hevaltiyê… Kemal dîsa çavên xwe ji rê neqetandibû:

- Hevalno, ew ronahiyên wisa li dû hev hene… Çiqas pir in… Bîst û pênc… Gelo ronahiyên dawetê ne, ango berbûk in, an jî yên erebeyên leşkerî ne? Hûn dibînin?

Piling:

- Erê heval! Çi zû diçin… Lê ez dibêm qey ê dawetê ne… Kî çi zane diçin li ku û berbûyê kîjan bûk û zava ne? Em jî çiqas riyan dibînin hevalno! Her şev çiqas erebe biçin û werin… Çi zanim, em jî pir dibînin û haya wan ji me tune… Lê em dibînin… Çiqas gerîlatî xweş e!... Ew kî ye wiha dikene loo!

Binevş:

- Ez im hevalê Piling. Te axaftinek berfireh… Ooy, ez nikarim bipeyivim ji vî kenî…

Zozan:

- Ken baş e, xweş e heval bikene.

Binevş:

- Kenê min bi wê gotina te hat heval… Te got: "Gelo kî bûne bûk û zava… Evana berbûyên kîjan bûk û zava ne…" Wekî ku te axînek dikişand di navberê de…

Piling:

- Hevala Binevş, Xwedê mirov bistrîne! Tu wiha heyfa xwe ji min distînî? Lê ez nayêm 'provokasyona' te… Îcar min axînek kişandiye! Ma çima axîn bikişînim… Ez her roj û her şev zava me, her gav daweta min e!...

Vê carê hemû kes keniyan.

Kemal:

- Gundîno, hûn ê dijmin bînin temaşa me! Lê Piling tu jî mirov ji kenan dikujî… Dême em niha berbûyên te ne, ne? Tu jî zava yî! Hevalên me çi yeman in!

Piling:

- Yaw hûn çiqas mirov aciz dikin! Spas dikim hevala Binevş! Bi Xwedê ez ê niha we hemûyan protesto bikim!...

Kemal:

- Hevalê min ê şîrîn. Dem ne dema protestoyê ye! Jixwe dê hinek paşê heval ji gund were û em ê bi rê kevin, xwe aciz neke… Te hinek berê got; "Çiqas gerîlatî xweş e…" Rast e… Heyecana ku em niha dijîn, tu mirov najîn belkî… Çi zanim… Lê aliyên zor jî hene…Te got: "Em wan dibînin, ew me nabînin"… Ew jî rastiyeke kambax e, zor e. Ango jiyana veşartî, îlegal zor e û xweş e… Meseleya wan erebeyan… Em niha îşev ji bo rêwiyên wan jî li vira ne, çalakiya me jî ji bo wan e… Lê haya wan ji me tune… Dibe ku navê me jî nebihîstibin… Di demên wiha da tim ew helbesta N. Hîkmet tê bîra min, dibêje: "Tu yê bimirî, bi zanîn bimirî ji bo mirovan… Ku haya wan ji te tune be jî tu yê bimirî…" Tiştê ku dixwazim bêjim; jiyana me ne hêsan e… Gotinên hevalê Piling jî rast bûn…

Piling:

- Sax bî heval! Gerçî hevala Binevş neecibandibû!...

Binevş:

- Hûn mirovan poşmam dikin. Ma heval min negot ku hevalê Piling rast nabêje… Ez tenê bi gotineke wî keniyam.

Kemal:

- Min jî ji bo te tiştek negot hevala min…

Zozan:

- Hevalno, we hişê me tevli hev kir! Her yek tiştekî dibêje… Hevalê Kemal ew helbesta ku te xwend jî zêde ne xweş bû… Hema mirin û mirin.!

Sînan:

- Hevalno, we nehişt em ji xwe re razên jî… Niha me çend xewn dîtibû…

Kemal:

- Helal be ji te re hevalê Sînan! Encama ku te qefalt ev bû!

Bi dengê fikînekê hemû bêdeng bûn. Şev jî, rê û rêwiyên li erebeyan jî, bajarê li milê rastûçepê jî, bêdeng bû… Gelo ew fikîn, a kê bû? A navçeya Mûşê Tîlê (korkut) nebû. An jî navçeya Bedlîsê Norşînê bû? An jî ew bajarê kevnare Mûş nebû fikand bi hemû bajartiya xwe… An jî Kela Bedlîsê? Ew deng ji ku hat… Stêrk nebûn, an jî gundên li derdorê?... Bajar û gundên ku bi sedsalan bêdeng dimînin, carinan difikînin, di şevên qedexeyî de… An jî lalîtiya xwe, çawa bi alî dixin?...

Kesê nexuyayî cara sisêyan jî fîkand û got: “Deşt û zozan!”

Kemal ji gava din ve rabûbû xwe dabû ber darekê, lê dinêrî… Bi dengekî nizim got: “Rabin hevalno” û ber pê ve çû:

Hevalê Cîhan, merheba!

Cîhan:

- Merhaba ji te re Kemal! We nava min qetand malxirab! Min got qey ez ketime nava kemîn memînekê…

Piling:

- Cîhan efendî! Em bi dahol û zirne bihatana pêşiya te? Ma tu çi dixwazî… Bixêr hatî kuro!

Cîhan:

- Di nava xêrê de bî!… Tu dîsa ji min re dibêjî “efendî…” Efendî tu û …

Kemal:

- Tu jî hindik efendî nîn î… Cilên te dîsa ji çend metre dûr ve diçirisiyan… Te wî montê wiha çirisok ji ku aniye? Dîsa ji hec mecê hatiye an ji Ewropayê? Jixwe parfûma te jî wekî her gav mirov serxweş dike…!

Cîhan bi ken:

-Erê weleh montê min ji Ewropayê hatiye, parfûma min jî… Ohoo! Merhaba hevala Zozan û Binevş! Diya min zehf silav li we kir… Got “bila di nava vê hefteyê de teqez werin. Hin xelatên min ji wan re hene!” Her roj qala we dike…

Sînan:

- Erê heyran, hevalên keçik tim bi torpil in! Xelatên taybet, silavên taybet…

Piling:

- Min zanibûya ev dinya wiha ye, min ê ji Xwedê re bigota “min bike keçik!” Ew qas siûd jî pir e…

Kemal:

- Hevalno nebiecin, dexesiyan nekin… Heval taybetî ne… Ku hûn wiha bikin, dê niha hevala Zozan û Binevş devê xwe vekin, dest pê bikin û heya sibê nesekinin ha!

Zozan:

- Na heval em vê carê napeyivin… Nayên “provokasyona” Sînan û Piling… Lê ku em dest pê bikin, heta sê rojan jî naqede. Lê baş e ku dema çûnê ye û çalakî heye li peşiya me…

Cîhan:

- Erê bira şêr şêr e, çi jin e çi mêr e!

Piling:

- Hevalê Cîhan te dîsa destek da wan bi vê stranê…

Cîhan:

- Ê heval ez çi bikim… Hûn jî hevalên min in, ew jî… Û hevalên keçik nazik in jî û…

Binevş:

- Înşalah tu dîsa nebêjî “nazik û guneh in, zeîf in!” Çunkî dê şerekî nû dest pê bike wê demê…

Kemal:

- Belê hevalên hêja… Belê “Gelê Qulpê”

Ozkan:

- Bixêr hatî “Hesen Deger!”

Kemal:

- Sax bî, tu jî bixêr hatî… Baş bû xeyda te qediya… Belê hevalno, Xwedê hifza me bike ji şerê xwişk û birayan… Xwedê mirovan bistrîne, ji şerê heval û dost û hogiran! Nebe nebe dest bi şerekî nû nekin. Hevala Binevş! Ji ber ku niha şerê me bi Komara Tirk û bi xayînan re ye… Em êdî bi rê kevin… Hevalê Cîhan, her tişt sererast bû ne wisa… Ka were em bi hev re bimeşin. Cîhan! Erê heval tiştên ku we xwestibû jî me hemû anîn…

Bayê şevê li rûyê wan dixist, li mijang û porê wan… Wekî destê dayikekê, ku rûyê zarokên xwe yên berşîr miz bide… Bayê şevê, ji çiyayên ku xwe bera jêrê didan dihat li rûyê wan dixist û tiştên xweş dianî bîra wan… Jixwe şevên bi ba lalîtiya dilê mirov nîn in… Şevên ker û lal, çend qêrîn û çîrokên bêdawî dihewînin di reşahiya xwe de… Gelo di demên wiha dijwar, bêaram, di demên wiha ji mû ziravtir, ji şûr tûjtir de, di demên wiha ji avê nermtir de tiştê herî ronahî tenê dilê mirov nîn e? Û çavên mirov, ji şevê reştir nîn in?...

Çavên Kemal şînderya bûn, ne reş bûn! Lê digel ronahiya dilê wî, hêrsa dilê wî ji şevê reştir bû… Diramiya û dilê wî, weke defa hewarê lêdixist… Heya niha, di jiyana xwe ya şervantiyê de, ku carinan her rojek wê bi mehekê, her mehek wê bi salekê, deh salekê ye; gelek şer û pevçûnên dijwar dîtibû… Baskên xwe li hev xistibû firiyabû, firiyabû li meydanên cengê… Gelek mirî û kuştiyên di nava gola xwînê de, di nava wê gola bêbinî, sorgulî û bêeman de dîtibû. Lê çiqas çalakiyek nû nêzik bûbûya dîsa dikete hembêza heyecanek dîn û har… Bêhna barûdê, bê teqîn wî serxweş dikir û bi çolên demê, bi çolên hevaltiyê û cengê dixist… Di

demên wiha de ji xwe re digot: "mecnûn. Kemal, malxirab, tu dîsa bûyî mecnûn!" Diramiya; Xwedê bike ku tu qeza û bela dernekeve... Bi serkeftin bibore… Em vegerin çiyayên xwe, bigihîjin wan newal û geliyên xwe yên asê. Ooy bû çend sal, ku ez di nava cengê de me… Digerim li van deşt û gundan… Lê çiqas, ji çiyayan berjêr bibim, xwe bêkes û tipîtazî hîs dikim… Xwe bêbask, heya bêling hîs dikim… Û sawekî bêîman min digire, ez dicemidim di nava xwêdanê de… Saw, cêwiya tirsê ye Kemal… Kemal, ma tu ditirsî serleşkerê min! Çavên hemû hevalan, li rûyê te yê wêrek û geş e… Tu hem heval û hem jî kekê şervanan î! Ji hemûyan mezintir e temenê te… Qey loma, ji yên hemûyan mezintir e, tirs û sawa te jî? Serleşkerê min, tu çima çilmisî wiha… Di vê meşa beza ya beriya çalakiyê de… Gelo çi bêhn tê pozê te û te serxweş dike li vê deştê li vê demê, an jî çi li te dixe di demên wiha de… Gelo ev saw û tirs, ne ya mirina bêbext be? "Mirin! Te ez di bin neynûkên xwe de hepis kirim!" Bi rastî, ne ji ber mirinê be ev saw. Ma mirin, tim li deştan e qey? Li çiyayan û baniyan tune ye… Heye çawa… Heye lê mirina wan deran xweş e… Erê gelek heval li wan deran jî şehîd ketin, di hembêza min de, di kozika min de… Lê li deşt û bajaran, di nav lepên dijmin de şehîd ketin… Bi panzer û tangan hatin kişkişandin bi erdê ve… Ooy! Canê hevalê Kendal dîsa hat bîra min… Kendal û Hogir! Di wê kelegerma havînê de, li ser strî û keviran bi birîndarî kişandin û kişandin… Ooy! Porê Hogirê ciwan, ciwanê hejdeh salî li ser keviran mabûn… Ango Kemal, mirin pir zor e li deştan… Hêdî hêdî, dilop dilop, birîn birîn tê. Lê li çiyayan, weke xewnek e mirin… Tu nizanî çawa tê, çawa diçe…

Piling:

- Hevalê Kemal, çiqas bêhnek xweş tê… Bêhna gund e gelo?...

Kemal diramiya dîsa… Çi bêhna xweş Pilingê min! Ku ez niha ji te re qala ramanên xwe yên li ser îşev û vê deştê bikim, tu yê çi bêjî gelo?... Ji ber ku bêhnek nexweş tê min… Bêhna mirinê, bêbextî û… Heqet, ku ez bêjim dê bandorek pir nebaş çê bike.

Kemal:

- Piling, hevalê min… Ez niha nikarim tevli te bibim. Ji ber ku bêhna nexweş tê poza min… Bêhna mirinê, bêhna bêbextiyê… Ez çiqas werim van deştên malkambax, bêhna mirinê tê min û hevalê Hogir û Kendal têne bîra min…

Cîhan:

-Heval! Devê xwe li xêrê veke! Weleh tu tiştek jî tune û wek ku

Piling got; bêhnek xweş tê…

Zozan:

- Ev bêdengiya te ji ber vê ramanê bû ne heval! Baş e hat fêmkirin… Mihriv (ji kerema xwe re) tu dev ji wan ramanan ber bidî!

Binevş:

- Hevalno hûn çi ecêb in… Ma mirov nikare tiştekî cuda hîs bike an birame… Ev nayê wê wateyê ku îlehî dê tiştên nebaş pêk werin… Dibe ku, ji ber bandora bîranînan be jî, van ramanên heval… Ez ew qas jî ecêb nabînim…

Kemal:

- Sax bî hevala Binevş! Te çawa fêm kir… Hevalno me ev mijar girt…

Sînan:

- Na na bidomînin ji bo ku em têr bêhna xwe bidin…

Kemal:

- Em hinek bilezînin hevalno!

Binevşê çi xweş min fêm kir û bi du gotinan got… Carinan du gotin, an jî gotinek tik û tenê, çiqas mezin û watedar dibe… Ayy… Kemal... Wekî ku tu hinek xemgîn î jî. Me zûzûka çalakiya xwe pêk bianiya û em vegeriyana çiyayên xwe… Wê hevala Binevş, stranan bêje ji me re. Ez ê guhdarî bikim, guhdar bikim… "Dayê ez xatir ji te dixwazim…" Heqet, ez çima ew qas ji vê kilamê hez dikim. Na loo! Ne ez tenê em hemû jê hez dikin. Gelo çima. Me tu kesî jî xatir ji dayikan, ji wan dayikên birîndar û kedkar nexwest. Me xwe ji wan dizî, ji gund û bajaran, ji dem û dewranan… Me xwe ji yarên xwe yên zarokatî û ji xwe… Me xwe ji xwe dizî Kemalo! Loma jî meseleyên xatirxwestinan bandorê li ser me çêdike. Me ne ji xwe, ne ji tu kes û derê, xatir nexwest. Lewre leza me hebû… Em qedexe bûn… Ango em bi dû xeyalên xwe yên qedexe ketin… Û em bêxatir bayêbazdanê hatin van deran… Stêrk çiqas diçirisin… Gund nêzîk dibe… Dibe ku em, sibê vê gavê li cihê xwe bin, bi serkeftina çalakiyê. Erê, em ê li cihê xwe, dûrî van deşt û bajaran bin. Ronahiyên Mûşê jî, çi nêzîk û gur dixuyin! Em ê li cihê xwe bin û dengê Binevşê guhdarî bikin. Em zû biçûna…

- Hevalno, em pirtir bilezînin. Hevalê Piling, hûn ê di pêşiya me de biçin. Jixwe em ê li nêzikê baxçeyên gund, bisekinin.

Aliyekî asîman, hêdî hêdî ronî dibû. Wê heyv derketa heyva çardehşevî… Heyva delal.

Bêhna hêşînahî û dûyên gund jî nêzik dibûn. Binevş diramiya…

Gelo ev bêhn jî naçe hevalê Kemal. Wekî ku ez jî ditirsim îşev. Çi zanim, gotinên wî ne vala ne! Bandorê li ser min kirin… Hevalê min, kekê min ê çavhêşîn. Min çima îro stran negot, ew qas israr jî kir… Em ê kengî vegerin ku ez jê re ji wan re bêjim… Heya ku bixwazin ez ê bêjim û bêjim… Çima sawê min jî girtiye… Sawa heval e… Çawa dilezîne jî… Ayy! Bila tiştek nebaş çênebe! Mirin bêbext e… Ku çêbe jî, bila ez bim, ne heval bin… Ku niha biçim balê, di guhê wî de bêjim: "Hevalê Kemal, bêhna mirinê tê min jî… Ez hinekî ditirsim. Ez ji te bawer dikim. Ez dixwazim, gavek zûtir ji te re stran bêjim hevalê min…" Ku ez wiha bêjim, dê çawa be… Na, wê min şaş fêm neke… Lê kanê ez çawa bêjim… Ne cî heye, ne dem ne jî fersend. Em zû biçûna vê çalakiyê jî. Ha dengê kûçikan tê. Hevalê Piling ew gihîştin ber gund. Gelo, Piling ji min xeydan e? Ooy… Xwezî dilşikandin û xeyd tunebûna… Aha! Stêrkek xuricî ket… Çiqas geş bû jî… Dema ku ez biçûk bûm, min digot; ma wiha dixuricin, dikevin…Çima li erdê nakevin… Çima nagihîjin ba me? Niha wiha napirsim, êdî mezin bûme! Erê, Binevş êdî mezin bûye! Lê weleh carinan eynî wek berê me… Ma ew xeyda min a îro ne zarokatî bû… Êdî hatibûn ber gund… Bi kuçe û kaniyên xwe, bi ajal û sergo û xaniyên xwe, bi dar û ber, rez û bexçeyên xwe, gund, gund bû. Çawa ku hemû gund kevnare ne ji bajaran mezintir in, ev gund jî kevnare û westiyayî bû. Gerçî şên bû bi mirovên xwe. Lê dîsa jî westiyabû, bêhal bû… Lê dîsa jî bi hemû tore û kevneşopiyên xwe li ser piyan bû, dijiya, diqîriya cîhanek vedişart di hundirê xwe de… Cîhaneke kevn û nû, cîhaneke tarî û ronî zarokatî û pîrîtî. Gundekî deştê bû. Lê hêşîn bû dîsa jî… Rez û bexçeyên wê bi ava kaniyan geş bûn. Û ev gund jî wekî gelek gundên Kurdistanê şiyar û ronahî dibû bi tîrêjên şoreşê. Û reng û bêhnên xwe yên cur bi cur li rûyê wan û şevê dixist…

-Hûn bixêr û silamet, serçavan re hatin! Werin, werin! Kemalê min, heyrana çavên te yên hêşîn… Pilingê min, Zozana min!... Dayê, bi heyecaneke mezin wan hembêz kir û da rûniştandin… Porê wê yê çîlspî tim berfa serê çiyayan dianî bîra mirov… Birastî jî pir spî bû porê wê… Qermûçekên rûyê wê jî tim axa tîbûyî, axa havîneke ziwa û dijwar dianî bîra mirov… Lê çavên wê yên mêşinî ku di demên wiha de diçirisiyan tiştên kesk û hênik, biharên dilgeşiyê dianîn bîra mirov… Tevli pîrejiniya wê jî sor bûn hêj lêv û hinarikên wê… Û gotinên wê yên jidil û paqîj… Ji ber ku tim dilê wê dipeyîvî… Ango durûtî û qirêjiyên civakî dil û zimanê wê ji hev neqetandibû… Nekiribû dijminê hev.

Ango dayika Besê, zana bû lê durûtiyê nizanibû qet…

Nizanim çima, lê tim bêhnek xweş, bêhna kevniyê ji gundan tê. Bêhneke nas û biyanî, bêhna ax û giyayan, bêhna…

Rûniştibûn li ser mînderên kevn û xemilandî… Weki morîkên tizbiyan biqorê rûniştibûn, çekên wan li kêleka wan, li ber dîwar… Mazûvan -xwediyê malê- bilez sifreyek dewlemend ku xuyabû, ji berê de amade bû dianîn… Xortê malê yê ku reş bûbû ji tava havînê, destê xwe li nav porê xwe yê reş gerand:

- Hevalno, xwarina xwe bixwin û razên heya berê sibê… Ez û çend hevalên, xort em ê nobeta we bigirin.

Kemal:

-Nobeta me, yan a xwe?

Mehmûd:

- Haa!... A we jî ya xwe jî…

Zozan:

- Heval, tu dîsa dixwazî bilez me di xew re bikî?

Kemal:

- Heqet Hevalê Mehmûd, ew pirtûka ku min carekê dabû te çawa bû, we xwend an na?

Mehmûd:

- Weleee… Çawa bêjim me hêj hemû nexwendiye. Dema ku em dixwînin… Em panzdeh deqe, nîv saet dixwînin xewa hevalan tê. An jî dibêjin me fêm nekir. Ê min jî jixwe çavên min wêşên… Jixwe, xwendina min jî tam nîn e. Lê em ê xelas bikin…

Kemal:

- Ango tam û zewqa ku hûn ji nobeta gund wekî din distînin ji xwendinê nastînin ne wisa?

Mehmûd:

- Erê heval… Çi zanim! Xwendin û nivîsandin xweş nîn e zêde… Çalakî xweş in, tevger xweş e.

Binevş:

- Hevalê Mehmûd, te kir ku mirov biqîre bêje: “Bijî gundîtî!” Na weleh… Bi qasî ku tevger û çalakî xweş in xwendin û nivîsandin, axaftin û kûrbûna dil û ramanê jî xweş e. Ez bawer im, tu yê rojekê bibînî, fêm bikî tama xwendin û nivîsandinê.

Zozan:

- Hûn dîsa ketin nava vê meseleya dîrokî. Hevalê Sînan!

Xewa te tê… An tu nexweş î?

Sînan, bi rûyekî tirş:

- Ez pir westiyame. Ez ê piştî çalakiyê razêm.

Kemal:

- Tu westandina xwe biavêjî baştir dibe.

Sînan:

- Na na heval wexta çalakiyê westandin mestandin namîne!

-Merhaba hevalno! Baş bû ku ez gihiştim we! Ji hefteya din ve li pey we me. Ha ji te re vêya. Divê ku hûn zû bixwînin.

Kemal:

- Keremke rûnê. Heval çûne cihê xwe dîsa?

Mihemed bi rûyê xwe yê xwêdandayî û sor:

- Erê çûnê cihê xwe. Hûn karê xwe bikin, ez ê biçim dereke din jî, hinek karê min heye. Em ê hev bibînin.

Zozan:

- Gerçî me hêj merhebayek jî neda hev. Lê oxir be!

Kemal:

- Hevalno ji xwe karê xwarin marinê jî xelas bû. Dayê Xwedê zêde bike… Destên te sax bin.

Dayika Besê:

- Ma we nexwar lawo.

Binevş:

- Dayê tu tim wiha dibêjî. Lê em birçî jî ranabin ji ser sifra te. Destê te sax be!

Dayê rabû bi Mehmûd re sifre berhev kir û çû.

Kemal:

- Hevalno şev diçe ha! De ka em zû bikin viya bixwînin û dûre jî…

Bi dengê xwe yê gur dest bi xwendinê kir… "Di peywir û berpirsyariyên demê de pêşveçûnên mezin hene… Ango hêza mîlîtanî û afirîner; encax serkeftinê bi dest bixîne." Di şeş rûpelên mezin de didomiya. Piştî ku xilas bû Kemal got:

- Belê hevalno, fermo! Hûn dikarin nêrînên xwe bidin xuyakirin. Pirs, an jî şîroveyên we… Hevalno… Fermo, gotinên we?... Tiştek ku hûn bêjin tune ye? Wiha be em bi dorê bipeyivin.

Hevalê Piling:

- Heval, jixwe peywir û perspektîfên demê ne. Tiştekî ku li ser vê bêjim tune ye…

Û jixwe em di heyecana çalakiyê de ne.

Hevala Zozan:

- Hevalê Piling jî got… Tevli wî dibim.

Hevala Binevş:

- Ez jî tevli hevalan dibim. Jixwe em ê biçin çalakiyê jî.

Hevalê Sînan:

- Gotinên min jî tune ne… Tevli hevalan dibim.

Hevalê Ozkan:

- Heval, tiştê ku me xwend, heyecana me ya çalakiyê zêdetir kir. Em zû bi rê biketana, baştir dibû.

Bi vê gotina wî, hemû bi hev re keniyan Kemal jî keniya û got:

- Ez jî tevli we dibim, lê hevalno, gundîno! Gerek we hinekî bipeyiva jî… Heyecan zimanê mirov e… Çawa bêjim vedike… Dîsa bêdengî… Ooy… Giyana mirov aciz dibe, diêşê ji van bêdengiyên we!... Kurdên bêdeng û…

Binevş:

- Hevalê Kemal… Ku tu vê axaftina xwe dirêj bikî, em ê yan lal bibin, an jî biqîrin bi giyana kurdên bêdeng.

Kemal:

- Erê erê…Weleh ez ji we ditirsim, erê heyra hûn ne hindik in…Te bi zimanê xwe got, van hemûyan jî bi çavên xwe dibêjin…Welhasil! Em bêjin gotina herî mezin, karvanî ye, pratîk e! Ku wiha be em nobedar biguherînin û du saet û nîv xwe dirêj bikin, hinekî razên... Heya wê gavê encax keşfçiyên me werin.

Dayê kete hundir:

- Lawo, de ka razên êdî… Em livînan deynin ji we re.

Kemal:

- Na na dayê, spas! Minder û xaliya te bes e, zêde ye jî.

Ozkan:

- Ez ê biçim nobedê…

Zozan:

- Li pey te jî hevala Binevş e. De haydê hevalno, em hinekî bêhna xwe bidin.

Kefiyên xwe, ango stare û lihêfên xwe yên çardemsalî li xwe wer kirin û ketine bêdengîyekê di nava wê şeva Deşta Mûşê, wê şeva birîndar de. Bêdengî çi ye… Lalbûn, kerbûn e? Her bêdengî xewn û xewnan bi xwe re tîne… Û qey her bêdengî bêhnvedanek e?

Erê, bêdeng bûbûn ew jî di odeya ji ax û keviran çêkirî, di oda gund de. Di bin kefiyên xwe de bêhna xwe didan, da ku karibin biçin çalakiyê, biçin meydana mirin û manê. Lê ew bêhnvedan ji bazdanên xezalî bileztir bû… Dibeziyan, dibeziyan… Ango, hêvî û xem û xeyalên xwe xistibûn nivîştekî ku di stûyê xezala demê de ye û dibeziyan… Zarokatiya wan dihate bîra wan… Lorînên dayikan, leyîstika li ser bênderan û mêrgan. Dibe ku şevê cejnan (eyd-îdan) dihate bîra wan… Mirov nikare ji heyecan û dilgeşiyê razê. Mirov diperpite di gola bêsebriyê de. Şev dibe sal… Destên mirov hene dikin lê tewş e! Vê carê di wan xewnên ku 'bizorê' tên dîtinê de jî, tehm û hêmin tune. Lewre dîsa bêsebrî û pêvegiredayî hej cejnê dû mirovan bernade! Ango mirov dibîne ku, waye destên te yên hinekirî, spî mane sor nebûne… Û ev rewş jî dilê te diêşîne di wê dema cejnê de.

Ew jî dilgeş û bi heyecan bûn di wan gavên lezok û agirîn de… Hemûyan xwe li xewê danîbûn, lê dizanibûn ku tu kes ji wan raneza û nikarin razên jî. Ketibûn nava newala ramanan a kûr… Çûbûn hey çûbûn! Dilezandin ji zeman zûtir diçûn… Lê zeman jî têra xwe hebû û bi bayê xwe re dibir… Li ba dikir wê temenê wan ê ciwanik, paqij û zelal… Carinan kûçik diewtiyan û parçe parçe dibû bêdengiya şeva gund. Lê piştre dîsa bêdengiyê hêza xwe dicivand, parçeyên xwe kom dikir û bi tarîtiyê re dibû yek… Bi tarîtiya şeva deşta Mûşê re.

Kezebên Kemal zêde baş nebûn, loma jî carinan pir dikuxiya. Dîsa dikuxiya te digot qey, dê kezebên wî di deve wî re werin xwarê. Zozan diramiya… Lê bi dengê kuxika Kemal ramanên xwe dan seknandin, lê guhdar kir. Vê carê rewşa kuxîna Kemal, tevli ramanên wê bû… Ditirsim ku rojekê kezebên wî werin xwarê… Dîsa diperpite… Van rojan hinek melûl e jî… Lê qet bi me re parve nake xem û keserên xwe… Çima tenê dimîne… Ango bi xem û keserên xwe re tenê dimîne… Ma qey em wê fersendê didinê ku ji me re bêje… Jixwe ew jî naxwaze ku sere me biêşîne, me xemgîn bike ji me re nabêje… Dema ku me dibine, xwe dilgeş dike, dikene û me dide kenandinê. Dibe ku bi me dilgeş jî dibe. Lê em jî pê dilgeş dibin. Lê em wek wî nadine xuyakirinê… Ango ev rewş ne bes e… Ew ji me pirtir me fêm dike ji me hez dike… Ev rewş wî mezin dike û ev mezinahî jî wî tenê dihêle. Hooy-hoy! Lê ez çima van ramanên xwe jê re nabêjim. Min çima heya niha negot… Min şerm kir gelo? Ma mirov ji van ramanan şerm dike, vana ne ramanên paqij û mafdar in. Bi rastî jî min çima jê re negot… Ev çi sînorên asê ne di navbera me de… Dijminên dîrokê tenê axa me bi

sînor û mayinan parçe nekirine… Me jî yeko yeko ji hev dûr xistine bi sînor û mayinan. Weey-wey! Em bi hev re dijîn, diêşên, dimirin… Xwîna me, zarokatî û xemên me tevli hev dibe, lê sînorên di navbera me de dîsa hene… Nahêlin ku em bigihîjin hev… Lê xwîna me digihîje hev, di golên cengê de. Lê dil û ramanên me dimire di dûrahiya sînorên kevnare de. Û li cihê ku sînor hebin azadî tune… Mirov li serê çiyayan û heyvan jî be tune! Nayê azadî! Gelo ez bibim wan ramanên xwe bêjim? Bêjim hevalno, de ka rabin! Ez dizanim xew neketiye çavên we… Rabin mirin heye veger tuneye! Ez ê ji we re çend gotinan bêjim… Ez naxwazim bi sînor bijîm. Van sînoran hevaltiya me diêşînin hevalno. Ku ez wiha bêjim dê nebêjin “ma tu ji heyecan û tirsê dîn bûyî, çi bûyî? Xêr e heval? dê nebêjin şerm e!...

Dilê Piling jî diperpitî di wê şeva tenê de… Xew dibeziya ji wan çavên wî yên mijang gur… Ango dil û raman bera dû xewê didan, nedihiştin ku razê. Diramiya. Kemal dîsa kuxiya… Gelo ji ber kuxikê nikare razê yan ew jî weke min di nava raman û mitalan de ye? Ne ew tenê hemû heval jî şiyar in… Ma her tim wiha nabe? Beriya kîjan çalakiyê xewna me hatiye? Nabe dilê mirov radibe halanê û bi guleyên ku em ji bo teqandin û şer amade dikin re, sor dibe… Ma şer hêsane qey? Kuştin û mirin… Her çalakî warê kuştin û mirinê, gola xwînê, hêrsê û baweriyê ye… Gola xwînê û hevaltiyê ye jî! Lewre ew toz û dûmana cengê ye ku hevaltiyê wekê zinaran zexm û dijwar dike. Ooy Kemal beg! Çawa dikuxe! Weleh kezeb û dil û cîgerên te xera bûne… Doxtor-moxtor jî qebûl nake, derman naşuxilîne. Weleh ez ê wî piştî çalakiyê bibim ba doxtor… Çawa bibim ba doxtor yaw… Bibim nexweşxaneya Bedlîs û Mûşê! De Piling tu dibêje qey ku tu hêj li mal î, nexweşê xwe dibî ser doxtor û nexweşxaneyan… De bes lo em ê doxtorê xwe bînin ba xwe û Kemalê hevalê min ê şîrîn… Teqez dê nehêle… Çima lewre naxwaze ji me re bibe bar… Hevalan û gel bi xwe bide mijûlkirin… Hevalê fedakar… Îşev heyv jî heye li asîman. Şeva din çiqas ronahî bû bi heyveronê… Înşalah îşev ne wisa be. Gerçî tariya zêde jî nebaş e lê… Gelo ez ê rê derbixim îşev… Em çend meh berê di vir de derbas bûbûn… Înşalah ez şaş maş nekim! Di vê şeva çalakiyê de ev kêm e îcar... Ay Xwedê neke! Dê her tişt tevli hev bibe… Mîratê erazî jî pir dişibe hev… Eraziyê Motka ne wiha ye… Yê Sason û başûr jî… Tenê yê van deran wiha ye… Xêr e Piling! Nava te qetiya! Tu yê ji vê tirsê şaş bikî weleh! Na na, em ê berê xwe bidin riya li milê çepê… Lê carinan dizivire aliyê rastê jî. Gerçî riya bi qîr jî nêzik e, ez dikarim bi wê jî derxim… Na lo! Ez şaş

maş nakim. Hemû tê bîra min… Xweziya piştî çalakiyê em bi aliyê Tetwanê ve biçûna… Min bêriya wan deran kiriye… Gelo diya min, bavê min… Hemû maliyan bihîst ku navê min Piling e? Dê pir dilşad bibûna… Ez ji wan re nameyekê binvîsînim… Wêneyê xwe jî bişînim, ma telefon jî heye… Heqet ez çima qet nakevim têkiliyê? Ez ji çi ditirsim? Ma dê bandora wan li ser min çêbe? Na lo qet nehate bîra min loma… Çima nehate bîra min? Ma em nikarin serê xwe bixurînin! Û min… Me hemû defter girtine. Defter û çîrokên berê… Jixwe nayên bîra min. Ku bên jî ez wan dûr dixim… Ango ne ji tirsê ye. Ma ez wan bibînim çi ye, nebînim çi ye… Ez ez im! Kî dikare bandorê li ser min çêbike? Lê xwezî min carekê ew bidîtina… Bi vê xeml û xêzê… Xeml û xêza çi kuro! Dê çiqas kêfa Mirado ji min re were! Wey birayê min ê biçûk… Niha mezin bûye… Ma qîzxala min Gulê… Divê carekê be jî Gulê bibînim… Ku min bibîne dê dîsa jî wekê gulek sor bibe û bilerize? Gelo hê jî ji min hez dike? Xwezî min ew jî bi xwe re bianiya!... Na lo! Ma tiştek fêm nedikir! Min çend caran jê re got… Hema digot “na û na! Neçe em jî nizanim mîna kî û kê daweta xwe bikin… Em evîndar in…” Çi li xweşa xalê min jî diçû… Ma zavayekî wekî min ji ku dibînin. Ez rojekê biçim gund û Gulê min bibîne… Bixwaze bi min re were, ez ê wê bînim? Erê ma çima neynim… Bila ew jî bibe şervana gelê xwe. Jixwe çend sal paşê ez ê biçim, Miradikê xwe bînim… Bila hinek mezin bibe. Jixwe ji ewil de nabêjin ew li te çûye! Çima kûçik diewtin? Ax xwezî ez hinekî razama! Serê min tevlihevtir bû! Gulê û nizanim çi û nizanim kî… Ew çi raman in? Ku niha heval pê zanibin dê nebêjin; Piling tu ketiyî hembêza malbatê, te dev ji kar û xebatê berdaye!... Na lo! Ma çima heval wiha bêjin… Min kar û xebat ji bîr nekiriye. Lê ev raman jî zêde ne rast in… Ma min çalakî ji bîr kir… De bise tu jî kuro… Kuro kî ye? Helal be Piling beg! Tu çiqas bi leşkerî û bi fermî nêzî xwe dibî. Carê carekê jî ji xwe re dibêjî kuro û kuro! Ma mirov berî her kesî bi xwe re nabe leşker! Ku ez bi awaz û zimanekî leşkerî nêzî xwe nebim, ez ê çawa jiyanê bi leşkerî bimeşînim… Belê rêheval Piling! Leşkerê demên dijwar… Bi leşkerî xwe ji hemû ramanên tevlihev rizgar bike… Şiyar be! Ez ji xwe şiyar im! Şiyar be… Û… Ango rêheval ê leşker, ez bi her awayî di binê ferman û nêrînên te de me… Emr û goriş… Yaw ev “emr û goriş” ji ku derket! Ango ez bi tevahî amade me ji fermanên te re… Aha Zozanê li demjimêra xwe mêze kir! Gelo bûye çend? Ne dema çûyînê ye… Înşalah di saniyeyên dawî de xew nekeve çavên min!

Wê şevê çi bela bû. Xwediyê malê bi zorê me şiyar dikir. Gerçî ku me bihişta dê bi salan me di xew de bikira… Dema ku em dixwin, vedixwin û radizên, çiqas li xweşa wan diçe. Çawa ji qirika zarokên xwe dibirin û didin me. Ax, ji bo vî gelî mirov çi jî bike hindik e!.. Ew şev çiqas xewa min dihat… Bedena min ji livînan nediqetiya… Lingên min li dû min nedihatin… Germahiya hundir… Lê îşev wiha nabe. Niha xew jî bêhnvedan jî çalakî ye! Ez amade me ne wisa? Erê! Erêyek mezin… Lewre çalakî govend in, xweş in… Çalakî tolhildan e, bez e, paqijî ye! Çalakî azadî ye… Nêzîktirbûna azadiyê ye… Azadî, çalakî… Çavên mirov çawa diçirisin… Bêhna barûdê, Cîgerxwîn… çiqas xweş dibêje! “bêhna barûdê, kete pozê min! Hey-hey hey-hey!/ Kîn e em?...” Kuro, tu çi dikî? Stran dibêjî… Dengê min derket…

Belê, ne kuro lê hevalê Piling, dengê te derket!

Zozan:

- Hevalê Piling, em ji te re mîkrofonê bînin… Kilama te epey xweş e…

Piling:

- Bibore Heval… Ez diramiyam lê…

Kemal:

- Na, heval, tişt nabe! Jixwe te bi dengê me hemûyan got: “Kîne em !” Em hemû şiyar û li ser piya bûn di binê kefiyan de ne wisa hevalno !

Binevş:

- Erê Heval, ma kî dikare razê jixwe…

Kemal:

- Jixwe şev jî li benda me ye… Em êdî rabin hevalên hêja û delal... “Serhildan jiyan e hey-hey serhildan jiyan e!”

Zozan:

- Hevalê Kemal, ku tu hinekî din jî bêjî, em ê niha bikevin govendê û heya sibê… Ango em ê

bi govendê biçin cihê çalakiyê û hemû gundan bi xwe bihisînin…

Piling:

- Hevalno, sedemê vê bêxewiyî tenê heyecan nîn e. Van malxirabên cih û livînan vê hewa germ û nerm jî mirov aciz dike û xewê direvîne… Bi rastî jî me van hemû tiştan ji bîr kiriye… Lê berê…

Binevş:

- Hevalê Piling wekî ku tu ‘teoriya rehawetê’ dikî xêr e… Hema germ û nerm û nizanim…

Zozan:

- Bi Xwedê kî hevalno, hûn dîsa dest pê nekin… Xuyaye ku dê hevalê Piling bi axaftinek dirêj û dijwar heyfa xwe ji te bistîne hevala Binevş…

Binevşê bi rûyekî ken, serê xwe hejand.

Piling:

- Na, na ez azaftin maxaftin dirêj nakim. Lê dixwazim spas bikim ji hevalê re… Di demeke wiha de jî dikeve kemînan û dixwaze ku dilê mirov bişkîne…

Kemal:

- De bisekinin, hevalno em ê êdî bi re kevin… Ma dilê te jî ew qas zû dişkê hevalê min! Hevala Binevş şîroveyên te jî carinan pir hişk û bi per û bask in…

Binevş:

- Ooy… Ez dîsa poşmam bûm ji heneka xwe… Bi rastî jî we û hevalê Piling fêm nekir, an hûn bi qestî wiha dikin… Ez carinan dibêjim ku ez nizanim henekan bikim, an şaş têm fêmkirin an jî qet nayêm fêmkirin. Bibore heval. Min xwest ku ez henekekê bikim. Min bi ken got jixwe… Lê nebû, nabe…

Piling:

-Hooy Xwedayo… Îcar ez poşmam bûm, jixwe ez jî bêfêm dibim carinan henekên hevalên xwe fêm nakim. Bibore…

Kemal:

- Belê, ez tevli we herdûyan jî dibim… Hûn herdû jî mafdar in… Lê ez jî mafdar im û wext dereng e… Dengê zengilê cengê nayê we? Zing zing! Zinga zinga dile min wayê dîsa deng veda…

Piling:

- Hevala Binevş, xwe neqehirîne û rûyê xwe ji min nezivirîne… Ez nexeyîdime ji te! Tu jî nexeyide zinge zinga zengilê min…

Binevş:

- Na ez nexeyîdime… An jî ez tenê ji xwe xeyîdime… Em êdî diçin ne wisa…

Zozan:

- Çi gotinek felsefîk! "Ez tenê ji xwe xeyîdime"… Binevşa me jî hindik ne filozof e. Temam, temam ez disekinim… Mijar guherî… Her tiştê me amade ye ne wisa…

Kemal:

- Wisa dixuyê… Em amade ne! Lê gelo hedefa me jî amade ye... Mehmetçik jî amade ne…

Piling:

- Erê heval! Înşalah ew jî amade ne, tu nexweşî û meseleyên wan tune ne.

Dipeyivîn, dixeyidîn bi zarokatî. Dikeniyan, diramiyan… Dibe ku dinaliyan jî, ji ber birîndarî û divêtiyên dîrokê… Lê ji cengê pêştir çare tune bû. Lewre wan nenivîsandibû ev dîrok… Ku wan nivîsandibûya dê çawa bûya… Helbet dê bi zordestî nebûya…

Di dilên ciwanik û pak de cihê zordestiyê tune lewre. Jixwe tu dem û fersendekî nedîtibûn ku pê zordestiyê bikin. Baş bû ku nedîtibûn jî… Lewre ku di dîrokê de zordarî û bêbextiyan kiribûna dê niha, wiha paqij û delal, dost û heval nebûna… Dê destê wan wiha paqij û spî nebûya. Erê dilê wan ronahî, destê wan bê zordarî bê xwîn û talan bû! Ma tu kêmasiyên wan tune bûn? Hebûn çawa… Ji zarokatî, naşîtî, nezantiya wan. Ji dîroka bêbext pir û pir bûn kêmasî û nebesiyên wan… Loma jî ji siya wan nêziktir tim li pey wan bû… Wan dişoqand diêşand… Li wan dixist… Wan parçe parçe dikir bi dilgeşiya wan… Bi canê wan ê ciwanik… Bi xeyal û rastiyên wan ên ku ji berfa çiyayan spîtir û paqijtir bû.

Şev bîreke bêbinî bû. Di kûrahiyê de dengê kenê wan xort û keçan hebû. Tirs û xof, mirin û mayîn, xewnereşk û stranên xemrevîn hebûn… Şev bîra cengê bû. Di kûrahiyê de kulîlkên ku bi bêbextiya serdestiyên rojhilatî çilmisîbûn hebûn… Biharên şewitandî, miriyên bêgor , komhestiyên li şikeft û newalên lal hebûn di kûrahiya bîra cengê de.

Ketibûn rêzê, bi gavên lezok dimeşiyan. Dimeşiyan ber bi dilgeşiyê ve… An jî ber bi mirina ku pê henekan dikirin û pê dikeniyan va diçûn… Stêrk diçirisîn li asîman. Te digot qey, ew jî bi heyecan û dilgeşiya wê şevê pirtir diçirisîn… Heyv hêdîka bilind dibû, bergehê geş dikir ji şevê re… Şevek ronahî bû ango… Bayekî nermik dihat, rûyê wan radimûsa… Lê dilê wan ronahîtir bû, ji şeve kûrtir û hêniktir bû… Ji çiyayên ku bi heybet bilind dibûn li dûrahiyan jî bilindtir bû dilê wan… Ax! Ew çi bûn, kî bûn… Ax! Ew çi ne, kî ne wiha diherikin nava şevê nava demê, nava xeyalan, nava deng û lalîtiyan! Ji dilê wan, dengê defa hewarê bilind dibû… Dengê lorînên zarokatiyê… Dengê kewên gozel û bilbilan… Diçûn, rê bêdawî bûn. Lê zêdetirîn jî ew bê dawî bûn… Diçûn, ne dema dawet û govendan, ne dema evîn û evîndariyan, ne jî dema xewn û xeyalan hebû… Li guleyên devê tivingan, li nêzikbûna hedefa xwe, li riyên ku li deşta bêdawî dirêj dibûn li qereqol û biryargeh ên derdorê diramiyan… Li veqetîn û mirinên bêeman jî diramiyan…

Ma ew mirin nebû ku wan ji hev diqetand û diçilmisand? Û kî, kîjan hêz karibû mirinê bisekinanda? Kîjan lehengiyê pêşî li mirinê girtibû? Ango lehengî û jiyan; wek perperokên li dora ronahiya çira û lambeyan nebûn! Nedişewitiyan, nedibûn xwelî! Û mirin zagona jiyanê, xwelî û berwêla jiyanê nebû?

Xortê ku di nava şevê de weke dareke bilind dixuya ber bi wan ve çû, gihişt nava gola ku ji germa havînê bê av maye… Dît ku çekên wan qet naxuyên. Hat bîra wî ku çeka wî ya birqonek li milê wî ye û taveheyv lêdixe, dibiriqîne. Bilez ji milê xwe danî:

- Hevalno, merhaba! Kemal kanê? Ha tu li vir î? Çawan in, baş in… Ew kar amade ye… Em ê heya derekê biçin, dûre li traktorê siwar bin… Em ê bi traktorê bigihîjin mala hevalê Ferzende. Ji wê pêve jî oxira xêrê be ji me re!

Kemal:

- Cihê ku em ê bi peyatî (peya) biçin pir e… Wekî din jî em bi traktorê neçin mala heval… Em li dûrî gund û malê peya bibin çêtîr e… Cixareyên we xelas bûn…

Piling:

- Erê heval em li benda çûyînê ne.

Zozan:

- Sebra me jî li ber qedandinê ye.

Binevş:

- Hevalno, saeta we çend e? A min hêj deh û nîv e. Wekî ku dîsa sekiniye…

Piling:

- Saetek berê westiya ye û razaye. Ji ber ku saet niha yanzdeh û nîv e… Ez ya xwe ya zêde bidime te? Ew jî bi fosfor e ha…

Binevş:

- Erê weleh baş dibe… Di şeveke wiha de bê saet nabe. Spas dikim îcar em bigihîjin hevalan…

Zozan:

- Hûn nayên hevalno? Di vê qiyametê de hûn xelatan didin hev çi dikin… Dikaribû bimana sibê jî… Zû zû em biçin…

Piling:

- Na, me govend digirt heval! Xwedêkî (vê gotinê tim wiha digot, dema ku hêrs dibû) mirov aciz neke heval! Xelata çi! Saeta heval sekinî ye min jî ya xwe ya zêde dayê.

Binevşê di nava gavên lez de êdî sebir nekir:

- Hevalê Piling!... Hewce nake heval, jixwe heval jî fêm kir. Îcar em ê daxuyaniyan bidin… Ha ha… Jixwe em gihîştin hevalan jî…

Kemal:

- Em îcar pirtir bilezînin hevalno! Îro qet erebeyên leşkerî ber bi van aliyan va nehatin?

Xort:

- Bi qasî ku me nêrî derbas nebûn… Ango di riya Mûşê û Bedlîsê de derbas nebûn. Li aliyê din nizanim. Lê bi piranî paqij in wan deran. Ma haya wî ji we tune ye?

Kemal:

- Haya wî hevalê ji me heye jixwe cihê me yê herî dawî yê beriya çalakiyê li wira ye…

Meşa ku qerînek bû di hembêza şevê de didomiya bêaram û bêdeng, bêxewn û sekn. Kemal, weke her gavê bi bihîstyariya xwe ya hevaltî û rênasî bi tevayê komê re dimeşiya… Yeko yeko dinêrî li rûyê hevalan… Di tarîtiya şevê de, di nava lez û bezê de dinêrî. Çawa dinêrî? Di tarîtiyê de mirov dikarin binêrin? Na mirov bi çav nikare binêre, lê bi dil dikare. Loma jî Kemal di hêşînahiya çavên xwe yên kûr û dûr de yeko yeko hembêz dikir hevalên xwe û li wan dinêrî… Bi dilê xwe yê ronahî li wan dinêrî, wan ji nû ve keşf dikir û bi silavên germ hembêz dikir. Carinan diket binê gola ramanan a bêbinî û diçû… Paşeroj û ew gav, ew gav û paşeroj tevli hev dibûn… Nizanibû ku di kîjan demê de dimeşe… Di kîjan demê de dimeşe, dilezîne… Hem di hundirê demê de bû… Ango dem bi xwe bû… Hem ji derveyî demê, dûrî demê bû li cihê xwe. Cih çi bû? Ew riya asê ya ku tê de dimeşiyan… Ew şeva ku bi lez diçû… Ew çalakî û cengaweriya ku li benda wan bû… Hemû çi bûn? Ango yekitî û durûtiya cih û demê çibû? Û mirov ango ew bi xwe kî bû, çi bû di nava wan hemû tiştan de? Kemal kî bû?

Diramiya dîsa… Raman û hestên wî, ji bayê şevê bi leztir diçûn digihîştin gund û warên nas… Digihîştin heval û hogirên li welatê bê rê, welatê mirinê… Dîsa jî bêhna mirinê hat… Ew ronahiyên li jêr çiqas pir in. Ne konvoy be? Pir in, nayên jimartin. Em nekevin nava dorpêçekê. Gelo ez pir şikdar im an… Wekî sê aliyê me tê girtin! Na lo… Ax ax Kemal! Tu newêrî ji xwe re bêjî… Lê dîsa bêhna mirinê tê poza te… Bêhna bêbextiyê… Gelo Binevş jî eynî bêhnê distîne… Çawa dilezîne ew jî… Hevalek şîrîn e Binevş. Hêj zarok e jî… Naşî ye jî…

Pir tiştên ku dixwazim pê re bipeyivim hene… Carekê me dest bi axaftinek kûr û dûr kiribû… Lê dûre em çûbûn gund û nîvî mabû… Ji xwendinê jî hez dike… Dilnizm e û bi hezkirin e… Lê çima carinan pir dûr tê ji mirov re… Ango di nava gotinên herî germ û nêzik de, dûrahiyek kûr dikeve navbera mirov û wê… Çi ji mirov lo! Wê ji min dûr dixe… Ango tam dema ku ez dibêjim: “Ha! Ez gihîştim hevala xwe ya Binevş” ew direve… Nizanim çawa dike lê diçe wekî ku mirov qet hev nedîtîbe, qet nepeyîvîbe… Xerîbiyek dikeve navbera mirov… Ooy! Min dîsa got “mirov” Dibe ku tenê ji min re wiha be… Dibe ku ez nikarim xwe bigihîjimê. An jî hinek tiştên min, ji nişka ve wê ji min dûr dixin… Çawa ku ez tim dixwazim bigihîjimê ji hezkirinê, ji balkêşiya wê… Hin aliyên min jî wê didin revandin… Lê wiha nabe… Ez ê jê re bêjim… Bêjim hevalê, tu çima carinan ji nişka ve ji min direvî? Kîjan aliyên min te direvînin… Çima ez nikarim bigihîjim te hevalê? Ma em ne hevalên hev in… Dibe ku xwîna me di eynî meydana cengê de bibe gol jî… Dibe ku em di eynî gulê de vekin jî… Dibe ku xeyalên me di eynî gavê de bêne kuştin… Ma ev çi dûrahî û xerîbî ne di navbera me de Binevş! Bêhna giyayê şewitandî tê… Dibe ku agirê cixara leşkerekî di keminê de ketibe erdê û giya şewitandibe… Çi zanim dibe. Ez li ser hevala Binevş diramiyam… Binevş, Binevş! Ez ê bêjim; Binevş hevalên keç gelek in, lê ji min re wisa tê ku tu min baş fêm dikî… Hin tiştên bêdeng, bê rê û bê cih fêm dikî. Ez ê bêjim Binevş… Ooy de tu jî! Çi Binevş Binevşa te ye Kemal! Çiqas xweş dimeşin hevalên min… Kî dizane ku niha her yek li ku ye û çi dirame? Niha çalakiyê diramin û gelek tiştên din… Lê ez, ez jî tenê hevala Binevş diramim.

Binevşê bêhnek kûr kişand ji şevê:

- Hevalê Kemal çiqas bêhnek xweş tê ne wisa? Rê hindik maye.

Kemal bi dilşahiyeke veciniqî û hinekî şerm kir… Hinarikên wî sor bûn di nava reşahiya şevê de… Di dilê xwe de got! Ooy heval te çawa ez qefaltim! Ez bi te re bûm, te diramiyam.

Kemal:

- Erê heval bêhnek xweş tê… Lê dîsa jî ez ji bêhna deştan hez nakim…

Binevş:

- Erê dizanim, bêhna mirinê… Ooy! Ez naxwazim di gavek wiha de tiştekî wiha biramim û bêjim… Ez ditirsim.

Kemal:

- Tu naxwazî nebêje. Bihêle heval…

Lê ez ditirsim, weleh ez ditirsim… Tirs rûyekî jiyanê ye…

Li dawiya komê bi hev re dimeşiyan. Hêdîka dipeyivîn, bi dengekî nizim. Kemal nizanibû ku gotinên wî yên dawî bûn… Lê xemgîniyekê xwe li hemû hebûna wî lefandibû… Ji bo ku di demên meşên wiha de tim digeriya li dora komê, carê li cem hevalekî dimeşiya… Vê carê dîsa wisa dikir… Lê hem xemgîn bû, hem jî çokên wî giran bûbûn. Diêşiyan…Bi zorê dikişand li dû xwe. Dilezand.

Binevş:

- Erê, tirs… Mirov tirsonektiya mezintirîn li hemberî tirsê didin xuyakirinê… Zêdetirîn ji tırsê, an jî ji tirsonektiyê ditirsin. Lê… Tirs jî rûyekî jiyanê ye, rast e… Ooy ez naxwazim îşev tiştên wiha biramim û bipeyîvim… Lê… Heyv çiqas xweş e ne wisa? Çawa diçirise. Dê sibê bibe heyveron, pirtir biçirise…

Kemal:

- Gelo heyv… Ev heyva delal jî ditirse? Dev jê berde… Bihêle sere me çi ramiya bila bêje… Em natirsin ji wan gotinên xwe… Em pir amade ne ji cenga îşev re. Bi tevli her tiştê em amade ne. Em ê sibê li heyvê binêrin gelo? Li heyva ku ew qas delal û ronak e?

Binevş:

- Erê em amade ne heval! Û em ê sibê ango şeva hatî helbet binêrin, heyvê bibinin ne wisa?

Kemal:

- Erê, ango belkî, dibe ku dibe ku em herdû… Te vê bersivê neeciband. Tu îleh erê dixwazî… Belê heval… Em ê sibê li vê heyvê binêrin, erê, erê…

Bêdengiyekê bi stran dest pê kir dîsa… Stranek bê welat, stranek birîndar! Stêrk dîsa diçirisiyan… Geşbûna heyvê xwe winda nekiribû… Piling kuxiya. Di demên wiha de kuxîn û hemû deng dijminê herî mezin in… Loma jî zûzûka destê xwe da ser devê xwe… Ji aliyekî ve jî nifiran li kuxikê dikir…

Binevş:

- Wey wey! Xwe fetisand.

Kemal:

- Piling napejirîne lê kezeba wî zêde baş nîn e. Ma ev çi kuxik e… Em piştî îşev, teqez wî bibin… Ango ji bo tenduristiya wî. Tiştekî bikin… Weey! Hê jî xelas nebûye, nasekine. Ew çi kuxik e heval?

Binevş:

- Hevalê Kemal! Înşalah ev kuxik ji te re biyanî neyê û te jî bîne bîra te… Ya te jî ne hindik e heval û ew tedbîra tenduristiyê ji bo te jî divê.

Kemal:

- Spas dikim… Jixwe ez jî ditirsim niha. Ay dîsa tirs… Ditirsim ku niha an jî di dema êrîşê de kuxik min bigire… Rast e ya min ji ya Piling xirabtir e… A min ew qas zû nasekine… Loma ez nikarim biçim bêjim "çi bû jî" Wê bersivek mezin bide min weke her gavê baş e ku av di metereyan de heye… Hindik ma.

Xort:

- Hevalê Kemal hûn çend deqe li vira bisekinin… Ez ê biçim li traktorê binêrim û werim… A li wira ye ha.

Di nava tarîtiya şevê de destê xwe dirêjê aliyekî kiribû…

Kemal:

- Temam tu biçî heval… Em belav bibin hevalno. Derbasî be, hevalê Piling.

Piling bi ken:

- Spas dikim heval! Tu jî dest pê nekî? Ez li bendê me ha!

Zozan:

- Ez bawer im ku tu jî niha ji xwe ditirsî hevalê Kemal.

Kemal:

- Rast e heval. Em kuxikê êdî bipejirînin û ji sibê pê de, dest bi derman mermanan bikin… An na wiha nabe… Gel jî dibêje qey em ji polayan, ji zinaran çêbûne… Nizane ku em ew qas nexweş in…

Piling:

- Em nexweş bin jî, ango ez û tu vê havînê kuxikî bin jî, em dîsa cengawer in; şêr û piling in.

Binevş:

- Raste heval. Şêr nexweş û birîndar bin jî, dîsa şêr in.

Xort bi gavên lezgîn vegeriya û hat:

- Hûn dikarin rabin hevalê Kemal! Traktor amade ye.

Hemû bi hev re rabûn û ber bi jêr ve çûn. Di dilê wan de heyecanek mezin, di çavên wan de biharek dûr hebû. Bayekî gur hat ji nişka ve. Bayê nîvê şeve. Her ku diçû hênik dibû şev, bayê nermik jî gur dibû.

Gihîştin ber traktorê bi destê hev girtin. Jixwe tim wiha dibû… Rûyên hev nedidîtin lê destên wan hev didîtin, hev digirtin, hêz ji hev distendin… Lê rûyê hev nedidîtin. Ma qey ew 'yên bê rû bûn'? Na rûyekî wan ê bihar, ronak û emirkurt hebû… Rûyê wan û nas û hevalên

wan, ji stêrkan pirtir dixuricîn, winda dibûn. Rûyê wan carinan jî wek pelên payîzê, diweşiyan nava deman, nava çîrokên dilşewat, nava mirina bêbext! Rûyê wan tunebû, lê rûyên wan hebûn nejibîr bûn… Wekî navê wan bûn. Navê wan jî tunebûn lewre, bênav û bê navnîşan, bêcih û war bûn… Lê navê herî rast û nerm yên wan bû! Ango bi rû û navên xwe yên nediyar hebûn ew! Diherikîn nava dîrokê.

Piştî ku yeko yeko ketine nava romorka traktorê, lambeyên traktorê pêketin û bi rê ket… Riyek ax, lê qûmkirî li pêşiya wan bû… Ku ne ji qûmê bûya, vê riyê jî wek riyên ji axê yên din nedihişt ku tu lebatek çêbe. Ajovan lambeyên traktorê vemirandibû û bi lez diajot. Rêwî hemû li ser piyan bûn di nava romorkê de. Taveheyvê çavên wan û hesinên traktorê diçirisand. Li jêra rê erebe diçûn û dihatin. Dengê wan dihat. Kemal bê sekn, li dora xwe dinêrî… Ji nişka ve hate bîra wî ku ew sekna wan a li ser piyan nebaş e. Bilez rûnişt û got: “Hevalno rûnên… Ku niha gulebaranek çêbe em ê hemû bi carekê... biçin…” Rûniştin… Zozan:

- Ev rêwîtî pir dirêj nabe, ne wisa? Rêwîtiyên wiha siwarî qet li xweşa min naçin.

Kemal:

- Hindik ma heval…

Piling:

- Ax ax! Bêhnek xweş nayê pozê we hevalno? Ka bêhn bikin, bêhna zebeş, petêx û şemamokan … Bêhna herî xweş a bostanan e… Heyfa vê bostanê nîn e ku wiha rê di nav de derbas dikin…

Binevş:

- Xem nake heval. Tu yê rê biguherînî, ji bostan dûr bixî…

Piling:

- Weleh nizanim ka ez ê cihê rê biguherînim neguherînim… Lê ez ê piştî şoreşê bibim bostanvanekî û her tiştî belaş bidim mirovan. Xwezî dema me hebûya ku me çend zebeş bişkanda… Min pir bêriya zebeşan kiriye… Me yê perê xwe jî bixista bin zebeşên ku hê kal in.

Zozan:

- Hevalê Piling ma tu yê nebûyayî wêneka? Çiqas karên te pir in…

Piling:

- Heval! Ma tunene kar! Ez ê pir tiştan, karan bi hev re bikim… Ma hevala me ya Binevş jî deh kar û deh hedef nedaye pêşiya xwe.

Kemal:

- Hevalno, em hemû jî pir tiştan dixwazin. Ev mafê me ye jî.

Dibe ku em birçiyê kar û xebatên watedar in loma.

Zozan:

- Eynî wisa ye heval. Xwezî em êdî peya bûbûna.

Kemal:

- Hevalê xort, em niha peya nabin êdî?

Xort:

- Min ê jî niha bigota… Em peya dibin êdî.

Hemû bi hev re rabûn û bi awayekî çeleng peya bûn ji romorka traktorê. Dema ku pê li axê kirin bêhna wan derket.

Binevş:

- Min nedixwest bêjim lê hevalno ew mabû ku ez bifetisiyama…

Piling:

- Hevalno, ka li van şemamok û zebeşên xweşik binêrin…

Kemal:

- Hevalê min ê şîrîn, ma di vê tariya şevê de tu çawa xweşiktiya wan dibînî?

Piling:

- Heval ma hewce nake ku ronahî be û ez bibînim. Bostan xweşik in. Ez nebînim jî dizanim. Ka rûnên ez viya bişkînim, bila tîbûniya we derbas bibe… Beriya çalakiyê baş jî dibe. Hemûyan bi dengekî:

- Na na spas heval! Em tî nebûne… Em bi lez biçin çêtir e.

Piling:

- Na hevalno ew qas zeman nagire. Qey çi dibe hevalno ranebin.

Kemal:

- Piliiing! Em lez kin biçin, ku bibe em dikarin piştî çalakiyê seriyek li vir bixin. Haydê hevalê min, bostanvanê Kurdistanê.

Piling:

- Haydê em biçin, lê ku ez bibim bostanvanê welat, ez tu zebeş û şemamokek nadime we. Binevş:

- Na na heval tu yê bidî me.

Kemal:

- Em hinek bilezînin hevalno. Wayê roniya malê xuya kir.

Piling:

- Hevalno, bilezînin. Lê pêli bostanan nekin ha! Ooy! We nehişt ku em zebeşekî jî bixwin. Çi hênik in jî.

Binevş:

- Hevalno, daxwaza min jî heye; bimeşin, lê pêlî kulîlkên payîzê

nekin. Hêj nû vebûne. Dê bipelçiqin.

Kemal:

- Hevalno, Xwedê kulîlkên we jî, bostanên we jî bihêle! Hûn ji heyecanan dengê xwe zêde bilind dikin… Ku "Mehmetçîk" li van doran hebin, niha zûde dengê me bihîstine… Ha, min ji bîr kir hevala Binevş, temenê kulîlkên payîzê pir kin e jî.

Binevş:

- Erê û pir jî nazik in.

Piling:

- Bostan jî nazik in hevala Binevş.

Zozan:

- De bes e hevalno! Çalakî, gule ,bombe û leşkerê KT'ê jî pir nazik in!

Dengê fîqekê hat ji dûr. Hemû bi hev re sekinîn û qelevîska rûniştin li cihê xwe. Wekî ku ew fîq îşareta bûyerek bêbext bû… Bêdeng û aram li bendê sekinîn. Wekî ku li benda teqînek ku can û bedenan parçe parçe dike bûn… Li benda mirinan… Birîndariyan, gulebaranan… Jixwe qet pey wan bernedidan, mirinan jî gulebaranan jî ew tenê nedihiştin ango. Sekinîn, sekinin. Bi çavên pirsyar li derdora xwe nihêrîn. Li talûkeya di hembêza tariyê de nihêrîn… Li dilê xwe, li rûyên hev ên ku naxuyên… Li heyva bilindahiya asîman… Bendewar man di wê dema dijwar de, dema ku ji dembûnê derketiye. Lê tu şop û deng, tu îşaret nedîtin… Kundek dest bi xwendinê kir ji nişka ve. Xuyabû ku zû de xwe bicih kiriye li ser darekê. Binevş veciniqî. Lê nizanibû ku wek her car bi dengê kund veciniqî yan jî bi ramanên xwe, bi hestên xwe yên tirsyar! Veciniqî û cemidî. Di nava şilbûna xwêdanê de veciniqî û cemidî… Ji raman û hestên xwe cemidî! Ev çi kund e îcar? Pêşî fîqefîq… Paşê kund… Ev kund… Xwezî tunebûna! Tu dibêje qey li benda me bû û bi ser me de dixwîne. Kundê kor! Jixwe bêhna mirinê jî dihat ji şevê û vî kundî jî… Xêr e Binevş! Tu çi dixwazî ji heywana reben? Tu ji pîrejinan xirabtir bûyî! Kund e û ji xwe re dixwîne. Çi zanim lê dîsa dilê min defa hewarê lê dixe. Ay… Em zû biçûna, zû bifiriyana guleyên me ji devê tifingan… De em ê niha biçin jixwe Binevş! Çi xwezî xweziya te ye? Na min negot "xwezî!" Lê wekî ku ez ê bêjim… Erê, xwezî me zû çalakiya xwe pêk bianiya û em biçûyana… Ku niha ji nişka ve bibe sibe! Em ê çi bikin li vê deşta bêbext? Na Binevş, sibe bi carekê de, ji nişka ve nayê.

Kemal jî aciz bûbû. Axîneke kûr kişand… Axînên kûr, ramanên wî kûrtir dikirin… Ramanên kûr, birîndariya wî, hevaltiya wî, hezkirina wî.

Dîsa sawê te girtiye Kemal… Ev saw û vê tirsa malxirab jî dev ji min bernade… Ji sibê de wiha me. Dilê min, ax çi ye tu diperpitî? Înşalah tu mafdar nebî di vê şeva dijwar de…Dilo, dilê min... Em ê sax û serkeftî vegerin çiyayên xwe te fêm kir ne? Te fêm kir? Dilo “mehkûmo lo dilo… Dilo perityo lo dilo” Silav li te kekê Aram! Dilo tirsoneko lo dilo… Na na! Dilê min ne tirsonek e… Lê ez niha naxwazim ku dengê dilê xwe bibihîzim… Dixwazim ku tenê ramanên rast hebin îşev… Hedef û amadekariya me hev bigire… Em ê cenga xwe ya îşev, baş pêk bînin, piştre vegerin… Lê ew çi deng bû hat, hinekan fikand, li fîqê xist ji hev re…

Na na… Tiştek tune. Û van xezal û şêrên min… Dê tu tiştek neyê serê van xezal û şêrên min! Tu gule li wan nekeve… Weey! Ma ku guleyek xayîn li bejn û bala Pilingê min bikeve? Ku Ozkanê min birîndar bibe… Ku guleyek bêbext, li bejn û bala Binevş û Zozana min bikeve… Ku guleyek li rindîtiya wan bikeve, ez ê çi bikim? Na! Bila tiştek bi ciwanikên min neyê! Ma tu, tu jî ne ciwan î Kemal… Tu jî ciwan î… Xeyalên te jî hene. De bes lo. Çi mirin û gule û nizanim çi, dev ji te bernadin! Ooy… Ez aciz bûm, em hinekî din jî bisekinin, ku tiştek tune be biçin.

Piling:

- Bi xwedê kin hevalno! Ev kund ji ku derket! Nasekine jî!

Zozan:

- Bû heşt car ku dixwîne… Lê xuya ye ku dê hinek paşê bisekine…

Binevş:

- Hêj nû bû heşt car! Min digot qey ji sed-dusedî zêdetir e?

Piling:

- Çima te got “dê bisekine”.

Zozan:

- Ji ber ku dê şer derkeve hevalê min.

Kemal:

- Erê dê şer derkeve û kund bitirse, bireve… Lê înşalah şer li vê rastê dernekeve. Em hinekî biçin paşê. Em êdî rabin hevalno. Ay! Tiştek tune ye… Şivanan ji hev re fikand. An jî.

Binevş:

- Ez carinan ji ‘an jî’ qet hez nakim.

Zozan:

- Em hez bikin jî, nekin jî ‘an jî’ heye.

Piling:

- Hevalno, sebra min nema…

Wekî ku çend roj û çend şev e em li vira li benda êrîşê ne! Êdî bes e!

Kemal:

- Gelo, ew dengê fîqê ji mala Ferzende nebe hatibe… Dibe ku xwestibe îşaret bide me? Ango hatibe pêşiya me.

Xort:

- Na heval… Di navbera me de tiştek wiha tunebû… Ez jî pir şaş bûm…

Kemal:

- Tu dixwazî êdî vegere hevalê Xort… Jixwe hindik ma.

Xort:

- Weleh destê min ji we nabe… Lê ez vegerim baştir e. Ez ê hêj biçim bi aliyê Norşînê ve jî.

Xortê ku ji nava şevê hatibû, dîsa çû, di nava şevê de winda bû… Jixwe tim wiha dibû, yên wek wî, peywîrên xwe yên wêrek û fedakar pêk dianîn û diçûn… Tenê gerîla diman di demên herî dijwar de… Tenê ew diman, di demên li keviyên kuştin û mirinê, gulebaran û xwînê de… Lewre ew, ew bûn… Peywîra wan jî, mayîn bû… Ew nikarîbûn biçûna weke wî xortê… Diviyabû neçûna, bimana.

Kûçikek reyî li nêzî wan… Şaş nebûn, di demên wiha de tim ewtîna kûçikan dibihîstin… Jixwe hemû kûçikên gundan bi wan şiyar dibûn her şev… Gerçî hinek ji wan êdî bûbûn 'nasên' wan, nediewtiyan jî… Lê îşev wayê diewtiyan dîsa… Lewre çûn û hatina wan a li vî gundê deştê pir nebû… Bi piranî xwediyê malê Ferzende dihat û diçû cem wan.

Kemal bêsekn li dora xwe dinêrî… Li milê rastê, aliyê riya asfaltê erebe bi lez diçûn lê hinek ji wan, lambeyên xwe yên pêşîn vemirandibûn. Bala Kemal kişand "Di dilê xwe de got: "ji xêrê re venemirandine…" Baş e ku riya me zêde di wir de derbas nabe… Em bilezînin baş dibe… Li hemû hevalan nêrî. Piling! Tu li ku yî ? Hevalno em ê niha, ango ez û Piling em ê di pêşî de biçin… Jixwe em rênas in hûn dizanin… Hûn jî pir hêdî werin… Carinan bisekinin… Em ê binêrin ku tiştek jixwe…

Ozkan:

- Heval tu dîsa bi tedbîr peyivî û ji bo ku em nebêjin "em jî tên" te got "jixwe em rênas in, em herdu…" Lê ez dibêjim em bi hev re biçin çêtir e… Jixwe ku…

Binevş:

- Ez jî tevli heval dibim. Jixwe em gihiştin ber malê jî.

Kemal:

- De ka bisekinin hevalno! Hûn ê niha li cihê xwe bimînin… Piştre hê-

dîka werin… Ez û hevalê Piling, em ê îşaretê bidin we… Hûn ê werin… Jixwe em ê malzemeyên xwe bigirin û bilez ji vir dûr bikevin… Ango em ê bibazdanê biçin, ji ber ku divê em ji asfaltê jî derbas bin… Piştre ji xwe her kes cih û rista xwe dizane… Haydê serkeftin! Hevalê Piling! Piling bê dilşahî da pey û bi ken got: "Serkeftin hevalno, zû werin ha!"

Winda bûn di nava tarîtiyê de. Binevş, nizanîbû çima, lê dixwest, ango ji nişka ve xwest, ku biçe wan hembêz bike an jî bêje oxir be! "Lê piştre ramiya û ji xwe re got:" Jixwe em ê jî biçin ba wan. Naçin cihekî… Ez çima wiha diramim…

Piştî ku ew winda bûn di nava kûrahiya şevê de; kom rabû hêdîka meşiya. Dîsa birêzê bûn. Waqewaqa werdekek kovî dihat ji derekê. Kûçikê ku direyî, sekinîbû. Hinek paşê werdek jî sekinî. Dimeşiyan bi bendewariyeke mezin. Li benda Kemal û Piling bûn… Dê niha, ne dereng, hema niha dengê wan bihata. Vegeriyana bigotana, "werin hevalno!" Dê bigihiştana hev… Dê ev parçebûn biqediya… Parçebûn nebaş bû, bêbext bû… Çiqas wiha ji hev diqetiyan, xwe parçebûyî hîs dikirin… Di kûrahiya wê parçebûnê de veqetînên bêdawî jî hebûn… Loma jî di demên wiha de, dixwestin ku gavek zûtir bigihiştana hev, parçebûn biqediya… Her parçebûn, birînek kûr bû jî lewra… Û diviya ku ew birîn zû bihata girtinê û di mirinê de jî, di jiyanê û hemû tewreyên awazên wê de jî bi hev re bûna… Li bendê bûn… Bi gotin nedigotin. Hemû LAL bûn ew dem… Lê bêgotin digotin bi hev re; "De zû werin hevalno! Hûn li ku man hevalno… Şev diçe hevalno… Zû werin, zû werin em tenê ne… Hêj nû bûbû çend deqe ku ew çûne… Lê digotin qey saet derbas bûne. Wekî ku sebra wan nema êdî… Dê bilezandina ber bi wan ve… Piştre gazî wan bikirana… Bigotana "xêr e hevalno! We em jibîr kirin. An we em li vir hişt û hûn bê me çûn çalakiyê…" Dê wiha bigotana… Lê… lê… Şev qîriya… Gulebaranek wisa dest pê kir ku, teyrok û tofanên biharê jî hewar dikirin… Çarmedora wan bi lambeyên cengê hatin ronîkirin û guleyên cur bi cur, roket û çekên lavê şixulandin li dijî wê koma ciwan… Gule li porê wan diketin, li çenteyên li pişta wan… Weke ku mirin bi wan henekên xwe bike, guleyan xwe di ber guhên wan re di ber çok û sîngên wan re derbas dikir… Gule dibariyan, dibariyan û ew tik û tenê bûn di nava wê deşta dûz û bêstare de… Hinek bêkes, parçebûyî, hinek şaşwaz, hinek xemgîn bûn… Lê wêrek bûn di nava wê şeva bêbext ku bi lambeyên firyar hatibû ronîkirin de xwe avêtibûn erdê û li dora xwe dinêrîn, li stareyan digeriyan an jî ji hev re dibûn stare…

Lê dilê wan li ba Kemal û Piling bû. Hê jî li benda wan bûn, li wan digeriyan û dixwestin ku neketibin nava kozikên wan… Di nava wê qiyametê de li wan diramiyan… Gelo bi ku ve çûn? Dijmin dîtin û xwe paşve kişandin ji bo ku xeberê bidin me… An jî şer dikin di nava vê gulebaranê de, dengê çekên wan, guleyên wan jî hebûn!

Gelo bi ku ve çûbûn ew? Çima nedihatin hewarê? Ma di demên wiha de tim, serkêşî nedikirin bi hev re.. Yên herî şervan bi tecrûbe ew herdu nebûn di nava wan de… Gule dibariyan, dibariyan di nava wê şeva ronîkirî de… Bi ser bejnên wan ên ku li erda wê deştê dirêjkirîbûn de… Carekê dîtin ku du reş bi aliyê wan ê rastê ve dibezin, ber bi pêşika çiya ve diçin. Bêhna wan derket hinekî. Gotin qey, Kemal û Piling in… Xelas bûn ji nava kozikên wan… Xelas bûne ji nava namlûyên wan, da ku werin wan jî xelas bikin… Loma jî her yek ji wan, bilez cihê xwe guhertin di gaveke ku lambefir vemirîbû de. Û êdî çekên xwe neşixulandin ji bo ku cihê wan neyê zanînê… Li benda herdu şervanên ku rizgar bûn ji dorpêçê, li benda Kemal û Piling man… Dê hema niha çekên xwe bişixulandana li cihê xwe yê hinek bilind… Bala dijmin bikişandana ser xwe… Dijmin bi xwe re mijûl bikirana û dê wan jî cihê xwe biguharta… Ango zûka ji wir dûr biketana… Erê, dê niha dest bi şer bikin ji bo ku wan rizgar bikin… Zozanê bi helkehelk got:

- Ma wana çima dest bi şer nekirin… Jixwe Mehmetçik jî zêde nikare şer bike… Ka binêrin guleyên wan bêhedef difirin… Şeytan dibê bangî Kemal bike… Ma ew çi dikin! Birîndar jî nebûne… Baş dibeziyan… De haydê hevalno…

Binevş:

- Heval, ku wiha bidome dê niha panzer werin vir… Mêze çawa tênê. Em hinek paşê bang bikin ku nebû…

Jixwe ji gava din ve qîjeqîja bêtêlan bû… Niha jî serleşkerê wan bi hoperloyê digot: “Teslim ool!... Teslim oool! Terorist, sana dokunulmayacaktır…” Dixwest ku dengê xwe stûr, weke yê gayekî stûr derxista… Lê dengê wî dilerizî ji tirsan. Ji çarmedorên wan deng dihatin û hinek ronahiyên erebeyan, panzer û jîpan nêzîk dihatin… Ew hê jî li bendê bûn…

Binevş:

- Hevala Zozan, Sînan û Zinar kanê?

Zozan:

- Hê jî li vir bûn. Qey cihê xwe guhertine.

Bêdengî hinekî domiya. Ango gulebaran sekinî.

Tenê dengê erebeyan û bêtêlan dihat. Hoperlo jî sekinîbû… Wekî ku westiyabû… Bêdengî û bendewarî bûbû jehrî û bi qirika wan girtibû. Kund dîsa dest bi xwendinê kir… Te digot qey li benda tiştekî wiha ye. Xwend, xwend… Ji nişka ve bombeyek teqiya, gurmîna wê, erd û ezman hejikand… Bi teqîna bombeyê nalînek jî hat… Nalîn…

Dengekî weke nalînê bilind bû asîman… Dengekî ku ji parçebûn û parçekirina bombeyê derket û bilind bû çû asîman… Dengekî tenê, dengekî ker û lal, dengekî ku niha û tu car nikarim bînim ziman. Piştî wê teqîn û nalînê, şev jî ker bû, hoperlo û bêtêl jî… Rê û dirbên li derdor jî ker û lal bûn! Binevş û Zozan jî ker û lal bûn. Û pirsa mezin hemû hebûna wan girtibû… Ev bombe ya kê bû? Ya hevalan bû ne wisa? Ev bombe! Ya Hevalê Kemal û Piling bû… Ji jorê, ji ber malê, ji ber kozikên dijmin hat? Na… Ma ew herdû nebûn ku beziyan, xilas bûn ji vê dojehê… Ew nîn in ku niha li cihekî bê dijmin in û em li benda wan in… Ma Zinar û Sinan kanê? Nû didîtin ku ew tenê mane… Tenêmayînê fêm kiribûn, lê nedixwestin ku dengê bombê, an jî yên li pişta dengê bombeyê fêm bikin. Ax, ew bombe ya kê bû? Ma ew neçûbûn? Na lo! Bombeya dijmin bû… Ma yên wan jî wiha ne… Avêtin ji bo ku hinek paşê werin binêrin ka kesê zindî heye yan na? Na… Neavêtin… Bombe li wira li ba wan teqiya… Ev jî dide xuyakirin ku hinekan xwestiye bi wê bombê li dijmin bixe û me xelas bike… Ma ji hevalê me pêştir kî me xelas dike? Na, dibe ku leşkerekî dost jî kiribe… Ma Kemal û Piling kanê? Yên ku dibeziyan, ne ew bûn… Ên ku dibeziyan Sinan û Zinar bûn… Me jî digot: “Çima Kemal nayê me xelas nake…” Di nava gola pirsên bê eman de man. Te digot qey birûskek bi wan guleyan li wan xist û wan kuşt, wan şil kir… Na, na birûsk çi ye! Hin gav hene ku derba wan, ji ya bombe û gulebaranan dijwartir e… Mirov wisa dikuje ku kuştin el eman dike ji ber… Ew jî wisa hatibûn kuştinê, bê gule… Gule tenê li porê wan, li milê wan ketibûn… Lê guleya demê û gavê, wan kuştibû… Nizanîbûn çi bikirana...

Dijmin jî bêdeng bû. Dibe ku ‘Mehmetçikên’ reben ketibûn xewn û xeyala mala xwe jî… Heyv tam bilind bûbû, dibiriqiya, kevir û xîçikan dibiriqand… Heyv ronak bû, dikeniya,

Haya wê, ji felekê tune bû… Te digot qey ne gulebaranê dîtiye, ne cengê, ne jî parçebûnê…

Dengek hat! Erebe dîsa bi rê ketin… Erebeyek tam bi aliyê wan de bi ser wan ve hat…

Dihat û dihat û ew li ser erda deştê wek du gulên çilmisî bûn… Wek du karxezalan bûn ew, di wê şeva deştê ya bêbext de… Du karxezalên bêkes, birîndar û lal… Tiliyên xwe yên biçûk û zirav dan ser tetîkê, ku ew erebe an jî panzer çawa bihata ber bi wan ve, dê lê bireşandana. Piştre… Piştre jî xwe bikuştana… Gule li xwe bixistina… Bêgotin û şêwr, ev biryar girtin û li benda wê cinawirê, li benda wê kujerê man… Çawa dihat!... De hema bila bihata! Ma jiyan çi bû li hemberî mirinê! Ma ew nêçîrvanên mirinê nebûn? Di gavek wisa dijwar de bûn ku ji sedsalan dirêjtir û girantir bû… Gavek din, gavek gulebaran, gavek kuştî û kujer… Ax, di gavek bêeman de bûn! Ew ronî hat… Hat! Tiliyên wan liviyan li ser tetîkê… Lê ew çi bû Xwedayo! Ev çi bû ya star! Ew ronî panzer nebûn, traktorên gundiyan bûn… Sê traktorên ku romorkên wan tije êzing bûn, li pey hev di ber wan re derbas bûn… Ango yeko yeko derbas dibûn… Di navbera wan de 30- 35 metre valayî, ango tarîtî hebû… Destên wan ji ser tetîkê zûka rabû li hev geriyan… Bêgotin bi destên hev girtin vê carê biryara jiyanê, ya bezê stendin.

Traktora ewilî derbas bû… Ajovan û yê li kêlekê rûniştibû li wan nêrîn… Wekî du gulan bûn li devê rê… An jî du kevirên dîrokî… Rûyê herduyan jî nas hat ji wan re… Jixwe rûyê hemû gund û gundiyan, zozan û koçeran tim nas nebû ji wan re? Ax lê rûyê wan nas nehatibû ji wan re… Çavên ajovan jî, yê hevalê wî jî bi şaşwazî fireh bûbûn… Gavek hêdî kiribûn, wekî ku dê bisekinin… Lê di heman gavê de dijmin gule berdabû û wan jî pê li xaza traktorê kiribûn û çûbûn… Lê hin tişt, li pey xwe hiştin… Zozan û Binevşê tenê nehiştin… Ew tişt çi bûn?

Qevdek kulîlkên çiyayan, çengek ava kaniyan, sê dilop hêsirên hêvîdar û kenekî dostanî bû gelo? Nizanim çi bû, lê hin tiştên germ û xweş li pey xwe hiştibûn… Herdu rabûn wek xezalên birîndar beziyan ber bi pêşika çiyan ve… Beziyan, du xezalên birîndar û di wê bêbextiyê de bê heval. Piştî ku çûn, gihîştin pêşika çiya, ango piştî ku ji nû ve ji dayikê bûn; çawa bûn?

Nizanim çawa bûn. An jî çawabûna wan nayê gotin… Lê tê fêmkirin… Traktora din jî derbas dibû… Mehmetçikan dîsa gule barand. Piştre ya din jî… Derbas bûn çûn…

Ew tenê bûn dîsa… Li dora xwe dinêriyan… Parçe bûbûn… Wekî ku parçeyek wan li wê deştê, di bin gulebarana kemînê de mabû… Lê nizanibûn ku ew çi parçe ye, çawa parçe bûne… Lê destê wan ji wê dera nedibû… Wekî ku hinek li wir li benda wan bûn…

Wekî ku hin çavan ji wir li wan dinêrîn… Hin gotin ji bo wan dihatin gotin, hin dest, ji bo wan dirêj dibûn li wir… Wekî ku hin stran ji bo wan dihatin gotin û hin stran di nîvî de mabûn li wir! Dilê wan, dilê wan jî li wir mabû. Parçe parçe bûbû… Dibe ku di nediyarî û teqîna wê bombê de dilê wan jî bi nediyarî parçe parçe bûbû… Wekî ku xwîna wan jî rijiyabû li wir… Di çavên wan de dibû golek xwînê jî ew der… Lê nizanibûn çima… Nedixwestin ku bizanibin jî… Navê Kemal û Piling dihate ser zimanê wan… Pir jî bêriya wan kiribûn… Wekî ku bi salan e nedîtine… Lê her tişt, di nava çend deqeyan de pêkhatibû…

Bi lezek mezin û wekî ku di xewnek kûr de bin… An jî wekî ku bêvexwarin serxweş bûbin digeriyan, ber bi jora çiyan ve diçûn… Dikirin niçeniç, difîkandin, bang dikirin: “Hevalê Kemal! Kemaaal !... Piling… Hevalê Piliiing !...Hevalê Sinan!” Lê tu bersiv tunebû… Riya ku tê de dimeşiyan ji qûm û tozê bû. Ango wek berfek ji tozê. Piyên wan tê de diçû… Tozek radibû bi bayê nîvê şevê û wan dida kuxînê. Çavên wan dişewitand. Şev hê jî bêdeng bû… Lê nêzî daristanekê dibûn û dengê çûkan dihat ji dûr ve… Ji berjêrê wan jî dengekî din dihat… Dengê serleşker, ji yê kundê kor xerabtir dihat digot: “teslim ool!...” Lê xuyabû ku tu bersiv nedigirt.

Gihiştin navsera çiyayê bi daristan… Agirê şivanan dixuyan li zozanan… Bêhna kulîlkên payîzê û agir dihat… Te digot qey “buhişta winda” li wê derê ye… Hay û hêviya wan zozanan ji şer û pevçûna gava din, ji veqetîn û axînên wan, ji gulebaran û çalakiya wan a ku bê destpêkirin xilas bûbû tune bû.

Erê zozan di xewa şîrîn de, ax di vewestîna hênik de, şev li benda berbangê bû… Lê ew!

Bilez dimeşiyan û carê carekê bang dikirin! “Hevalê Kemal! Hevalê Piling! Sinan! “ Lê dengê wan li wan vedigeriya û tu bersiv tunebû.

Zozan:

- Kemal Kemal! Ku ez te bibînim, çi bibêjim ji te re… Di civînê de em ê hev bibînin.

Binevş:

- Erê weleh, li ku ne? Gelo Piling bi dû xeyala bostanvaniyê ket û çû nava bostanan?

Tobe tobe.

Zozan:

- Te eynî wek pîran got: “Tobe tobe!” Mirov nizane çi birame

înşalah em wan careke din bibînin û heyfa xwe ji wan bistînin.

Binevş:

- Ma çima qey şikek te heye… Tu çawa wiha dibêjî!

Zozan:

- Hevala Binevş… Ev ne, şik e… De veneşêre tu jî ditirsî ji vê pirsê, ji vê gotinê…Van stêrkên malxirab jî çiqas diçirisin…

Binevş:

- Erê ez ditirsim ji wê şikê… Tu çima ji stêrka re dibêjî 'malxirab' çi sûcê wan heye… Û mala wan jî qet xirab nabe…

Zozan:

- Çi zanim… Gule nagihîjin wan… Haya wan ji mirinê tune…

Binevş:

- Çawa ew jî vedimirin…

Zozan:

- Ooy… De tu dibêjî qey tu derd û xemek me nema ku îcar em, bi dora stêrkan ketin.

Binevş:

- Te pêşî behs kir heval… Tu çima xwe dixeyîdînî îcar…

Zozan:

- Ez nexeyidîme ha… Nizanim bêjim çi… Em herdû tenê mane îşev… Ku em şer bikin dê pir şerm be û di demek wiha de ez naxwazim şerm bikim… Gerçî naxwazim tu tiştekî jî bikim… Bibore Binevş… Ez pir hesas bûme… Loma xwezî me niha hevalan bidîta…

Ev perçebûn… Te çima got: "Ez naxwazim tiştekî jî bikim"… Hêj pir tişt hene ku em bikin…

Tu çima wiha dibêjî… Dixwest ku pir tiştan bêje, lê qirika wê tije bû û hêsirên wê hatin xwarê…

Binevş:

- Xwedayo… Hevala Zozan de ka tu jî negirî… Ez ji girîna di demên wiha de pir aciz dibim…

Zozan:

-Ma ew çi ye tê serê me.

Binevş:

-Ooy… Ez ji te re propaganda bikim! Em rabin biçin ba koçeran… Tu tî nebûyî? Qirika min ziwa bûye… Dengê avê tê ji derekê… Ew kaniya mezin li van doran bû… Du- sê caran ez û hevalê Kemal bi hev re hatibûn… Em biçin avê vexwin… Av hêj diherike Zozan…

Rabûn… Berê xwe dan şiverêyek din û meşiyan… Lê bendewar bûn û li dora xwe dinêrîn… Çûkên şevê bi dengê meşa wan şiyar dibûn û difiriyan ji hêlînên xwe yên li ser daran… Dengê avê nêzîktir dibû her ku diçûn… Çiqas ku nêzîktir dibû, tîbûna wan zêdetir dibû… Carinan disekinîn bi dengê ku li ser giyayên hişkbûyî dike xişexiş… Bi hêviyek mezin guhdarî dikirin… Lê tewş bû! Ew deng jî, dengê lingên wan bû. Ji nîşka ve dengê baskên çûkek hat û kund dest bi xwendinê kir… Herdu jî veciniqîn!

Binevş:

- Ev nebixêr hêj sax e û dixwîne… Tu dibêjî qey li pey me tê… Çima guleyek lê neket? Ooy oy. Ez jî aciz bûm… Kêliya din me hemûyan… Koma me bi hev re dibihîst dengê vî kundî… Lê niha… Te çima got: “ma çima gule lê jî neket” qey gule li me ketiye?

Zozan:

- Em baş nizanin… Lê wekî ku mirinek heye li pey me… Ango guleyan, hinek ji me birine… Goya em diçûn çalakiyê hevala Zozan… Ev çi bela bû… Ew kemîn di mala Ferzende de bû… Goya Ferzende dostekî kevin bû!

Binevş:

- Ji nava mala wî li me direşandin… De tu jî hiş be kundê kor…

Zozan:

- Binevş, tu çi dixwazî ji vê heywanê… Di demên wiha de diya min digot: “tu çi dixwazî ji heywanê xwedê!”

Dengê avê pir nêzîk bû… Hênikahiya wê jî tê… Em hinek li vira bisekinin ne wisa… Kemînek li vira jî tunebe… Lê na tenê xuşîna avê dihat… Taveheyvê dabû ser kaniyê û dor û berê wê diçirisand… Weke ku heyv ketibû nava avê, diherikî… Wekî ku avê li wan guhdarî dikir… Wan şanî wan dida… Wekî ku heyvê, wan dişopand û digot: “Ez bi we re me!” û kaniyê jî, bi ava xwe ya bêdawî digot: “Xem nekin… Jiyan naqede… Ceng û mirin nikare jiyanê û herikandinê wê tune bike… Emrê cengê kuştin û mirinê pir kin e… Lê emrê av û axê, mirov û kedê bêdawî ye…”

Binevş:

- Hevala Zozan, tu vexwe, ez li vira me…

- Tu pêşî vexwe.

- Na Heval!

Me ava xwe ya dawî li newalê vexwaribû… Çiqas xweş bû… Berêvarekî bi heyecan, romantîk û hêvîdar bû… Berê me li rê bû…

- Erê heval… Hêj çend saet berê bû, lê mirov dibê qey meh derbas

bûne di navberê de… wekî ku buhiştek bû, xewnek xweşik bû û qediya… Li dûr e niha …

-Te av venexwar. Vexwe heval, em biçin.

- Îcar dora te… Tu jî rûyê xwe bişo… Bêhna mirov derdikeve. Toz û dûmana wê dojehê bi rûyê me ve ye… Porê me jî gelek kizirîn… Ew çekên lavê çi pîs in… Bêhna wan, dengê wan… Bêhna barûdê çawa tê ji cilê me.

Binevşê hêdîka, wekî ku bi dizî bike, rûyê xwe dişûşt… Heyv û rûyê xwe didît di nava avê de… Li Zozanê nihêrî… Destê xwe yê şil di ser porê xwe da… Bêhna kizîro û barûdê hate poza wê jî.

- Hevala Zozan tu metereyan didî min em tije bikin… Dibe ku em rastî hinekan…. Rastî Kemal wan werin… Bila ava me hebe.

Zozanê bi lezeke dilşah metere da destê wê… Şev ber bi şefeqê ve diçû… Çûkên awazxweş şiyar dibûn û dor bi dor dest bi xwendinê dikirin… Bayê şefaqê şax û pelan, pûş û giyayan dihejand… Xwe li enî û rûyê wan jî dixist… Piştre bayê xwe digihand ava kaniyê û heyvê… Wekî ku av, heyv û bayê şefeqê dibûn yek, di nava kaniyê de… Hev radimûsan, bi hev re dileyîstin..

Hezkirin û aştiya xwe, awaz û ahenga xwe digotin ji mirovan û dîrokê re… Ji wê şeva winda re… Piştre ba digihişt kevir û zinarikên li dora kaniyê… Wan jî yeko yeko radimûsa û piştre mal bar dikir diçû cem konên koçeran, li benda zarokên kej û esmer, li benda şivan û bêrîvanan dima. Diçû, dihat ba… Û xwe li, tevayê jiyanê dilefand.

Dest bi meşê kiribûn dîsa… Dizanibûn ku li pêşiya wan konên koçeran, garan û keriyên pez û berxan hene… Zarok û pîr kal û xort jî hebûn li pêşiya wan. Dibe ku hevalên wan, li pêşiya wan bûna… Xwezî hevalên wan jî li pêşiya wan bûna.

Zozan:

- Xwezî ev hemû tişt weke henekek bûna. Heval derketana pêşiya me… Xwezî niha Kemal bangî me bikira.

Binevş:

- Tê bîra te… Berê me digot qey di nava şoreşê de ‘xwezî’ tune ye! Me digot qey, ‘xwezî’ya me ya herî dawî ji bo şervantî, ya ji bo şoreşê ye. Me got: “xwezî ez biçûma serê çiyayan” ew xweziya bû… Lê em şaş bûn… ‘xwezî’ neqediyane, dane dû hev û em hê jî dibêjin ‘xwezî’ wiha bûbûya, wiha bûbûya.

Zozan:

- Pîr û kalên me tim dibêjin: "Dara xwezî hişk e şîn nabe..." Niha, "dara xwezî"ya min jî hişk e.

Binevş:

- Ooy! Ez naxwazim biramim... Em niha diçin nava konên koçeran, ne wisa... Waye... waye şivanên wan dixuyên li ber agir rûniştine, te dît?

Zozanê jî dît û gavên xwe lezandin.

Binevş:

- Divê ku em niha ristvaniyê bikin... Hemû xem û birînên xwe veşêrin û wisa biçin ba gelê xwe.

Zozan:

- Erê...

Xem û xeyalên, xwe, birîn û janên xwe veşartin di rûyê xwe yê rindik û ciwanik de... Gotin û awazên dilgeş hilbijartin ji nava yên bikul û êş. Weke hunermendên şanoyeke klasîk, xwe bi dilgeşiyek girêdan û çûn ber bi konên reş, warên kurdewariyê yên herî serbest û paqij ve... Jixwe baş dikaribûn birîn û janên xwe veşêrin. Û ji xwe gava ku zarok û jinan, pîrejin, kal û xortan didîtin, rûyê wan ji ber xwe ve dikeniya, çavên wan diçirisîn...

Ne kûçik ewitîn ne jî dengekî din derket... Ji ber ku şivanan ew ji dûr ve dîtibûn û dengê kûçikan birîbûn...

Konên reş wek bajarekî serbixwe û serreş bû... Bajarek ku haya wî ji dem û dewranan, ji dezyarî û pêşketinan tunebû... Bajarekê tenê, paqij... Bajarekî çiyayî...

Dayikek wek axê xweşik, serbikofî, biskspî û rûgeş hate pêşiya wan, digel şivan û berxvanan...

- Wî wî! Hûn ser seran, ser çavan hatine... Ka werin, werin hûn westiyan e... Ma hûn herdû tenê ne... Qurbana serê we... Bêhna tiştekî ji we tê. Lawo ev çi bêhn e ji porê we yê xweşik tê? Ma qey şewitiye bêhna şewatê ji we tê.

Ew di hundirê konê xemilandî de da rûniştandin li ser mînder û zalîçeyan... Bûkê ji wan re şîr û dims û penîr anî... Ji aliyekî ve jî, digot: "biborin, me hêj xurînî çênekiriye..."

Dayê pirsên xwe didomand:

- Hevalên we bi ku ve çûne çima ew nehatin? Ma hûn êdî dudo dudo digerin? Wiha nekin lawo... Çawa ku dijmin pir e, divê hûn jî pir bin.

Zozan:

- Em pir in, komên me mezin in dayê... Ew çûn bi aliyê din ve.

- Çûn bi kîjan alî ve keça min… Bi aliyê konên Mamediyan ve?

- Na na bi aliyekî din ve çûn dayê…

- Lawo aliyê din kîjan e? Ez hemû herêmê dinasim… Ên herî baş li vî alî ne. Xwedê bike ku neçûbin bi aliyê deştê ve… Hemû xayin in ew… Xwezî bihatana vira. Careke din, wan jî bi xwe re bînin…

Zozan ji vê rewşê aciz dibû, wekî her gavê… Ji xwe re digot: "çima em mecbûrê derewan dibin! Çawa ji min bawer kir û wê jî got "xwezî" ma ev xwezî dev ji me kurdan bernade…"

Binevşê dît ku dayê pirsên xwe xelas nake got:

- Dayê van rojan qet dijmin-leşker bi van aliyan ve nehatine?

- Na lawo. Ma diwêrin werin van çiyayên asê! Tu car nehatine. Tenê firokên wan derbas dibin carinan. Lê newêrin werin. Jixwe pîra min digot ku -ez wê demê zarok bûme – di dema serhildana Şêx Seîd û Geliyê Zîlan de jî; piyê leşkerên romê bi vir neketiye. Van çiyayan paqij û azad in lawo! Bi lingên leşkerê romê qirêj nebûne… Niha jî wiha ye… Nikarin werin lawo ma rê heye ku werin. Xayin hene ku wan bînin… Ku xayin tunebin, tu tiştek nabe lawo… Ne kes tê kuştin ne jî.

Binevş:

- Rast e dayê… Ku xayin tunebin… Lê ew ê jî xelas bibin… Emrê xiyanetê heya niha dirêj bû… Lê yê azadî, biratî û dilgeşiyê kurt bû… Lê ji niha û pê ve dê emrê xiyanetê kurt bibe, xelas bibe.

- Rast e lawo.

- Ev çi deng e tê dayê?

Herdu bi hev re rabûn ser piyan.

Dayê:

- Biseknin ez ê binêrim û werim.

Çû lê çûn û hatina wê bû yek. Xortekî esmer û bejinbilind bi xwe re anî û hat. Xuyabû ku xort, çav û birî ji diya xwe girtibû. Pir dişibiyayê.

- Merheba, hûn çawane hevalno! Hûn herdu tenê ne?

Dayikê bersiv da got: "erê, hevalên wan li cihên din belav bûne.

Xort destê xwe li rûyê xwe gerand, da ser rihê xwe yê neh-deh rojî. Çavên xwe li dora xwe digerand… Xuya bû ku nedixwest çavên xwe bide nava çavên yên din û xuyabû ku pir tiştan dizane.

- Kurê min Meheme tu rûnê cem hevalan bi wan re bipeyive. Ez têm.

Wekî ku kêfa Meheme hat... Nêzîktirî wan bû… Bişkokên çakêtê xwe vekir.

- Hevalno, bi rastî pir kêfa min hat, ku min we wiha dît…

Min digot qey kes ji we nemaye… Hûn ne di Koma Kemal de bûn? Ax xwezî Kemal sax bûya, bila vê zozanê bi deştê ve hemû xira bûya.

Zozan:

- Na heval em ne ji wê komê ne… Tu bûyerê baş dizanî, qey şer derketiye? Hevalê Kemal.

- Na, na hûn jî ji koma wî ne. Hûn dixwazin bila wisa be nebêjin. Bila bimîne ev mesele… Lê li herêmê, tenê hevalên keçik di koma wî de hebûn, sê roj berê jî wiha bû… Loma min got… Ax ez çawa bêjim… Heval şeva din, nîvê şevê ketine kemînê… Ew bêbextê Ferzende xeber daye dijmin… Jixwe ez qet pê ewle nedibûm. Her roj du roj li qereqolê bû… Lê hevalan digot “na, hevalê me ye, polîtîka dike…” Polîtîka û nizanim çi! Dawiyê wiha kir! Biborin hevalno, ez pir tije bûme… Min bi zorê xwe girt… Dijmin ji mala wî gule û roketan avêtiye… Kemalê min… Ax diya min jê re digot “Kemalê min” min digot “na dayê ! Kemalê min e!” Kemal çû… Ew li pêşî bûye, ketiye nava namlûyan. Di guleyên ewilî de birîndar bûye ketiye… Kom hemû li wê deşta rût maye dawiyê de Kemal bombeya xwe derxistiye, xwe jî û dijmin jî parçe- parçe kiriye… Ji bo ku hevalan xelas bike… Dibêjin ku parçe parçe bûbû… Piling jî pê re bûye. Xwediyên traktorên êzingvanan cenazeyên wan li devê rê dîtine… Cenaze pir bûne… Hin keçik jî hebûne li devê rê, li erdê û kuştî bûne… Biborin, divê ku ez negirîm. Lê pir li zora min diçe… Xayinekî dikare wiha derbekî li mirov bixe… Ma Kemal ê kuştinê bû… Kê dikaribû gule lêxista… Ma Piling cara din hate vê derê, xwe bi ewên min tiraş kir… Cara duduyan bû ku xwe tiraş dikir… Ma ew ê kuştinê bû? De ka rast bêjin, hûn jî di wî şerê de nebûn? Ez vêya jî bêjim, ên ku ji min re gotin, hevalên rast û baş in. Lê ez hê jî naxwazim bawer bikim… Dixwazim ku hinek ji min re bibêjin, “na nerast e! Kemal sax e. Silavên wî li te hene…”

Sekinî! Hinekî kuxiya, kuxika wî nedihat… Lê xwest ku qirika xwe ya li ber girînê ji girînê dûr bixe… Destmala xwe derxist di ser çavên xwe da. Porê xwe yê qehweyî û gur bi destê xwe şeh kir… Serê xwe bilind kir, li nava çavên wan nêrî…

- De ka hûn jî hinekî bipeyivin… Hûn çi difikirin, hûn ê bi kîjan alî ve biçin.

Zozan:

- Baş bû ku tu hatî û peyîvî heval. Me jî meraq dikir… Min ê pirsek ji te bikira…Te qet heval nedîtin.

An jî yên ku wan dîtibin haya kesî ji wan tune?

- Na heval. Ma hêj çend saet derbas bû di ser de… Nîvê şevê çêbûye ev bûyer… Niha jî çarê sibê ye… Dibe ku bi van aliyan ve werin an jî bi aliyê Motka ve biçin… Lê Kemal… Kemal çû hevalno! Êdî çi wateya jiyanê heye?

Binevş:

- Na hevalê Meheme wisa nepeyive! Kemalê me pir in… Hevalê Kemal jî naxwaze ku em li pey wî xemgîn û bêhêvî bibin.

- Gelo cenazeyên wan çawa kirine, yên wan herdu hevalan? Bi îhtimalek mezin dê şaredarî ew li cihekî nenas veşêre… Em malbatan jî nas nakin ku biçin ji wan re bêjin… Lê ku bibûya min ê biçûya bigota, “Birayên min in” û wan bianiya bi govend veşarta… Min ê wan li serê van zozanan veşarta. Herduyan jî ji vira pir hez dikirin. Min ê teybek bida ber serê wan, bila bi şev û roj Aram û Xelîl Xemgîn û Ciwan Haco, ji wan re bistrana. Ji stranan jî hez dikirin.

Çawa ku got “ stran” Binevş veciniqî. Wekî ku pê li birîna wê kiribûn, kola bûn bi agir û xenceran. Çavên xwe girt… Zozanê fêm kir. Destê xwe da ser milên wê… Baş bû ku dayê bi sêniya li ser destan hate hundir û bal kişande ser xwe.

Zozan:

- Tu xwarina xwe bixwe heval… Em ê hinek biçin dervayî kon.

- Na heval. Ez biçim, hûn ji xwe re razên. Hûn niha westandîne jî.

Dayik jî tevli wî bûbû û nivîn amade dikir… Lê nehiştin û çûn derve.

Zozan:

- Binevş, tu niha xwe bizorê digirî ne wisa? Ez jî wisa me. Em biçin. Jixwe li jora vê derê cihekî me heye… Dibe sibe jî.

- Erê, em zû biçin… Heyv jî çûye Zozan. Vê heyvê çiqas pir tişt ji me stand heval. Ooy! Ez naxwazim tu tiştekî biramim. Xwezî Meheme nehata û wiha nepeyiviya… Ez dixwazim her tiştî ji bîr bikim… Ooy… Ez pir westiya me hevala Zozan… Kanê em zû bikin biçin.

- Ka tu li vir bisekine ez çentê me ji hundir bînim û werim.

Bilez çû hundir. Meheme û dayê xwestin ku wan bidin sekinandin. Lê nebû çenteyên xwe girt û hat. Dayê jî kîsekî tije nan, penîr û hwd, kiribû pê re dimeşiya.

- Na lawo ez ê heya wê jorê bi we re werim û vegerim.

Bi gavên lezgîn dimeşiyan, heya derekê çûn.

Zozan:

- Dayê êdî tu vegere. Ka were em te hembêz bikin, destê te maç bikin.

- Ax, destê min ji we nabe lawo… Lê ez zanim ku hûn nahêlin kes bi we re were… Binevşa min qîza diya xwe… Li xwe miqate bin ha! De haydê biçin, ez fatihekê li pey we bixwînim û we emanetê Xwedê bikim.

- Bi xatirê te dayê, bi xatirê te!

Di nava şiverêyekî zivronek û ziravik de dimeşiyan. Bilez û bi xem, bi hêrs û keder… Wekî du dilopên baranê bûn, ji asîmanê demê bariyabûn, lê bê cih û bêwar bûn… Li nava wan çiyayên bilind û bêxwedî du kulîlkên payîzê bûn ew! Çilmisîbûn di mirina hevalên xwe de… Lê nedixwestin ku bînin bîra xwe… Du gotinên ronahî û xweş bûn ew, ji bêzimantiya gelê xwe hatibûn, du qulingên birîndar, du stranên bihawar bûn ew, li serê wan zozanan, di bêhevalmayînek de.

Heyv û stêrk çûbûn bi tevli wê şeva bêdawî ve. Lê ew neçûbûn… Gulebaran çûbûn lê ew hêj neçûbûn… Bilez dimeşiyan, bigotin dipeyivîn, bi axînan dijiyan…

Binevş:

- Em pir neçin êdî. Cihê me li van deran bû. Ez pir westiya me Heval.

- Ez jî westiya me… Em biçin ba wê darê bisekinin.

Tu hes û dengek jî tune ye… Tu dibînî, rojhilat çiqas xweş bûye… Dibe ku em îro hevalan jî bibînin. Ax! Hevalê Kemal! Me jî digot: “em ê di civînê de heyfa xwe jê bistînin” Xwedê li me bixe. Em çiqas çiqas…

Qirika wê tije bû, xwe avêt ser erda binê dara çinarê.

- Çawa devê me digeriya? Binevş, me çend caran bang kir em çend carên wek sedsalan li hêviyê man… Me nizanibû ku Kemal û Pilingê me, şehîd bûne, parçe parçe bûne… Nizanim çima ew gule, li me neketin!

- De wiha nepeyîve Hevala Zozan… Tu pê li birînên min jî dikî… Min jî dixwest ku biçûma bi wan guleyan… Lê vê carê nebû… Helbet dê rojek rastê me jî werin ew gule… Ooy… Em weke mirinperestan dipeyivin… Dema ku Mehemed li ser hevalê Kemal dipeyivî jî… Min di dilê xwe de digot ma em ê jî rojek parçe parçe bibin! Ma çi tehma vê jiyanê heye… Lê nedibû ku min bigota… Gerçî me qet bersiva wî neda. Li ser şehadetê… Te dît got: “Piştî Kemal her tişt bêwate ye” Diviyabû ku me bigota, “wiha nepeyive şehîd nemirin … Em heyfa wan hiltînin…” Lê min nikaribû bigota… Min got, belkî tu jî bibêjî… Lê te jî negot… Qey te jî nexwest çi dizanim. carinan mirov, naxwaze hinek gotinên rast û bîrdozî bide dû hev… Carinan hin gotin, çiqas rast û pîroz bin jî, nayên ser zimanê mirov… Û jixwe ew malxiraba xiyanetê jî…

Şehadetan zortir dike. Pir li zora min diçe… Em ji bo kê, ji bo çi wiha her tiştî feda dikin û yê ku li me dixe, me dikuje kî ye? Dîsa kurd e! Ango goya kurd e. Ooy dilê mirov çawa reş dibe ji her tiştî… Dizanim, em gerîla ne. Şêr û pilingên çiya ne… Cara din me ev gotin li ba Kemal wan got… Niha ew tune ne… Ango ev asîman, ev gotin hene lê ew tune ne… Zozan, tu bi Xwedê bikî, bêje "na Kemal sax e… Li benda me ye…" Ev mirin çi malxirab e… Madem ku mirin heye, jiyan ji bo çi ye… Qey her tişt, xewnek e… Yan jî çîrokek xapînok e… Ev mirin, çi tofan e ku bi hinek gulebaranan tê û jiyanê, temenê kesan diqedîne. Ez fêm nakim ha. Em ê êdî qet û qet wan nebînin Zozan. Binêre, ev saet ya hevalê Piling e… Gava ku da min, te xwe aciz kir, wî jî xwe xeyidand. Binêre, ev saet heye, digere… Lê ew tune êdî! Dengê min zêde dernakeve ne wisa Zozan.

- Na heval… Dinya pir bêdeng e. Tu dibêjî qey em herdu tenê mane li ser rûyê vê erdê, di binê vê asîmanê de… Tu kes tune… Nizanim Sînan û Zinar beg bi ku ve çûn? Gerçî ez newêrim ji bo wan jî tiştekî bêjim… Tirsiyam. Lê ew sax in… Yên ku bi serê gir ve dibeziyan ew herdu bûn… Hate bîra te, me got qey Kemal û Piling in… Dê biçin wê derê û me biparêzin… Me nizanibû ku herduyên dinê ne… Çawa çûn, li pey xwe jî nenihêrîn… Ma ku hevalên din bûna, an jî Kemal bûya. Binêre Binevş, dinya ronî bû. Ew dengê avê ji ku tê? Newal nêzî me hene ne? Ev dengê ava newalê ye… Ax ax! Dema ku ez li Başûr bûm, min qet nizanibû ku şer ew qas dijwar e! Tu dizanî, li Başûr cenga Bakur pir cuda dixuyê… Ev dijwariye ya ku me, ji cîhanê vediqetîne… Awartehiya me derdixe holê. Lê dîsa jî ... Ez jî pir westiyame Binevş… Gavên ew qas kinik jî çawa weke birûskê ne û mirov hûrî hûrî dikin… Ez baş dizanim ku em, ez; ji Kemal kuştîtir im niha… Mirin, xewnek e… Wisa tê ku mirov, qet pê nahese jî… Lê yên ku dimînin, ango bermayiyên mirin û kuştinê, pirtir têne kuştin, hûrî hûrî dibin… Ka li çavên min binêre… Çirûsk û ronahiya wan venemiriye Binevş… Ew kîjan heval bû ku di demên wiha de digot: "Ka li rûyê min binihêre, ez nemirî me heval, ez nemirî me !"

- Ew heval tu bûyî Zozan… Te digot: "Ka li rûyê min binihêre ez ne mirî me heval." Hate bîra te? Porê te pir kizîro bûye… Ku niha em zarok bûna me yê ji hev re bigota "porkizîr" Hevala Zozan, tu razê hinekî. Haydê razê, ez nobedar im.

- Tu razê hevala Binevş… Ez newêrim te tenê bihêlim. Ku ez razêm tuyê tenê bimînî. Ku tu razê jî, tuyê tenê bimînî. Wey…

Tu dibêje qey em di dema Adem û Hewa de dijîn û tikî û tenê ne...

- De hinek razê hevala Zozan.

- Heval, jixwe xewa me nayê. Em nikarin razên…Cihê me asê û veşartiye, naxuye… Em bi rê bikevin û hêdî hêdî biçin çêtir nîn e?

- Baştir e, dibe. haydê em bi rê kevin! Dibe ku em hevalê Kemal jî bibînin. Niha ew jî li me digerin.

- Ax… Binevş! Em êdî wan nabînin. De ka em bi rê kevin… Ku çentê te giran be, tu dikarî bidî min ha!

- Ê te giran e, tu meterê xwe jî bide min.

- Em êdî wan nabînin… Em çawa êdî wan nabînin… Ma tiştekî wiha dibe? Ev ne zilm e!

- Ez naxwazim vê rastiyê bipejirînim Zozan! Em wan bibînin, qey çi dibe! Em wan bibînin… Ez ê stranan bibêjim ji Kemal re… Min ê îro bigota ne wisa? Em ê îro li cihê xwe bûna û me yê pêkhatina çalakiyê pîroz bikira. Ma çi hate serê me Zozan? Qey dengek tê… Erê dengek tê ji dûr, dengê berxan tê. Em derbasî aliyê din bibin ne wisa? Li aliyê din jî koçer hene. Ew koçer jî Mamedî ne ne wisa? Ji eynî êlê ne

- Erê… Ez dibêjim ku em çûn jî… Em nekevin nava konan… Lê ji wan bipirsin ka heval dîtine nedîtine… Û bêjin ku heval dîtin, bila ji wan re bibêjin ku em li benda wan in, li wan digerin. Tu birçî nebûyî? Me tiştek nexwar. Çokên min dilerizin. Tu yê nan nexwî.

- Na lê ku tu dixwazî?

- Na heval! Em bilezînin ne wisa… Êdî bêmecaliya dil, raman û bedena me dibe yek… Ku em wekî kevirê ku dikeve bin bîrekê, li derekê bikevin û bimirin dê haya tu kesî ji me tune be.

- Ooy… Bila tiştekî wisa nebe. Ku ez bimirim, bila bi guleyan be… Ez naxwazim belatewş bimirim… Ango, bila xwîna min, weke barana biharê erdê-axê û dilê hevalan av bide, şên bike… Bila biherike û dilopê wê axa welatê ne şil bikin. Piştre ez bimrim. Ha, bila di dilê min de jî, tu gotinek, tu axîn û hesretek, tu evînek nemîne… Ooy… Ez çiqas pir tiştan dixwazim! Ez tiştên mezin dixwazim. Ma kîjan heval bê hesret, bê xemgînî û evîndarî, bê gotinên sirveşarî çûye… Ez, kî me? Ma ez ji hevalên xwe çêtir im? Çawa ku ew bi hesret û axîn çûn, ez ê jî wisa biçim… Bila ez jî wisa biçim… Min serê te gêj kir. Min serê Kemal û Piling jî gêj dikir… Min çend caran dilê wan şikand, ew xeyidandin? Gava herî dawî Piling ji min xeydan bû, an na? Tê bîra te? Min serê te êşand, ne wisa?

- Na Binevş! Tu gotinên dilê min jî dibêjî…

Ji min re qet xerîb nayên gotin û daxwazên te… Ka bisekine dengek tê. Wek ku hinek dimeşin. Nêzîk tê… Em xwe bidin pişta vê darê.

Xwe weke bêruhan dan pişta darekê, veşartin û guhdarî kirin… Deng nêzîk bû… Dilê wan pirtir kire gurmegurm… Deng hat, hat. Ew li benda rûçik û bejna mirovekî bûn… Lê bizinek reş û çavbiloq derket pêşiya wan. Poza xwe bir û anî, wekî ku bêhna wan a cuda standibû û aciz bûbû… Li wan nêrî piştre berê xwe li ba xist, şaxek gez kir û wek ku ew tunebin, an jî mirî bin cût cût… Guhên xwe livand piştre çû…

Herdu jî hêj di şaşwaziyê de bûn… Li benda mirovekî, dengê wî û xeberên wî bûn… Lê bizinek hatibû û wek ku wan neecibandibû, berê xwe zivirandibû û çûbû… Hêdî hêdî dengê lingên wê jî dûr çûn, nehatin bihîstin êdî… Wekî ku nedixwestin ew bizin biçe… Wekî ku bi çûn û xelasbûna dengê lingê wê, tenêtir mabûn. Hinek bêdeng man.

- Gelo garan û keriya wê tune ye Zozan? Ew jî tenê maye, bê kerî.

- Na na… Wekî ku kêfa wê li cih bû… Ku bê kerî mabûya, dê bêkêf bûya. Hooy-hooy! Tu dibînî em li ser bizinekê çawa dipeyivin… Ango em li ser bizinekê dipeyivin… De tu xwe hinekî dirêj bike… Ez ê li wê aliyê newalê binêrim… Dûr naçim ha! Haydê heval. Ez ê niha werim heval! Fermana nobedara xwe guhdarî bike.

Binevşê xwe dirêj kir… Lê xewa wê nedihat. Zozanê jî dizanibû ku, xewa wê nayê. Ji xewê zêdetir girîn li dora wê bû. Girînên lal, girînên ji çolan tîtir, girînên dîn, girînên ku ji hesreta kûrahiyên bêkeniyê tên. Zozanê wê tenê hişt û ber bi şiverêyek ve meşiya… Wê jî tenê hişt, xwe jî tenê hişt… Parçe bûn ango. Bûn du parçe; du parçe tenêtî du parçeyên tenê. Du girînên tenê, du keçikên tenê… Divêtiya wan, bi tenêtiyê hebû Dizanibûn ku bi dil û ramanên xwe dixwestin ku hinek tenê bimînin di kûrahiya geliyên tenêtiyê bibin masiyên biçûk û baskzîvîn… Li xwe bigerin, li rastiyê, li mirina bêbext, li jiyanê, li pirsên bêdawî û bersivên lal. Dema ku hev tenê dihiştin, xemgîn jî dibûn, dizanibûn ku ew tenêtiya bi çend deqeyan jî, hêjayî bi salan e… Ditirsiyan jî, ji tenêmayîn û tenêhiştinê… Lê dizanîbûn ku divêtiyek jî bû.

Zozanê ji gava din, dûrbîn dabû ser dareke bi tenê, ango dareke ku li zeviyekî dûr bi tikî û tenê bilind dibû û diramiya…

- Me gavek zûtir heval bidîtina baştir dibû… Binevş, weke gulekê… Çi weke gulek, weke Binevşek çilmisî ye… Ez jî çilmisî me. Ma qey ez pir geş im? Hooy hoy! Çiqas derdê me giran e! Wê dayikê çi xweş digot: “Ku dê û bavên me… Ango bav û kalên me bixebitîna dê ji me re ne-

maya û Kurdistan îro dilgeş bûbûya…” Ma Marks jî nabêje: “Tenê ji zindiyan na, em ji destê miriyan jî dikişînin. Xwezî me niha heval bidîtina… Em êvarê biçin nava wan konan… Şivanên wan çi xweş diçêrînin pezên xwe… Em ê biçin wir dibe ku, haya wan ji hevalan hebe… Gelo Binevş, hinek raza ji xwe re? Raza û raza… Na, nikare razê ma ez jî nikarim razêm … “Xew jî bi çavan nakeve… Xew bi çavan nakeve” bi xêra Ciwan Haco, em bi vê hevokê hestên xwe bidin xuyakirinê. Gelo Binevş, çi dirame? Raza ye an na? Ka lê binêrim… Ez bawer im ku niha ew jî dixwaze li min binêre. Ango min meraq dike. Ev çi dirik in li vir? mîratê, cilê me qetandin! Ha, Binevş, çavgirtî dirame… Ramîna çavvekirî jî heye, ne wisa?

Binevş, diramiya bi çavên şil û girtî. Bi dilê şewitî, diramiya ew! Na ez naxwazim mirina wan bipejirînim… Ma min ê ji wan re kilam bigotina! Weleh ez ê bêjim… Ma Kemal ku ez bêjim… Ku ez ji bo te bistrêm tu yê guhdarî nekî hevalê min! Ma te ewqas dixwest! Piling, tu yê êdî bi min re neleyîzî şîrînê min, em ê dîsa bihev nekevin û nexeyidin ji hev? Mirin… Çi bûyereke bêbext û tehl e… Çi cihekî bêveger e! Dema ku em zarok bûn, me henekên xwe bi mirinê dikir… Tenê wê demê na… Niha jî, duh jî me henekên xwe bi mirinê dikir… Ma ez û hevalê Kemal, çend caran bi mirinê keniyane! Duh êvarê, dema ku ji min re got: “stranê bêje heval. Dibe ku ez şehîd bikevim” jî henek dikir, min jî wisa dizanibû! Lê mirin wisa hat ku bû tofan li ser serê hevaltiya me! Me ji hev veqetand avêt dûrahiyan. Wekî ku bibêje: “bi min nekenin! Ez heme û we dixwim, tune dikim…” Wiha got! Lê ku mirin heye, wateya jiyanê çi ye? Ango mirov, ji bo ku bimire, tê cîhanê… Ku mirin tune be, jiyan jî tune ooy! De dev ji van pirsan berde Binevş! Dem ne dema felsefê ye ku tu wiha bipirsî û bipirsî, tu yê herî welatê dînîtiyê yê herî bêdawî. Îcar navê te bibe,”Binevşa dîn!”

Ez dixwazim razêm û razêm, qet şiyar nebim… Wîî! Ma mirin jî ne razanek bêrabûn e! Ku wiha be, ku xewnek spî û gulek sor be, xweş e mirin, gelek xweş e! Ku kerîtî û lalîtî be jî xweş e. Xwezî ez jî bimiriyama… Ango min jî bida pey wan… Ez ê jî niha tunebûma… Weey! Hevalê Kemal, hema digot: “Bêhna mirinê tê” Bêhna mirinê te bir heval, te ji me stand! Çawa dizanibû… Kî çi dizane û kî çi dizane ku çiqas bêrî, xeyal û raman veşartî man, di kûrahiya geliyê dilê wî de? Em çiqas xirab in ! Na, ez çiqas xirab im! Qey, îleh gerek yek biçe, bimire paşê mirov wê/wî bi bîr bîne, fêm bike, jê hez bike? Çima em ker û kor in? Em ji

hev hez dikin di şervantiya li serê wan çiyayên delal de… Lê dîsa jî em nikarin bi tevayî hev bibînin… Dengê xwe bigihînin hev, giyana xwe bi ronahiya xwe û hevalên xwe dilgeş bikin? Ooy oy… Tu yê dîn bibî Binevş, dîn bibî! Ma bû çend car ku tu xebera şehadeta hevalan distînî… Bû pir car. Lê her carekê, hinek tiştan kûrtir dike… Wekî ku hin 'nebesî' hene. Mesele, ku duh wî xayinî wisa nekiribûya… Ango ku me tedbîrên xwe, zêtedir bistanda… Dê niha Kemal û Piling li ba me bûna… Erê tiştê herî zor ev e… Xwezî ne wiha bûya… Hinek tişt, hinek encam, xwezayî û divêtî bûna. Lê ne wiha ye… Her bê pêşgirî gulebaranek tîne bi ser me de… Gulebaranek giyanî, gulebaranek hestiyarî û ramanî! Serê min diêşê ji van… Komek tişt hene. Serê min ji ber çi diêşê, nizanim… Lê ez şervana azadiyê me! Divê ku nesekinim, bimeşim… Na lê! Ez ê çawa bisekinim… Ez niha hinek diperpitim di gola bêkesî, naşîtî û birîndariyê de… Wekî din, tu derdê min tune… Ez ê bibezim ka heya li ku dere… Heya azadiyê, heya asîmanan! Erê, niha cihê herî bilind, asê û azad; serê van çiyayan e… Lê derdên herî mezin jî li vira ne! Min digot qey, bi hatina serê van çiyayan, dê derdê azadiyê biqede. Lê nebû… Nabe! Rojbaş ji min re… Pir rojbaş! Azadî, mirin! Ez zêdetirîn ji kîjan gotinan hez dikim? Azadî, mirin, evîn, rojhilat, ronahî, zana, çem, zarokatî… Ooy de bes! Tu yê pirtûkek amade bikî qey Binevş? Na weleh. Bila pirtûk li min biborin, ez nikarim tiştên wiha bikim… Gelo Zozan çi dike? Kî çi dizane ku niha di nava çend pirsan de ye… Çiqas min bêriya kilama Aram "Lorîn" kiriye… "şiyar nekin, li nav dergûşê raza ye… Ew nazik e, qîza dê û bava ye" "Ew nazik e !" Min berê çiqas pir digirt ser xwe ev gotin… Ez niha ne nazik im gelo… Zexm û qewî bûme… Bûme ji kevir û hesin ji pola! Na… Mixabin; ez hêj jî nazik im! Ku ez nazik nebûma, min ê ew qas nazî û xeydokiyan nekira… Xeydokî… Ax! Min çima stran ji Kemal re negot? Kîjan şeytan ketibû dil û mêjiyê min! An jî ez ketibûm serê kîjan şeytanan! Ez rabim biçim ba Zozanê. Çi bêhnek xweş tê û asîman hêşîn dike… Lê dilê min ê malxirab, di nava mij û moranê de ye… Ev bêhna xweş û asîmanê geş di dil û ramanê min de tune ne… Çivîkek zer firiya qey hêlîna wê, li van deran e… "Şiyar nekin, li nav dergûşê raza ye…" şiyar nekin… Binevş xanim, xuya ku tu dixwazî dîsa gotinê bînî ser razanê. Razanek bêdawî.

- Binevş! Tu çima rabûyî… Min got çi… Baş bû tu rabûyî! Xeberek min a xweş ji te re heye… Heval li biniya vê daristanê ne. Weleh zarokekî şivan, yekî çavşînê xweşik bû… Wî got…

Hevalan jê re gotine “ku te hevalên me dît, cihê me ji wan re bibêje… Erê erê, hêj nû çû haydê em biçin… Binevş… Gelo Sînan û Zinar jî li wira ne?

- Dibe ku li wira bin… Heqe ku em xelatek mezin amade bikin ji wan re. Em zû biçin.

- Bilez dan dû hev û xwe di şiverêyê de, bera jêrê dan… Bi heyecana gihiştinê dilgeş bûbûn… Ew daristana kûr û lal bi dengê şalûl û bilbilan, bi bêhna kulîlkan xemilîbû ji wan re… Kulîlk û bilbilên herî mezin û awazîn, di dilê wan de bûn êdî… Baskên wan ji nû ve hatibûn cihê xwe, difiriyan difiriyan!

- Nobedarê çardeh salî û çavreş bi rûyekî geş û sekneke leşkerî got :

- Merheba Heval! Hûn herdû tenê ne? Werin werin… Heval li vir rûniştine… Ev koma hevalê Kendal e… Em ji herêma din hatin… Hûn pir westandî dixuyên. Hevalê Kendal mêvanên me.

- Ohoo… Fermo fermo… Hevalê pêjgehvan… Heval birçî ne.

Zozan:

- Na heval xwarin bi me re heye… Em naxwin… Me nexwar.

- Baş e hûn ê niha bixwin… Mêvan ‘îtîrazan’ nakin… Kemal şehîd bû ne? Kemal… Wî qezenc kir! Goya ez ê di pêşiya wî de şehîd biketama, lê nehişt, ew çû… Ew çû! Wî qezenc kir… Wî çavderyayî… Biborin! Hûn hêj nû ji rê û ji tofanê hatine. Em ê paşê biaxivin. Niha nanê xwe bixwin û vehesin, paşê.

Hem bi hebûn û nêzîkatiya xwe bêhnfirehiya hevaltiyê dabû wan, hem jî bi çûyîna xwe. Piştê ku çû Binevşê got:

- Hevala Zozan, heval rast dibêje. Em pir westiyan e. Spas dikim heval… Van xwarinên li ba me jî bibin.

Nobedar xwarinên bi wan re bir aliyê din. Ew jî rûniştin, nan û penîr û çay xwarin. Asîman weke dilê dayikêkê zelal û paqij bû. Çenteyên xwe danîn ber serê xwe û kefiyên xwe bi xwe wer kirin. Wê razana êdî… Razan, bûyerek nû bû niha ji bo hebûna wan… Çawa ku xwarin û vehesîn jî bûyerek nû bû.

- Binevş, tu dizanî, wekî ku min razan jibîr kiribe.

- Wîî! Ez jî niha razanê diramiyam. Min ji xwe re digot, mirov çawa radizê çavên xwe hişk dijidand an…

Herdû bi hev re, bi dengekî keniyan weke ku ev ken jî, kena wan a ewil bû. An jî piştî tofaneke dirêj ku kenê bi wan dabû jibîrkirinê, cara yekem, bi kenê şiyar dibûn, bi kenê dihatine bîra xwe. Ken; çi bûyerek erjeng e...

Dema ku tê ser lêv û rûyan, tu dibêjî qey ku di dilê de tu kul û derdek, tu jan û hesretek nemaye! Lê na… Her kenekî di kûrahiya xwe de, di delaliya xwe de; jan û birînên bêeman vedişêre… Her ken, girînek veşartî ye li erdnîgariyên xemgîn û li rûyê mirovên bê azadî dijîn… Her ken serhildanek e an jî… Serhildaneke, emirkurt û darvekirî, dilgeşiyek vemirî ye.

Kendalê kinik ji ba wan çû cihê xwe yê ku hinek berê jê hatibû. Pirtûka xwe dîsa girt destê xwe… Lê nikaribû bixwenda. Hinek ramanan êrîşê wî kiribûn… Dema ku wiha dibû, ji xwe re digot: "Ka bisekinin ramanino! We mala serê min xirab kir!" Niha jî wisa bûbû. Destê xwe da ber rûyê xwe. Dema ku wiha dikir, hebûna xwe pirtir hîs dikir. Zarokatiya xwe jî dianî bîra xwe. Ango zarokatiya wî xwe dianî bîra wî… Û ew hevoka diya wî ya digot: "kuro lawo! Ew qas destê xwe, li ber rûyê xwe nehêle… Tu yê rûyê xwe kort bikî… Te hêj di dergûşê de jî wiha dikir. Niha jî te dev ji vê xûyê xwe berneda…" Ew an dikeniya, an jî digot: "dayê, xem neke… Destê mirov, mirov naêşîne, xirab nake…" Perperokek payîzê ya rengçilmisî û lerzok, hate xwe li ser eniya wî dianî. Hêdîka destê xwe da ber wê dianî ser destê xwe û bilind kir ji bo ku bifire di ber xwe de jî, jê re got "bifire perperîk! Tu dereng mayî… Ma di vê payîzê de tu yê çawa bifirî… Serma û zemher tê, dem ne dema firînê ye, perperoka min…!" halla halla! Îcar perperoka min… Niha ku heval bibihîzin, dê dîsa bêjin heval pir zêde romantîk e… Hestyar e… Di binê hişkîtiya xwe de zarokatî û nermahiyek vedişêre, eviya jî wî ji kesbûna serleşkerîtiyê dûr dixe. Ooy… De hinek hevalên me jî serleşkeriyê şaş fêm dikin… Weleh ku romantîzm, xeyalperestî û azadîperestî tunebûya, mirov tenê ji bo çend gotinên dijwar û dirêj ji bo çend doktrînên xemilandî tevli vê riya bêdawî nedibû. Bes e… Ez dîsa devê xwe venekim..

Ew herdû heval, çiqas çilmisîne… Kî çi dizane çi jiya ne… Tenêmayîn… Dema ku ez jî şervanekî yekmehî bûm bûyerek wiha hatibû serê min jî… Bila razên û rabin…

Em ê biaxivin. Ez ê tenê bi wan re biaxivim. Mirov dibêje qey zêde ji axaftinê jî hez nakin… Na lo! Te çi zû biryar da… Ev pêşdarazî jî!... Westiyabûn loma… Heqet, ew Sînan û Zinar jî nas dikin ne? Wan gotibû ku; ji "komê du hevalên keç dudo jî xort tune ne…" Dibe ku niha dilê wan li hemberî hev şikandî be jî. Zinar û Sînan jî, pir zû dûrketine ji cihê kemînê… Em ê bipeyivin, dê çareser bibe… Payîz e dîsa… Ez ketim payîza xwe ya çaran, li serê van çiyayan. Min berê pir ji payîzê hez dikir. Niha jî hez dikim… Rengê payîzê, rengên çilmisî bin jî, xweş in…

De ka kîjan wênekar dikare van pelên daran çêbike? Hinek zer, hinek zertir, hinek ji wan hinek kesk û zer hinek sorik… Ên herî zer, herî pêşî diweşin û ew bêhna romantîk, bêhnek pir xweş; bêhnek bênav, bêhna zarokatiyê tê… Bêhna axê û kûrahiya wê… Bêhna giyayan… Asîman payîzê jî pir zelal e… Dibe ku dizane dê di zemher û zivistanê de, bi ewrên reş û sar bê dagirkirin… Xweza xweş e… Û wan çûkan, refên van çûkan, çûkên reş, şîn, reşbelek, refên qulingan, hechecîkan… Dema ku wiha digihîjin hev, asîman tije dikin û bilez diçin, diçin winda dibin li dûrahiyan. Ez tim xemgîn dibim… Wekî ku valamayîna asîman, valamayîna dilê min e jî! Ax, dilê min vala û tik û tenê ma dîsa.

Dilê min vala asîman vala… Dilê min payîz, dinya payîz. Na, ez xwenavendî, nêzîk dibim… Xweza payîz, dinya payîz, dilê min payîz… Ez vegerim ser pirtûka xwe ya xweş… Îlya Ehrenburg, çi xweş nivîsandiye… “Firtone û Firtone… Pêla ku ji binê kûrahiyan tê…” Firtoneya wan, leheng, fedaî, însanî û ronak bû… Firtoneyek delal bû… Hin firtone wiha delal in di dîroka mirovahiyê de… Ewan, wê firtoneya xwe ya delal bialî xist… Lê ya me? Ya me hêj didome û her roj, ji nû ve dest pê dike… Her roj firtoneyek e… Firtoneya dilan. Bi rastî ev dilê min ê dîn jî, ji serê sibê de di firtoneyek de ye. Firtone û ez; Kendal… Paşnavê min payîz bû ne? Weyî! Ma min jibîr kiriye? Ku dipirsim “paşnavê min payîz bû ne ?” Navê min çi bû… Kendal… Ku mirov navê xwe nizanibe; dê çawa be? Navê evîna min, navê welatê min, navê dilê min… Navê doza min… Navê xem û xeyalên min… Navê jiyana min? Ooy! De qey îleh divê ku nav hebin! Carinan bênavî ji binavbûniyê, ji navê mezin û qirase û birqonek xweştir û baştir e… Bênavî, navê mezintirîn e û xweş e carinan… Lê divêtiya mirovan bi navan heye, hebûye tim. Çima? Lewre mirov guneh e! Halla halla! Çawa guneh e Kendal? Na na ne guneh e lê tim divêtiya xwe, bi stareyek, heye. Nav jî wiha ye, hin valahiyan dadigire… Ma divêtiya te bi xwe jî bi navan heye Kendal Payîz… Erê heye. Lê carinan jî tune ye… Mesela îro tune. Îro navê min Bênav e… Dem xweş be hevalê Bênav! Tu çi digerî li bênaviyan… De tu îro bûyî fîlozof li serê min Kendal! Ma tu fîlozof î Bênav! Na na… Min pirtûk nexwend… Gerçî hindik maye. Lê ku ez îro-sibê neqedînim, dê bimîne êdî… Kar û barên zivistanê dest pê bikin nabe êdî. Firtone…

- Merheba hevalê Kendal!

- Merheba! xêr e Remzî? Ev çi hal e, helkehelk bi te ketiye?

Rûyê wî sor bûbû, xwêdan jî dabû.

Herdû biriyên xwe yên stûr û reş kiribû yek… Simbêlên wî yên gur ku lêvên wî nixavtibûn, bi her gotinekî wî re diçûn û dihatin.

- Hevalê Kendal! Min berê jî ji te re gotibû; min ji Ehmed xilas bike… Nabe heval! Bela xwe li min dide… Carê carekê tiştekî din dibêje… Ku rojek qezayek ji destê min derket.

- Bes e bes heval! Ma hûn ne şoreşger in… Dema ku em diçin gundan, hûn nîn in; tu nîn î ku qala azadî û serxwebûnê, qala xweşiktiyê dikî… Ev çi hal e! Ma qey hûn nikarin du gotinan jî bi hev re biaxivin?

Hevalê Kendal! Tu hatî vir ne? Min dizanibû ku niha hatiye xwe gihandiye…

- Hevalê Umer… Tu jî sakîn bipeyive, em ne ker in! Deng tê me. Mala min ê goya hûn herdû jî şoreşger in… Ka were tu jî, rûnê… Em bi hev re biaxivin… Hêna gotin hene, neqediyane li dinyayê… Ku hûn niha rûnên, bi mirovtî û hevaltî bipeyivin, hûn ê di çend deqeyan de çareser bikin… Lê li cihê wê gundîtî û nizanim kuçukburjuvatiyê dikin…

-Hevalê Kendal! Sûc ê wî ye… Me ji xwe re qala pratîka Botanê dikir, ew nesekinî. Gotina min di devê min de hişt.

- Na heval. Ma ew jî nizane bi zimanek asayî -normal- qala tiştan bike. Hema xwe dixeyidîne.

- Ê; wekî din? Şerm e hevalno! Ez ne dozger, ne jî dadgêr! Û naxwazim bibim dadgeh jî! De zû di nava hev de bipeyivin û meseleya xwe çareser bikin… Ji bo du-sê gotinan, mirov xwe wiha nake.

- Hevalê Kendal! Em dizanin ku tu dozger û dadgêr nin î… Lê tu serleşker î… Ev nêzîkatiya te jî nerast e… Tu me ji ser serê xwe dûr dixî.

- Hevalê min, ma serleşker bim nayê wê wateyê ku hûn ê her tiştî bi min bidin çareserkirin! Û hûn ne li ser serê min in ku îcar ez we ji ser serê xwe dûr bixim. Hooy… Hûn mirov, ji kenan jî dikujin. Ha hûn jî keniyan…

Çav li serê wan sor bûbû te digot qey qiyamet rabûye.

- Heval, rast e me mezin kir. Lê sûc ê Omer e!... Ku hinek li ser bisekine baş dibe.

- Heval ku tu jî li ser xwe bisekinî baş dibe. Di nava pênc deqeyan de mirov aciz dikî tu jî.

Lê xuyabû ku, Omer jî, Remzî jî westiyan… Nexweşiya kurdên berê bû jixwe… Car caran li hev sor dibûn, çend deqe paşê jî hêrsa wan vedimirî… Ango ew nexweşî giran bû, lê temenê wê kurt bû… Carinan wiha dikirin, lê di şer de dor nedidane hev jî kesên din jî…

- Ê… Ango, mesele bê dadgeh çareser bû. An na em bibin cihên bi-

lind. Em vê meselê, vê dozê bibin Dadgeha Ewlekariya Dewletê!

- Na na heval min navê. Jixwe hevalê Omer jî navê ne wisa?

- Erê. De ka were em biçin ba nobedar. Tu nayê hevalê Kendal! Me te mijûl jî kir…

Wekî bayekî hatin û bi bayekî çûn. Omerê çardehsalî, xortê boz û kinik. Remzî jî da pey û di nava daran da derbas bûn çûn.

- Hey oxira xêrê be ji we re! Dema ku hatin çi çavsor bûbûn.

Baş bû ku min dadgeh-madgeh venekir. Dixwazin ku zarokatiyê bijîn gelo? Her yek ji me, vê daxwazê bi helwestên cur be cur nade xuyakirin jixwe? Ew zarokatiya xwe wiha didin xuyakirin, ez bi tewreyek din. Yên din bi tewrekî din. Dema ku em diçin gundan jî, Omer ji gundan, ango ji zarokan naqete. Gerçî axaftinên xweş jî dike. Li ser şoreşgeriyê… Mirov çi hebûnek ecêb e? Hela jî li çiyayên Kurdistanê, pirtir ecêb e. Wek deryayekê ye… Wek xîçikek qûmê ye… Wek awazek bê aqord e. Lê berxwedêrên şîrîn e, afirandkar e.

Gerçî ne tenê li ba me. Li her derê jî mirov, wiha ne. Ango hem dojeh in, hem buhişt… Hem bihar in hem zivistan. Çawa bêjim… Hoop hop Kendal! Tu yê bifetisî di nava vê gola ramanê de dema ku mirov li cîhana din… Ango di jiyana 'sivîl' de dijî, mirov vê gotinê pir dibihîse 'hoop hop!' Tê wateya 'bisekine!' Niha jî em gelek caran dibêjin bisekine… Lê em cuda dibêjin êdî. De tu jî bisekine Kendal… Dibe ku niha ew herdû heval hişyar bûbin… Ez biçim binêrim… Erê erê… Jixwe re rûniştine. Dem xweş be hevalno! Hûn rabûn?

- Erê heval dem xweş be!

- Min ê tiştek ji we bipirsiya, hûn Sînan û Zinar nas dikin ne wisa?

- Erê heval! Jixwe bi saya wan, kom ji hev belav bû.

- Çawa wan ji me re gotin ku "em winda bûne…" Li ba me ne jixwe. Gotin em ji hevalan qut bûne. Ez bangî wan bikim bila werin, baştir dibe…

Hevalê nobedar, hevalê Rêzan, bila hevalê Sînan û Zinar werin vir. Çima qey hûn ji wan pir aciz bûne. Ku hûn sakîn nêz bibin çêtir e hevalno… Wê gavê dê baştir xetayên xwe fêm bikin. Wayê tên.

- Ohoo… Hevala Zozan, hevala Binevş! Ev çi mucîze ye! Me hêviya xwe ji we biriya… Ma hûn bi ku ve çûn?

- Bi xwedêkî hevalê Zinar, wiha fenektiyan nekî! Hûn, tu çi zû hêviya xwe ji mirovan, ji hevalên xwe dibirî. Wisa hêsan e qey? Ya din jî… Divê ku em ji te -ji we- bipirsin; hûn bi ku ve çûn? We xwe ji ber kozikan û menzîla gulebaranê xilas kir. Me digot qey, hûn ê şer bikin, ji bo ku heval

jî xilas bibin… Lê hûn çawa dibeziyan! Şerm bû hevalno, pir şerm bû.

- Weey… Hûn wiha diramin? Na heval, em nebeziyan, em li benda we man li serê wî girî. Hûn… Binevş:

- Hevalê Zinar, tu nepeyivî baştir e… Te du-sê carên din jî wiha kiribû… Ango tu baş dikarî û dizanî bibezî… Te pîroz dikim…

- Ez naxwazim zêde bipeyivim… Lê naxwazim li hin gotinên bêwate jî guhdarî bikim… Tu hinek biramî baş dibe. Tu jî hevalê Sînan…

- Hevalê Kendal, wiha nabe!

Hevalên keçik, kêmasiyên xwe nabînin! Ma ku fersend hebe, mirov vedikişe ji cihê şer, em jî vekişiyan…

Kendal:

- Hevalê min, mirov vedikişe, lê mirov hevalên xwe jî dirame û heya ku hevalên mirov venekişin mirov nabeze, nareve, ji cihê şer, dûr nakeve. Nabe heval… Hevalê Zinar hûn ji xwe re hinek biramin baştir e.

- Heval bê lêpirsîn û lêkolîn biryar nedin…

- Lêpirsîn û lêkolîn çi ye heval? Em “raporên balîstîkê” bixwazin. Bûyer jî li holê ye rewş jî… Jixwe hûn her çar jî êdî di koma me de dimînin. Loma jî hûn bi fêmîn û hevaltî nêzîkê hev bibin, hev qanih bikin baştir dibe.

Zozan:

- Jixwe min berê pêşniyara xwe nivîsî bû ji bo herêma Botanê.

- Hevala Zozan, ku bersiv hat em ê ji te re bêjin. Lê niha hûn li ba me dimînin…

- Min ê tiştek bipirsiya… Hûn bi piranî ji Zinar aciz bûne, çima qet behsa hevalê Sînan nakin? Ma ew jî ne pê re bû?

Binevş:

- Em behsa wî nakin, lewre ew… Çawa bêjim? Bi piranî bê vîn tevdigere… Ango kî bi ku ve biçe, ew jî dide pey wan… Loma jî mirov jê aciz nabe…

- Wa! Ango pratîka ev hevalî tim wiha ye… Xwe naguherîne?

- Xweguhertin hêsan e qey heval? Ku karakter û kesayetî teşe girtibe, an jî negirtibe kî dikare çi bike?

Zozan:

- Tu çima wiha şaş bûyî hevalê Kendal! Te qet bûyer, kesbûn û hevalên wiha nedîtine?

- Min dîtine heval, ne ku min nedîtine… Lê dîsa jî, mirov zû bi zû napejirîne… Ango ez naxwazim, bipejirînim û asayî bibînim… Jixwe ji ber vê nêzîkatiya min heval pir gazin û rexneyan jî dikin…

Dibêjin “tu ji rastiya gel dûr î… Xeyalperestî naxwazî rastiyan bibînî…” Wayê we jî got hêj nû me hev nas kir… Lê we jî gazin kir.

- Na heval, ev ne gazin in… Ez hevala Zozan nizanim, lê ji bo xwe bêjim ku: Ez gazinan nakim. Tenê bala min kişand, loma min pirsî… Jixwe me hêj nû hev nas kir. Çi mafê min heye ku dest bi gazinan bikim.

- Ohooh! Îcar ez ê ji xwe gazinan bikim û ji we jî… Em ê hêj hev nas bikin, kêmasî û başiyên hev bibînin. Xem nîn e.

- Ez jî tevli hevala Binevş dibim. Wekî din jî tevli ku em nû hev dibînin jî, dîsa me gelek tişt peyivî, hinek hev nas kir… Ev jî baş e.

Binevşê di dilê xwe de got: “Dîsa Zozana me dest bi mezinatiya xwe kir… Di hin deman de bi nêzîkatiyên xwe dayikan, an jî xaltîk û metikan dianî bîra wê… Bi çend gotinan dikete navê, dixwest ku tu astengî û kelemek nehêle li dijî hevaltiyê… Navbera wan xweş û nerm bibe.

Bêdengiyekî biçûk dest pê kir. Bêdengiyek ku gelek tiştan, gelek pirs û bersivan di xwe de dihewand… Kendal jî wekî wan li bêdengiyê guhdarî dikir, serê xwe dabû ber xwe, destê xwe di ser giyayên hişk de digerand. Hersê jî diramiyan… Zozanê li Binevşê nihêrî… Û rewşa wê ya şeva din û çend demjimêr berê hate bîra wê… Na Binevş zêde baş û geş nebûbû hêj… Lê ji ew gavên dojehê jî baştir bû. Lewre ew gav, di nava ax û cîhana xwe de bê ax û “terkîdinya” mabûn… Lê niha, hêdî hêdî vedijiyan… Ma jixwe jiyana wan, tim wisa nediherikî? Dimirin, dimirin… Piştre dîsa bi gotin û hevaltiyên ronahî, bi rê û rêwitiyên dilgerm vedijiyan ji nû ve… An na dê qet û qet nikaribûna bimeşiyana.

Kendal jî diramiya. Min çi zû behsa xwe kir ji hevalan re… Behsa gazin û mazinan… Gelo, divêtiya min bi xwevegotinê hebû? An, van hevalan hin tiştên xweş û jidil anîn bîra min di demeke wiha kurt de? Birastî jî min zû dilê xwe vekir ji wan hevalan re. Qey min bêriya hevalên keçik kiribû? Na loo! Ma hêj hefteya din, em ji hev qetiyan, mesele ne ew e… Mesele çi ye Kendal? Mîratê! Ez carinan çiqas pirsên saf û nizanim çawa dikim… Wekî ku min pirsî “ma qey xwe naguherîne ?” Tu dibêje qey kirasê hecê ye ku derxe û xwe biguherîne… Û tu dibêje qey, te xwe pir guhertiye… Ez ê hinek pirsên li ser Kemal ji wan bikim… Gelo pir zû ye? Na loo! Ma hevalê min ê şîrîn û ezîz bû Kemal! Xuyaye ku ew jî, jê hez dikin. Ma kê dikaribû ji Kemal hez nekira… Encax ên dexes jê hez nekirana. Kemal, te qezenc kir hevalê min! Tu beriya min firiyayî çûyî… Ez zêde neramim baştir e. An na dê… Lê ez ê hêsirên çavên xwe yên ji bo te veşêrim hevalê min…

Dibe ku demsalek rûheyv û gulgulî were… Ez ê wê demê hêsirên xwe bikim baran ji te re. Gerçî min dixwest ku te wê baranê bibaranda ji bo min! Lê nebû… Gelo, dê kes, baranek wiha ji bo min bibarîne? Gelo ez dê peymana min û te bi hinekên din re… Bi hevalên din re nûber bikim? Ma dibe? Hevaltiya min û te, ya min û te bû! Bi peyman û çeprastên xwe, bi xem û xeyalên xwe… Ez dîsa bi xwe re mam û min xwe ji xwe revand! Dema ku ez xwe ji xwe direvînim, xwe ji peywirên leşkerîtiyê jî direvînim. Ev jî ne baş e! Gerçî min heya niha peywirên xwe li erdê nehiştiye, lê dîsa jî… Heval aciz bûn ji bêdengiyê. Niha dibêjin: ka ez çi mitalan dikim… Gelo ez rabim, bêdeng û bêxatir, ji ba wan biçim? Min ê çi ji wan bipirsiya?

- Hevalno, pirtûk bi we re hene qet, an jî fermanname û hwd.

- Erê heval, jixwe me yê bida we… Ev her sê bi min re bûn… Yek jê fermanname ye

- Evana jî bi min re bûn heval. Hinek belavokên havînê û Newrozê jî di nav de hene.

- Baş e baş. Gelek in. Divêtiya me bi van hebû… Min ê çi bigota? Nivîsên hevalê Kemal bi we re tune ne? Wêneyên wî?

Zozan:

- Wêneyên me yên bi hev re gelek in… Lê ew li cihekî din in... Bi me re nîn in. Nivîsên wî jî hebûn… Jixwe rojnivîska wî hebû. Carinan dinivîsand, di demên awarte de. Gerçî ku bibûya dê her roj binivîsanda… Ji nivîsê hez dikir wekî ku ji xwendinê jî hez dikir û digot: “Ku em nenivîsin van bûyeran, vê jiyanê bi pênûsan neynin ziman, dê hemû li ber bayê biçin û werin jibîrkirin…” û gotinek kevin digot: “gotin, peyv difire, nivîs dimîne…” Bawer bû ku peyv difiriyan, an jî li ber bayê deman diçûn, lê nivîs diman…

- Ku em bi wan aliyan ve biçin, hûn ê karibin bînin, ne wisa?

- Erê heval. Em ê îşev biçin gund?

- Na, lê ku divêtiyên we yên taybetî hebin?

- Na heval ji xwe min pirsî. Dibe êvar loma

- Na hevala Zozan, hêj zû ye… Demjimêr sisê ye… Hevalê Kendal, koma we ango ev koma me tim bi vê hejmarê ye?

- Na em carinan bi komên din re dibin yek. Du-sê meh paşê, dê dîsa wisa bibe. Lê niha em ew qas in… Ji bo ku payîz e jî, em ê dîsa dest bi amadekariyan bikin.

Di dilê xwe de got: Ax Kendal! Te dîsa gotinê anî ser payîzê!

Cihê xebata me jî pir berfireh e… Em dikarin heya sînorên Çewlikê, Dêrsimê, Bedlîsê û Sêrtê jî biçin… Hûn tim li vê eyaletê bûn?

- Herdûyan bi hev re:

- Erê, na !

Binevş:

- Erê ez tim li vê eyaletê bûm, li gelek cihên wê geriyam.

- Na heval. Ez tu dizanî jixwe Başûrî me… Li Behdînanê û Botanê jî mam… Piştre hatim vê derê… Tu tim li vê dera bûyî?

- Erê ez jî dixwazim Başûr û Rojhilat bibînim. Lê hêj nebûye qismet!

- Wisa nebêje heval! Te hevalê Kemal anî bîra min… Wî jî tim digot; “hêj nebûye qismet!” Û ew ê êdî nebîne.

- Hevala Binevş, tu dîsa hestiyar nêzîk bûyî… Ango hinek caran… Em hevalên hev in, helbet dê gotinên me bişibin hev, wekhev bin… Jixwe xeyal û hesretên me jî yek in.

- Na na hevala Zozan! Bila bêje… Ez we fêm dikim… Ango dibêjim qey, fêm dikim. Belê hevala Binevş, ku tu naxwazî, ez zû bi zû wî neynim bîra we. Lê pir tê bîra min.

- Birastî? Na… Behsa wî bike… Ez dixwazim ku were bîra min û jixwe tê bîra min. Mirov carinan çiqas dikeve nava hestên bi nakok.

- Asayî ye heval. mirov, mirov e lewra. Û dinya, rastî û belayên wê jî bi nakok in… Loma jî mirov carinan dikeve nava hest û ramanên bi nakok.

- Mirov carinan, dikeve nava nakokiya girîn û kenê jî hevalno. Binêrin, çavên min tije bûne…

- Hevalê Kendal! Hevala me mînakek pir erjeng e. Carinan hem digirî, hem dikene… Pir xweş pêk tîne… Lê ez nikarim.

- Na heval! Tu jî ne bi hev re lê cuda cuda pir baş pêk tînî, sarî û germî ye. Na, spas, Ez cixarê nakşînim…

- Ez jî nakşînim, spas!

- Hevalên keçik berê her tiştî dest bi cixareyê dikin carinan. We çawa dest pê nekiriye?

- Carinan mirov dest pê nake heval! Te jî gotinek pir klasîk… Gerçî klasîk jî nîn e… Ez pir ji gotina hevalên keçik aciz dibim heval… Bi vî awayî, hûn hevalên xort, heman zimanî dişixulînin.

- Bibore heval… Tu nêrînek min a cuda tune li hember we… Hurmeta min jî pir e. Lê di mijara cixarê de wiha ye. Ango mînakên ku min dîtine, wiha ne. Ez careke din wiha nabêjim… Lê divê ku te jî negota: “hûn hevalên xort”

- Ez jî tevli wê dibim hevalê Kendal. Ma ku te negota “yên keçik” wê jî nedigot: “yên xort”

- Ez çi bikim gelo, hewar-hewar bikim, ji bo ku hevalên min ên xort (!) werin alîkariya min! Jixwe yê we kes tune, hûn herdû tenê ne.

Zozan:

- Hevalê Kendal! Te çima wê sohbeta me ya xweş xirab kir? Tu xweş dikarî “hekemtiyê” bikî hevala Zozan! Piştî ku Kurdistan rizgar bû, em ê te bikin hekem!

Her sê bi hev re keniyan… Gerçî destpêkê kena Kendal nedihat, lê ji ber kena Binevşê, û ya Zozanê ew jî keniya… Ku destûra we hebe, ez axaftina xwe bidomînim? Rast e hevalno, min jî nedît ku çawa sohbeta me tevîhev bû? Ango rewşek bi nakok, min jî jiya. Hinek berê ez çi diramiyam, hûn dizanin? Min ji xwe re digot; ku hevalên xort, hin hevalên me, min bibînin dê bibêjin: “Xêr e, Kendal çi zû kete dilgermiyeke wiha? Çi zû samîmî bû, bi hevalên keçik re?”

- Biborin! Ango ez ji vê çawa bêjim, ji vê îhtîmalê, talûkê an jî nêzîkatiyê ditirsiyam, lê dîsa jî min domand, sohbeta bi we re xweş bû. Em hevalên hev in. Lê carinan hin tiştên nexweş jî têne bîra mirov.

- Hevalê Kendal. Ez tiştekî bêjim? Teqez, tiştên wiha pir hatine serê te… Ango, te gotinên wiha pir bihîstiye… Loma vê tirsê dikeve dilê te, an jî tê bîra te… Jixwe em jî, ez jî hinek şaş bûm ji hinek nêzîkatiyên te… Te hêj zêde xwe nexistiye nava qalib û têşeyên hişk û çors. Tu ji têşeyê fermî yan jî çawa bêjim serleşkerî dûr î! Lê şaş fêm neke, ez rexne nakim ha… Tenê nêrînek e.

- Rast e… Ji qewlê tirkan ve “Devê min ji şîr pir şewitiye”. Loma jî êşa wê dikişînim.

- Carinan mast jî devê mirov dişewitîne hevalê Kendal.

- Rastî?... Weleh nizanim, lê ez jî pir dixwazim, ku bibim serleşkerek, zexm, hişk… Heval jî vêya dixwazin bi piranî. Lê mînakên wisa yên xweş tune ne. Mînaka herî bi nav û deng hevalê Zekî ye. (Şemdîn sakik) lê çawa bêjim nizanim… Ez nêzîkî xwe nabînim. Mesela naxwazim bibim serleşkerekî wisa. Mînaka herî rast û delal, a herî bêdawî û romantîk hevalê Egîd e. Ew jî wekî stêrkekî ye! Ka mirov çawa bigihîjê? Çiqas şîrîn e ne wisa? Ez dikarim bêjim ku tiştê herî bandor li ser min kir; wêneyê wî bû. Piştre ez hînî gotinên wî bûm. Hin tişt hene mirov nikare bîne ziman. Lê pir li zora mirov diçin… Dema ku ez nû tevli şoreşê bûm. Yê ku hat pêşiya me, me bir çiyê, navê wî Egîd bû… Ez pir

dilgeş bûm. Min digot qey ew jî weke Egîdê ku delal û romantîk jiyaye dijî… Ango hevalê wî ye, li ser şopa wî ye… Piştre ew ê ku navê xwe kiribû "Egîd" reviya… Bû xayinekî pir qirêj avêt ser gundan. Ez pir bandor bûm û ez ew roj, bi dizî hinekî giriyam jî. Dibe ku girîna min, girîna xortekî ya ewil bû jî. Ez pir axivîm…

- Na heval ew çi ye?

- Em wiha ne, hevalno! Dipeyivin, hindikekî deriyê dilê xwe vedikin, dibêjin, piştre jî poşmam dibin… Em şermok in, an jî ji dilê xwe, ji ramanê xwe ditirsin gelo? Ez vê hestê pirî caran hîs dikim.

- Hevalê Kendal! Hevalek ji gund hatiye dixwaze te bibîne… Bila were. Wî bînin vê dere.

- Erê heval… Ne wisa hevalno, karekî we yê cuda tune…?

- Na heval.

Bayekî hênik dihat, bayê payîzê yê bêhnxweş. Bêhna havînên zêrzerî, bêhna biharên li dûr dianî… Bêhna bîranînên dilgeş, xeyal û rastiyên gulgeş… Û ew çend kes, ew komek mirov dixebitîn, diaxivîn, difikirin li nav serê wan çiyayan… Da ku desthilatdarên zalim bisekinin, da ku çarenûsa reş û tarî biguhere… Da ku rojên xweş bibin para wan jî. Mêvanê wan ê ji gund hat, merheba dane hev û rûniştin li cihê xwe yê li binê daran. Mêvan kî bû? Di çarenûsa wî ya ku zalim û serdestên demê nivîsandibûn de çi hebû? Ango di çîroka wî de çi hebû. Wî mêvanê riyên dûr çawa jiyabû. Û dê çi bihatana serê wî. Ango dê çend bela û bêbextî bihatana serê wî? Gelo pêşeroja wî çawa bû? Ma mirov dikare qala pêşeroja mirovan bike? Û pêşeroj, tu car xwe bi mirov dide zanîn? Ka em binêrin, çi bû, çawa bû pêşeroja wî… Ango çîroka wî çawa bû… Çîroka Mûradê koçber…

***

Asmîn, di xewa xwe de weke çivîkekê perpitî û got:

- Dayê, em biçin nava baxçe… Dayê, em biçin ba berxikan. Piştre, keserek kişand û dîsa kete xewa giran… Her kesî bihîst… Lê tu kesî nikaribû xwe ji cihê xwe bilebitanda. Hemû li kêleka hev, li ser betaniyeke kevn û qirêj, xwe dirêj kiribûn, bêhal û bê raman, bê xeyal û bêarmanc bûn… Bê hêvî bûn, lewre bêwelat bûn! Bêwelat bûn, lewre bêhêvî bûn… Rojhilatî bûn, li ser axa dewlemend hatibûn dinê. Lê rehê xwe bernedabûn binê axê. Ango mirovahiya xwe xurt nekiribûn û bi axa xwe re nebûbûn yek. Bê kok bûn. Loma jî axa wan, ji wan xeyidîbû. Loma jî ax û ava wan, êdî ew nediparastin û bagera ku hatibû; bagera ku di sedsala bîstûyekê de rabûbû, berî her kesî li wan xistibû, wan avêtibû… Dabû pêşiya xwe û avêtibû nava gemiyekê

-keştiyekê- demê ya weke demê bêîman! Lewre bêkok bûn, loma jî bayekî li wan xistibû û wan avêtibû. Li ser betaniyeke qirêj û qetiyayî, weke lodek giyayan, an jî êzingan, li ber hev ketibûn… Ne êzing, ne jî giya bûn… Lê, bêkok, bêhêvî û bêwelat bûn… Rûreşî û birîna demê bûn. Rûyê demê yê zexel û zordar, xwe di nêçîriya wan de dida xuyakirin… Ew, dojeha demê bûn. Dem, çiqas ji wan bireviya jî, nikaribû ji wan xelas bibûya. Dem, dojeha wan bû; ew çiqas bireviyana jî, nikaribûn jê xelas bibûna. Birîn bûn û birîndar dikirin. Birîndarî û rûreşî bûn. Birîn û rûreşiya demê bûn…

Bi bêmecalî, li Asmînê mêze kir dîsa… Lê tu kesî nikaribû xwe ji cihê xwe bileqanda ji wî cihê ku, ji axurê xerabtir û qirêjtir bû. Di qata binî ya keştiyê de bû ew cih… Serê Asmînê li ser milê Nêrgizê bû. Dîtin ku Nêrgiz, lêvên xwe dileqîne... Gotin qey, Asmînê aş dike, pê re diaxive… Bêhna wan derket. Gerçî êdî nikaribûn ji bêçaretiya zarokek re bibûna derman. Lê dîsa jî kevneşopiyeke banekî bû; diviya ku zarok bihatana aşkirinê…Loma jî, dema ku deng ji Nêrgizê hat, bêhna diya Asmînê jî, û yên din jî derket. Gotin qey, Nêrgiz şiyar e û tiştên xweş jê re dibêje…

Nîhadê çavreş, 'hevalê hevalan' xortê Deşta Mûşê û navçeyên wî, bejinziravê dotmama xwe Nêrgizê jî, got qey Nêrgiz şiyar e û tiştên xweş dibêje. Bi heyecan, li wan meze kir. Bala xwe da ser Nêrgizê, di nava wan nalenal û xirexiran de… Lê, bi gotinên ku ji nava kûrahiya xewna Nêrgiza wî dihatin , veciniqî, şerm kir. Lewre Nêrgizê, dotmama wî ya porzer, çavkesk û rind, bi xemgîniyeke kûr, digot:

- Pismam!… Nîhad… Ev çibû hate serê me dê ev keştî evîna me bixwe. Li Deşta Mûşê bihar hebû, evîn hebû, pismamî û dotmamiyek şirîn hebû. Lê li vir, evîn tune! Vê keştiyê evîna me xwar pismam!

Nîhad, lerizî, tirsiya, şerm kir. Destê xwe da eniya xwe ya qirêj, bi xwêdan û por û rihê xwe yê ku, bi hev ve zeliqîne… Piştre destê wî çûn ser simbêlên wî yên qeytanî û navdar, ku sala berê berdabû… Dilê wî ji, hewaya qirêj û simbêlên wî li hev ket… Ramiya: Ez ê van simbêlan kur bikim! Van simbêlên bêxêr, sembola mêraniyê û nav û dengê min! Ez ê ji binî ve kur bikim. Bila tunebin! Simbêl û mêranî, ji min re ne lazim in êdî… Weleh ez ê van mîratan kur bikim! Kî dixwaze bila bêje: “şerm e, tu mêrî!” Xema min e! Piştê ku ez, mêraniya min, gund û erdê min, şerefa min, ango Nîhadê heval û Nîhadê hevalan, binpê bû çi fêdeya simbêlan heye. Ku Nêrgiz jî bipirse ez ê bêjim: “Ez simbêlan naxwazim! Mêranî jî, simbêl jî mirin!”

Wey gidî! Ev çar roj in ku em, di rê de ne… Lê tu dibêjî qey, çar sal in ku em di vê dojehê de ne. Mala me xerab kir! Hiş û aqil, xîret û hurmet nema! Çar roj, çawa dikare wiha xwîna mirov bimije? Dîsa dengê xwe derxist. Xwedê bike ku êdî wan gotinan nebêje.

Navê min jî li ser zimanê wê ye ha! Goya ji min xeyidîbû. Ji duh de bi min re nediaxivî. Lê di xewna vê dojehê de jî, min dibîne… Navê min dibêje. Ev rewş çi ye? Em evîndarên hev in loma? Ma çend sal in ku pismam û dotmam ji hev hez dikin? Evîn xweş e! Lê nexweş e jî weke bar e niha. Barekî birîndar û xedar… Barekî tehl û bi şewat! Hem li xweşa min diçe ku Nêrgiz, navê min dibêje, hem jî li zora min diçe. Ez dixwazim ku tune bûya. Ger ku bibûya min ê bi jêbirekî evînê jî, ji ser dil û jiyana xwe û ya Nêrgizê jî… Weleh a her kesî jî bibira. Lê nabe! Mala evînê jî, mêraniyê jî, mala xeyalan jî xera bû! Ez pişta xwe bidim Nêrgizê, çêtir e. An na gava ku rabe dê fêm bike ku ez wê diramim û lê dinêrim. Ew Mûrad nîn e, li wî quncikî, di binê kefiyê de razaye. Belkî jî ranezaye û li min dinêre, an jî dibêje: “hiş û aqilê wî, dîsa çû ser Nêrgizê!” Goya em îro, li ser evîn û azadiyê peyivîn. Çi got, min pejirand û got; “rast e!” Ez çi bikim. Weleh rast dibêje. Lê Nêrgiz jî dotmama min e . Gundê min, Zarokatiya min tîne bîra min. Ez pir jê hez dikim. Nizanim çima, lê ji bîra min naçe. Ev kî bû wiha axîn kişand?

- Dayê, tu hişyar bûyî?

Dayika wî, destên xwe da ser milên wî. Bi çavên sor û werimandî, bi rûyê spî û qermiçandî û laçika xwe ya ku demekî spî bû, weke berfa

çiyan, li nava çavên wî mêze kir. Lawo, ma qey ez razabûm? Qey xew maye… Min çavên xwe dabûn ser hev, lê ez şiyar bûm. (Hate bîra wî ku diya wî, li malê, di rojên xweş de jî eynî wiha digot. Kena wî hat lê, xwe girt, nekeniya.) Lawo, te dît, Nêrgiza min çi got? Em çawa ji vê mîratê peya bibin, ez ê we bizewicînim. Min dixwest ku Xwedê dawet û govenda we, li welat bikira qismet, li gundê me… Lê nebû! Ez ê zû we bizewicînim. Lawo, dotmama te guneh e. Gerçî ez, ji hinek gotinên wê hêrs bûm, ma aw çibû weke kundan digot: "evîn qediya!" Lê dilê min pê dişewite. Wê rojê…

Lê gotina wê, di nîvî de ma. Nîhad, dengê kuxîna Mûrad bihîst û berê xwe zivirand bi aliyê din ve.

Çawa ku çavên wî çûn ser Mûrad, dîsa weke her carê, ramanên xweş û kêmasiyên wî, ketine bîra wî. Û dîsa weke her carê, diya wî bi hîsên xwe yên dayiktî, hîs kir ku, dîsa kurê wê ji wê, ji xeyalên wê dûr dikeve. Herdû biriyên xwe xiste yek, serê xwe hejand û got:

- Ooy xwedê! Ev Mûrad çi bela bû! Wayê dîsa çavên xwe da ser te! Tuyê dîsa dîn û har bibî û xwe ji me dûr bixî. De nizanim ev çibû! Hema dibêji: "Welat, yekitî !" Û nizanim çi? Wayê ber bi vir ve tê…

Mûrad, parkê xwe, avêt ser milê xwe. Ne ji ber sermayê, ji bo ku li erdê nemîne. Bi çavên xwe yên sorbûyî, rûyê xwe yê bêtiraş û westiyayî, ber bi wan ve hat û gava ku gihişte wan, dîsa çavên wî çirisîn:

- Hevalê Nîhad, tu çawayî? Dayê, dema te xweş be! Rewşa te çawa ye? Ew dermanê ku min da te, baş hat an na?

Dayê zûde hêrsa xwe ya li hemberî Mûrad bialî xistibû! Dikeniya êdî:

- Xwedê te bihêle lawo! Tu çiqas lawekî baş î, qenciya mirov dixwazî weleh serê min baş bû Mûradê min.

Nîhad dîsa ji durûtiya diya xwe aciz bû û fedî kir. Ji bo ku fediya xwe, zû bialî bixe, li rûyê Mûrad meze kir û got:

- Tu çawayî hevalê Mûrad?

Mûrad bi rûkenî:

- Çawa bêjim, nizanim. Lê ez nebaş im. Lê belê ji bo başbûniyê dixebitim… Ev rêwîtiya dojehî jî biqediya êdî. Ev sêroj-çarroj me kuşt! Temenên me, evîn û bîranînên me kuşt, bir û çû.

- Tu jî wiha diramî? Bi rastî jî vê sê roj in, her tiştî talan kir… Ka li van rûyan mêze bike… Hemû rû; reş, bêwate, bê bîranînin… Her kes, çiqas dişibe hev û dişibe mirinê.

- Nêrgiza min tu şiyar bûyî. De ka Asmînê bide diya wê û were vir.

Vayê pismamê te jî li vir ye. Nîhad, binêre, Nêrgiz hişyar bûye.

Dilê Nîhad, zûde rabûbû halanê û jê re digot: "De ka binêre… Nêrgiz, piştî wê xewnê çi dike, çawa li te dinihêre?" Lê dengê dilê xwe dibirî û berxwedan dikir… Dizanibû ku ew gav, ji bo wî jî, ji bo Nêrgiz û Mûrad jî azmûnek e. Lê dizanibû ku Mûrad, niha bi wê qiyameta di dilê wî de jî dizane. Dilê wî dîsa jê re got: "Gelo Nêrgiz, niha xemgîn e ?" Lê ji diya xwe re got:

- Dayê, bû çend car ku dibêjî "de ka rabe, de ka binêre!" Rabû bila rabe, ez çi bikim!

Ez û heval dipeyivin ji xwe re.

- Mûrad, lawê min, de ka şîretan li vî dînî bike. Xwezî weke te biaqil bûya.

Nîhad, diramiya, bi hêrs û kenekî sar di dilê xwe de digot: "Eleman ji destê diya min! Niha di dilê xwe da jî nifiran lê dike…"

- Dayê, tu wiha dibêjî, lê Nîhad, lawekî, hevalekî zana ye gotinên ku ez jê re bêjim, ew qas ne girîng in.

Nîhad, bi wan gotinan dilgeş bû û di dilê xwe de got: "Çi xweş bû ji te re dayê! Tu dibêjî qey, durûtiya te nizane? Lê haya vî hevalê min, ji her tiştî heye.

- Hevalê Nîhad, axaftina me di nîvî de mabû… Me gotibû, piştî ku em ji vê mîratê peya bibin, em ê çi bikin?

Lê gotina wî, di nîvî de ma… Bi qîrîna Qasim ku sibehê bizorê hatibû birînê veciniqîn û li aliyê rastê, li jêra hundir mêze kirin.

Qasimê pêşmerge… Pêşmergeyê Hewlêr û Amediyê, mamosteyê hejmarnasîyê -matematik- … Di çend mehan de çûbû, yekî dîn, bêarmanc û bêxebat hatibû cihê wî… Diqîriya, digiriya heya ku dengê wî bihata birînê… Niha jî wisa diqîriya ku perda guhan diqetand. Mûrad û Nîhad, di nava wê geremolê de bi zorê ji xwe re rê vekirin û çûn balê. Lê gava ku gihîştin balê, Nîhad şaş ma û pirsî:

- Ev çi hal e Mûrad? Tu dibêjî qey daweta bavê wî ye! Çawa wiha dikene? Min nizanibû.

- Min hêj ji dûr ve fêm kiribû ku goya wiha dikene… Lê nakene! Di vê dinyayê de yê ku qet kena wî nayê jî ew e belkî… Ew jî vê rastiyê dizane… Wiha şaş nebe Nîhad! Welehî , niha qet kena wî nayê… Niha digirî, lê dibêje qey, me dixapîne. De bise, ez ê çi bikim… Destê xwe da ser milê Qasim û got:

- Wax wax! Xalê Qasim! Tu çima wiha digirî, heyfa te!

Tu Qasimê mêrxas, mêrxasê Hewlêr û Kerkûkê, tu çima wiha digirî, qey mêranî miriye?

Qasim, bi wan gotinan şaş û metal ma. Xuyabû ku qet hêvî nedikir. Dixwest ku xwe veşêre da ku tu kes wî nebîne. Lê dîsa jî, ji bo ku wê rewşa xwe ya kenokî û reben veşêre, dengê xwe qalind kir, birûyên xwe bir ber hev:

- Tu çi dibêjî! Tu ji ku dizanî ku ez mêrxasê Hewlêrê bûm? (Xuyabû ku bi wê rewşê kêfxweş bûbû, çavên wî diçirisîn.) Ma tu ne ji Bakur î?

Hinek bêdeng ma, bi destmala xwe ya kevn û qirêj, xwêdana eniya xwe paqij kir û berdewam kir:

- Ez, ez Qasimê mêrxas im… Deşta Behdînanê; bi dengê lingê hespê min dilerizî… Min xewên şeva heram dikir li neyaran!

Li nava çavên Mûrad mêze kir.

Mûrad bi rûyekî germ serê xwe hejand.

- Ez Qasim im! Zû bikin, zû bikin hespê min bînin! Hespê min bînin! Ez ê biçim Behdînanê… Ez ê biçim çiyayê Behdînanê ba karkeran! Destê xwe li ser milê Mûrad xist. Nîhad, ji gava din de yên ku li dora wan civiyabûn bi zorê dûr dixist. Piştre dît ku nabe, hemû naçin, hate ba wan.

Qasim dîsa qîriya û destên xwe li ser milê Mûrad xist… Mûrad, bi dengekî nerm:

- Xalê Qasim, ma ji xwe tu siwar î! Ma tu kengî ji hesp peya bûyî? Vayê hespê te, li binê te ye!... Destê xwe da ser milê Qasimê gir û zexm, Qasim dîsa şaş ma. Soro moro bû. Xuyabû ku pir bêmecal jî maye… Hêza xwe kom kir ku bipeyive. Lê bi anonsa peywirdarên keştiyê ew jî veciniqî bi hemûyan re û guhdarî kir:

- Em ê hinek paşê, pênc deqe paşê, we ji keştiyê peya bikin… Hemû amade bin bila kes li paş nemîne!

Bi van gotinan her kes kete tevgerê, weke pezê ku gur ketibe navê… Vê carê hemû rû; bi tirs û heyecanek nediyar, hatin boyaxkirin… Her kesê berê xwe da aliyê derî… Mûrad û Nîhad, di nava wan de diçûn û dihatin, ji bo ku wan bisekinînin, ji bo ku pêlihevkirin, hev dehfdan û pelaxtin çênebe. Hinek paşê, dîsa anonsê dubare kirin û çawa ku qediya derî vekirin… Her kes bi lez ber bi derî ve diçû… Dayikekê digot:

- Weleh kî li paş bimîne, dê wî/wê bavêjin nava behrê! Ma qey em nizanin ku çend caran, me avêtine behre.

Mûrad:

- Dayika min, meraq neke. Kes li paş namîne jixwe.

Dema ku derketin ser eywana keştiyê… Piştî keser û hesretekê dirêj, keviyê behrê, axê û asîman dîtin. Bayê êvarê yê hênik dihat… Rojhilat, hêj sorahiya rojê winda nekiribû. Hemûyan bi hev re bêhneke kûr kişandin. Piştre çavên xwe mizdan. bi destên xwe yên qirêj û qermiçî çavên xwe mizdan, lewre te digot qey, ku wan mêr û jinên ciwan, navsere û zarokan, tu car asîman, hewaya paqij û ronahiyê nedîtine. Wekî ku ji nû ve hatibin dinyayê, li dora xwe dinêrin bi şaşwazî. Vê carê hemû rû bi şaşwazî, neçarî û pirsa "dê ji niha û pê ve çi bibe?" hatibûn boyaxkirinê… Kê wan rûyên ku her yek ji derekê ye, ji welatekî bû boyaxkiribû, kê? Demê! Dema bêbext wan rûyan boyaxkiribû… Neçarî û parçebûniyê wan wisa kiribû û bêhêvîtî û bêwelatbûniyê.

Gava ku piyên wan, di wê êvara bêkes û dûr de pê li axê kir; dilê wan lerizî ji kêfan. Ji xeman jî lerizîn. Ax û zeviyên wan hate bîra wan! Ên li dûr, ku niha ji wan xeyidîne. Yên ku şewitandî û wêran in… Dayikekê bi hesretekî mezin, xwe avête erdê û ax maç kir bi kelegirî… Xortekî jê re got: "Dayê, ma ev ne axa me ye, tu çima wiha dikî?" Dayikê serê xwe bilind kir, bi keser û fedî, li dora xwe meze kir û kete rê. Ango di nava riya ku tunebû re meşiya!

Mûrad û Nîhad, bi destê zarokan girtibûn. Îcar Asmîn bi Nîhad re bû. Ciwan li paşiyê, jin, zarok û extiyar jî di navberê de bûn. Hinek ciwan jî li pêş bûn. Şev, tarî û bêkes bû wekê wan… Keştî zûde birêketibû û çûbû… Mûrad dît ku wayê ronahiyên keştiyê êdî winda dibin, xwe bi xwe peyivî:

- Vana çima ew qas lezandin? Dilê min bi saw e. Wekî ku bêbextiyek hebe di vê bûyerê de… Na lo! Ma sîmsar in! Kîjan sîmsar rûreş û bêbext nîn in! Weleh nizanim şikekî heye di dilê min de… Nîhad li ku ye? Min jê re got: "here pirsa Nêrgizê bike" lê neçû… Lê niha hiş û dilê wî jî li balê ye.

Nêrgiz, di milê diya Asmînê ya nexweş de bû… Em hinek jî biçin, paşê bisekinin. Ew qas dûrketin bes e. Jixwe derya êdî li dûr e. Hey gidî deryayê, cinawirê! Tu çiqas neyar û biyan tê ji me re! Dibe ku em te nas jî nakin. Gerçî sûc ne yê te ye, dîsa jî… Em îşev li vira bisekinin, heya sibê. Çawa bibe sibe em ê çareyekê bibînin… Ev çi deng e? Dengê Qasim e dîsa?

Sekinî guhdarî kir. Qasim bi qîrîn digot:

- Biçin, we dengê min nebihîst, biçin ji ser axa min! Hûn çima ketine nava erdê min?

Nîhad bi dengekî nermik di ber dida û digot:

- Xalê Qasim! Ne şerm e ku tu wiha dikî?

Ma ev erd û ax ji xwe yê te ye. Tu çima diqîrî, vê şeva hane.

Mûrad keniya û ramiya: Çi xweş dibêje. Ev lawik, ev heval pir jîr e. Saet bi saet bi pêş ket. Qasim, hê jî "berxwedanê" dike! Lê dengê wî, tê birîn… Dengekî çiqas reben û neçar e! Dengekî bêkes, bêhêvî. Eynî weke vê şevê. Ev deng, dengê şevê ye ji qirika Qasim tê! Hey gidî hey! Tu dibêjî qey, stêrk û roj, welat û gel, nemaye êdî, di vê şeva bêkes de… Her tişt, ango tiştên xweş, çiqas dûr in. Welat, roj, yekitî… Ji me re gotin: "Me we li Îtalyayê peya kir!" Jixwe em bi vê armancê hatin. Ku wiha be, ez ê sibê xwe bigihînim Ehmed… Xerîbî çiqas zor e! Bê sedem negotine "mirovê xerîb kor e!" Baş bû ku her kes wiha meşiya. Wayê dengê Qasim jî tune êdî zû bûbûya sibe, baş dibû… Ew qas bes e lo! Ez bêjim, em biseknin êdî… Jixwe yên li pêşî hêdî kirine. Nîhad li ku ye? Wan ciwanên li pêşî, bisekiniyana êdî… Nêrgiz kanê? Ev kaloyê reşik… Weyîî! Ev çi ne? Heya niha ew qas tarî bû, çima pênexistibûn. Wekî ku kemîn be… Ji herdû aliyan ve jî pêxistine. Ev çi projektorên mezin in… Wey mala minê. Rebenên me çawa bêkes û bêtirs mane di nava herdû ronahiyan de. Ango di navbera herdû eniyên ronahiyê de. Xwedêyo! Ronahî xweş e bi şev. Lê niha çima weke neyar e. Em xwe bavêjin li ku, di ku de veşêrin…

Deng tê! Ev çi dibêjin… Bû sêcar dubare. Baş e ku em hinek fêm dikin ji zimanê…

- Zû bikin, ji nava tixûpên me derkevin! Hûn bêdestûr, bi qaçaxî ketine nava erdê me! Li gorî Zagonên Dewletên Navneteweyî sûcekî mezin e ev rewş… Lez bikin ji nava tixûpên me derkevin! Hûn niha li ser axa Bulgaristan û Makedonyayê ne. Zû biçin, an na…

Pişta şevê jî, ya bêkesên wê jî. Pişta wijdan û mirovatiya demê jî şikiya, bi wan gotinên guleyî. Çend kesan bi hev re gotin: "Me xapandin, dîsa me xapandin!" Dengê wan weke qîrîna pepûkê derketibû… Mûrad, ji xwe re got: Erê eynî weke dengê pepûkê qîjiyan! Pepûkê mala we xera kir! Ku niha em bêjin "me gotiye qey vê derê Îtalya ye… Me xapandine , weleh me xapandine. Em xerîb in birano! Ji dûr hatine, ji rojhilat! Xwedê dewleta we bihêle ji we re. Lê dewleta me tune… Em bê cih man e. Êdî gundên me jî tune ne!... Weleh me xapandin… Em bi kêfa xwe, bi zanatî nehatine vira, li me biborin! Sîmsaran em xapandin. Dinyayê em xapandin! Gotin "ev der Îtalya ye!" Me nizanibû ku ev der welatê we ye, sînorê dewleta we ye… Weleh me nizanibû! Qirika wî tije bû. Na lo! Ku em wiha bibêjin, dê çi bibe? Qey dê mirovahî û wijdan şiyar bibe dê humanîzm -mirovhezî- û demokrasî were.

Weyîî vana bi ku ve dilezînin? Ronahiya projektoran çawa bera wan dide!

Û gurmîn bi şevê ket! Gurmîn bi canên bêkes, bi ciwaniya Nîhad û Nêrgizê, bi biçûkatiya Asmînê, bi Qasimê mêrxas, bi dayik û xortekî ket. Nizanibûn ku ketine nava zeviya mayinan! Bilez çûn û bi teqîna mayinên berbiteqîn, parçe parçe bûn. Asmîn, tunebû êdî! Belkî bûbû çûkek û firiyabû nava welatê xwe yê dûr û birîndar… Firiyabû , gihiştibû berx û karan, kulîlkên hinaran… Dikeniya, dixwend.

Nêrgiz tunebû êdî. Porê wê yê zer, evîndariya wê ya bêmirad çûbû… Di teqîna bêbextiya demê de, evîn û kenê wê hatibû kuştin! Belkî çûbû Başûr û "lo lo pismamo" digot, ji pismamê xwe re, di rojên ronahî û dilgeş de… Belkî di dawetek li Başûr û Bakur, Rojava û Rojhilat de bûbû bûkek xemrevîn, demsalan hene dikir. Nêrgiz bû, belkî jî li mêrg û zozanên welatê xwe vedikir her bihar.

Xalê Qasim jî tunebû êdî… Belkî siwarê bozê rewan bûbû bi Memê Alan re… Helbesta mêrxasî û biratiyê, helbesta mirina birakujiyê dixwend. Belkî cotkarekî dilşad bû êdî û hemû ax, welat bûn jê re. Nîhado, pismamê evîndar, xwendevanê şîrîn… Ew jî nexuyabû.

Mûrad, bi helkehelkê digeriya. Jixwe bi teqînê re, hemû projektoran jî vemirandibûn. Mûrad qîriyabû: "her kes di cihê xwe de rûnê… Ji hev neqetin û bi aliyê sînor ve neçin êdî… Kes xwe nelebitîne êdî. Nîhad, tu li ku yî, ka were heval! Nîhad." Li benda bersivê bû, lê ditirsiya jî. Hîs dikir ku dê êdî qet Nîhad nebîne…

- Nîhaad. Ka were loo! Ez li vir li benda te me!... Gihiştibû ber kuştiyan. Hemû li ba hev bûn ji xwe… Wek ku komek zarokan xwe li mirinê danîbe… Li ba wan bû… Lê newêribû li wan binêre… Piştre nêziktir bû… Saetek gir û bi fosfor, diçirisiya di qevda destekî da… Çavên xwe girt… Saeta Nîhad hate bîra wî… Ew sekinîbû, ketibû, lê saet nesekinîbû, digeriya bilez… Hêdîka digeriya li wan… Wekî razayî bin, ji bo ku şiyar nebin ji xewa şîrîn. Hêdî hêdî…

Nîhad, ma tu min wiha nahêlî û naçî ne wisa? Tu hevalê min î… Hevalê min xwe neke canekî bêruh…

Na, ez ê nebêjim, berê hevalê min ê jêhatî hebû, niha canekî bêruh heye! Na ez wiha nabêjim… Rabe hevalê min, li vê xerîbiyê nemire, min jî tenê nehêle… Min nizanibû ku ew qas hînî te bûme… Rabe hevalê min ê şîrîn, sebra min nayê. Nîvê şevê ye. Şeva din vê gavê em dipeyivîn Nîhad, ma tu yê çawa bimirî? Xwezî bi şeva din. Qey şeva din pir xweş bû… Na, lê dîsa jî ez wiha dibêjim… Şeva din min û te digot:

“xwezî bi wê gava ku em pê li axê dikin!” Lê niha jî ez dibêjim “xwezî bi şeva din!... Nabe, wiha nabe…

Hêsirên wî, di ser rûyê wî yê ku ji toz û xwêdanê hişk bûbû de diherikîn. Digot qey, şev digirî, asîman digirî pê re. Digot qey, şev û asîman, bi hêsirên çavên wî şil dibûn… Ji xwe re digot: Mêr nagirîn ne wisa? Ma çima mêr negirîn? Mêr jî wiha neçar û perîşan in, dimirin, hevalên xwe winda dikin li xerîbiyê.

Nalet bê, li wan gotinên derew! “Mêr nagirîn!”

De ka ez rabim, heste pêxim ka, Nîhad ji ku derê xwe derbe girtiye… Bila hêsirên min nekevin ser canê wî… Weyîî! Nîhadê min! Sînga te parçe parçe bûye. Te wê demê çi hembêz kiribû? Ez dizanim, niha dilê te geş e, nemiriye, namire! Ha ji te re, bila dilê min ji te re be… Ê te jî, ji min re. Ez ê dilê te bibim dûrahiyan, bibim Behdînanê qet meraq neke… Li zozanekî Zagrosê, di nava gulan û sosinan de deynim… Xem neke ha! Tu jî dilê min bibe Nîhad! Ka binêre, te duh gotibû: “vana hemû weke cendekan in!” Binêre, niha jî ev cendek razane di nava tirs û nezaniyê de… Vana cendekê xwe û cendekê bêbextiya dinyayê ne!

Ez tenê me di şeva dûr de… Tu jî tuneyî… Yên zindî jî razane! Barê min giran e ku tu hebûyayî, dê wiha nebûya! Ez ê wan bibim… Pismamê Nêrgiza xweşik! Weleh Nîhad, min dixwest ku tu bi Nêrgiza xwe re dilgeş bibî… Tu jî layiqî dilgeşiyê bûyî pismam… Lê dinyayê, demê nexwest… Xem neke ha! Ez ê pêşnûmayên me pêk bînim… Dizanim, te pir jê hez dikir, nedixwest çavên xwe jê biqetînî… Lê ji bo xeyal û ramanên me, te berxwedan dikir… Xwe dûr dixist ji dotmama xwe… Tu çiqas aşiq bûyî, ew qas jî gernas bûyî Nîhad! Me yê tiştên pir xweş bi hev re pêk baniya… Em ê vegeriyana. Vayê şefeqê avêt. Ez ê te û Nêrgiza te, Asmînê û Qasimê te, li vira veşêrim… Lê li benda min be! Ez ê rojek , teqez werim û bi govendekî we bibim welat… Weleh ez ê we bibim Nîhad, kuştiyê riyan! Ez ê te di dilê xwe de veşêrim.. oxir be hevalê min…

Erê, çîroka wî ya pêşerojê ya koçber û birîndar wiha bû… Wê Mûrad vê bûyera agirîn bidîta… Lê niha rûken bû û li nava çavên her sê şervanên rûken dinêrî û digot… Guhdarî dikir digot…

- Heval, tiştên ku hûn dibêjin rast e… Divê ku mirov sebir bike… Lê ez pir aciz dibim… Îmana min derxistin hevalno! Rojê nizanim çend caran li min digerin, dipirsin, telefonê vedikin… Dibêjin “tu hêj neçûyî çiyê? Tu hêj nemir î Mûrad! Ez pêr ji bin çavan derketim vê sibê dîsa hatin pêşiya min. Çawa bêjim, ne ku bêraman nêzîk dibim…

Lê raman jî, sebir jî, tê sînorekî û disekine… Pir li zora min diçe. Biborin, min pir gazin kir… Tu dibêje qey, kar û derdê we ne besî we ye, îcar gazinên min jî bi ser de!...

Lê ez jî encax ji we re bibêjim…

- Na heval, tu çima wisa dibêjî? Em ji dil û can guhdarî dikin… Lê tiştê ku em bêjin tu jî dizanî… Berxwedan! Ev rewş, ji bo me jî derbasdar e heval. Carinan em jî dikin ku ji her alî de bibêjin: “Êdî bes e loo !” Lê nabe, sebir jî biqede dil jî kambax be em ê bimeşin.

- Hevalê Mûrad, tevî gotinên hevalê Kendal ve min ê bigota: “xwe qet tenê hîs neke… Ez bawer im ku tu xwe tik û tenê jî dibînî carinan di nava koma dijminan de jî di nava gel de jî.

- Eynî wiha hevala Binevş… Lê gava ku hûn tên bîra min, ez dizanim ku ne tenê me hûn hene… Lê bê we me, hûn li dûr in lewre. Dîsa jî berxwedan… Lê ez ji koçberiyê jî ditirsim… Ditirsim ku rojekê min bigirin û dersînor bikin. Ango derwelat bikin ku ez nikaribim xatir jî, ji kesî bixwazim…

- Înşalah dê neyê wê radeyê… Min ê pirsa dayê ji te bikira heval… Zûde ye ku me ew nedîtiye… Bi girtin û berdana te pir bi bandor dibe ne wisa?

Gelek silavên me yên hevalî jê re bibêje… Destê wê ramûse ji ber me ve…

- Baş bû ku te got heval… Min jibîr kiribû… Pir silavên wan jî, ji te re, ji we hemûyan re hebû.

- Eleykum selam , serçavan!... De ez êdî rabim biçim, niha bêriya min kirine! Bû çend car ku ez dibêjim “ez biçim” lê nabe! Deste min ji we nabe em ê kengî hev bibînin êdî.

- Destê te ji me nabe, yê me jî ji te nabe. Lê wiha jî nabe. Ev mîrata “Nabe” jî çawa bicih bûye di jiyana me û zimanê me de… Bû çend car ku em dibêjin,” Nabe!”Ango NA û NABE’ yên dinyaya îroyîn gelek in ji me re. Lê dê rojek bê… Cihê nabe’yan de “Erê bû û dibe” bikevin nav axaftinên me… Ango bi guhertin û geşbûna jiyanê , ziman jî diguhere.

- Ax Kendal ax! Xwezî ez bibûma Kendalekî, ez bibûma ew Kendalê kesk û bi tu derê ve neçûma.

- Hevalê Mûrad, tu naxwazî bibî zozan jî? Zozan jî bilind in ha… An na tu tenê ji navê hevalên xort hez dikî.

- Na heval… Ez dixwazim bibim Zozan jî, Binevş jî… Bê wan jî nabe.

Binevş:

- Erê, hat fêmkirinê dê ev daxwaza te pêk were! Dê xweza te bike Kendal jî, Zozan jî, Binevş jî! Xem neke… Xem neke lê rabe bi rê bikeve… Dereng e êdî.

- Rast e… Mirov nikare xwe ji destê rastiyan û mercên wan, xilas bike. Rabim biçim, baştir e. Haa, ez dîsa heste, tizbî û pênûsa xwe bidim we.

- Heval, tu yê top bavêjî ku wiha biçe! Her carê, ji nû ve distînî û didî me.

- Bila canê we sax be hevala Binevş… Binevşa dayika min! Bibore… Diya min ji te û hevala Zozan re wiha dibêje.

- Gelo dayê, ji min re nabêje Kendalê min… Çima ji min re nabêje? Jê re bêje Kendalê te pir silavan li te kiriye… Erê?...

Hemû bi hev re keniyan… Ken bû ronahiyek li ser lêvên wan… Dilê wan, bû çûkekî li asîman… hemû bi hev re keniyan… Kendal bi xwe jî keniya:

- Em ji kenan mirin, lê rast e… Ez jî Kendalê gelê xwe me!

- Ez ê ji diya xwe re eynî wiha bejim.

Zozan:

- Hevalê Kendal, ku rojekê gel ji keziyên me hez bike, tu bibandor bibî û porê xwe berdî, keziyan jî çêbikî.

- Erê, dibe… Ma çima por û keziyên xweş li ser jin û keçan nehatiye tapûkirin… Jixwe êdî zilam jî por berdidin, dihûnin… Ji bo vê tiştê, bingeha me ya dîrokî jî heye… Ma berê porê me zilaman jî dirêj nebûye Mûrad.

- Na na… Ne niha ne jî di dîrokê de ji zilamên pordirêj hez nakim Kendal! Bila ji min dûr be! Tu jî pir modern î, nûjen î ango…

Binevş:

- Erê weleh… Hay ji xwe hebe ku modernîzm ango nûjentî te neêşîne heval.

- Na na. Meraq nekin, nûjentî nikare min biêşîne… Ez raman û felsefeya wê, cîhana wê nas dikim. Ma em hemû jî di hembêza nûjentiyê de dijîn hevalno!

Zozan:

- Modernîzm, li serê çiyayê Kurdistanê, li gundên wê çi dike? Encax qirêj bike. Û modernîzm bi firok û bombebaranan tê naskirin li Kurdistanê.

- Aliyê modernîzmê yên baş jî hene heval! Mirov wiha yekalî nagire dest… Maşalah, em dîsa bi nav leman ketin û me Mûrad ji riya wî hişt.

- Sax bî hevala Binevş. Lê dîsa min heq kiribû vê rewşê. Ku min qala diya xwe nekira dê mesele ew qas mezin nebûya.

- Na heval, ku te dest pê nekira, me yê dest pê bikira.

Em jî ji te kêmtir nîn in.

- Bi xatirê we hevalên hêja û delal! Min nedît ku çawa dem buhurî li cem we… Hay ji xwe hebin.

Kendal:

- Tu jî hay ji xwe hebe! Tim ji xwe re bêje "Mûrad, berxwedan Mûrad!" Û bêriya me bike!

- Kuro we dîsa min da kenandin! Ku niha gundîtiya min, min bigire, tu kes nikare bisekinîne… Ez bêriya we nakim. Hûn bêriya min bikin!

- Erê, hûn bêriya min bikin ha!

Binevş:

- Hevalno, hûn çiqas wek zarokan in. Biborin lê hûn ê herdû jî, em hemû jî em ê bêriya hev bikin… Tew hevalê Kendal jî, dibêje qey ku desmalek spî dixwaze ji sûkê, dibêje "bêriya me bike ha!..."

- Ku ez dûr nekevim dê niha sohbetek din dest pê bike.

Bi xatirê we hevalno, serkeftin… Ka em zû zû bi destê hev bigrin.

- Serkeftin oxir be!

Di zivronekên riya zirav de berjêrkî çû û winda bû… Roj hêdîka, wekî ku bi diziyan cihê xwe diguhert li nava asîman.

Kendal bi destmalekê çeka xwe dibiriqand. Jixwe çeka wî tim biriqandîbû. Carinan jê re digotin: "gelo, hundirê çeka te jî wekî derve biriqok e?" Digot "erê, erê meraq nekin, dixwazin ez vekim binihêrin…" Niha jî dibiriqand û ji bo ku hişê wî, li ser Mûrad bû strana "Dayê ez xatir ji te dixwazim" digot… Wekî ku ji nû ve xatir ji diya xwe, ji dayikan bixwaze… Wekî ku hê jî bi Mûrad re di xatirxwestinek de be… Lê nizanibû ku ew xatirxwestin, ya dawî bû… Wê êdî Mûrad nedîtana. Nepeyîviyana û axaftinên ji dil, ji avê zelaltir nekirana bi hev re. Lê dê pir û pir bêriya hev bikirana… Dê navê wan bibûya Bêrî! Dilê wan navnîşana wan, bibûya Bêrî! Gelo ji bo wî bû ku ew qas ji hev re gotin: "Bêriya me bike ha!" Ji hev re gotin, lê nizanîbûn ku dê ew gotin bi salan pêk were. Kendal jî nizanibû Mûrad jî nizanibû… Hêj ken û henekên hevaltiya çiyayî li ser zimanê wî bû û bi rûyê xwe yê bedew û bajarî bi taximê xwe yê kot, dimeşiya… Lê rûyê hezkirinên bêdawî, rûyê Kendal û zozanên bi binevş, dixuyan di çavên wî yên reş de… Dimeşiya Mûrad…Tenêtiyeke bêeman dîsa xwe li hemû hebûna wî pêça bû… Dilê wî digot: "çi xweş e cihê wan… Ew weke hev in û li ba hev in… Ku şehîd jî bikevin dê bi hev re bin… Ne mirin dikare wan ji hev biqetîne, ne şerê dijwar, ne dem û ne jî bêbextî! Xwezî bi canê wan!

Ku şehîd jî bikevin, dê xwîna wan bikeve nava eynî golê, dê di eynî kulîlkên rengîn de vebibin…"

Roj diçû ava, ew diçû navçeya xwe ya li ber bajêr… Şev dihate ser wî roja payîzê… Lê şeva herî dirêj, li pêşiya wî û temenê wî yê ciwan bû…Çavên wî hê jî diçirisîn bi serxweşiya bayê çiyayan… Lê şeveke reş ku dê wî bi salan ji axa wî, av û daristan heval û hogirên wî bidiziya, dilê wî bişewitanda bi hesretên koçberiyê li pêşiya wî bû… Ew şev, berdêla welatheziya wî ku zûde dabû ber çavên xwe, li dervayê navçeyê kemîn avêtibûn pêşiyê, li bendê bû! Çû û çû Mûrad… Warê wî yê bê behr, rêwîtiya bi keştî meştiyan nizanibû… Lê ew ê bibûya rêwiyekî di keştiyek demê ya wek wê bêbext, wan bavêta nava sînorên Bulgaristan û Makedonyayê û dê hevalê xwe yê Nîhad, li wê derê veşarta bi dilekî parçe parçe, dê parçeyên hevalê xwe berhev bikira ji erdê…

"Dayê ez xatir ji te dixwazim bi…" Çibû hevala Zozan. Dayê ez.

- Hevalê Kendal, vê kilamê nebêje… Bisekine heval ku tu bêjî.

- Çi bûye hevalno! Hevala Zozan, ji gava din de te ji bo vê çav û biriyên xwe wisa dibir û dianî? Xêr e, ma ev stran qedexe bûye… Kîjan dewletê qedexe kiriye gelo!

Zozan:

- Dewletan qedexe nekiriye… Tu çima fêm nakî heval! Ev strana hevalê Kemal e! Roja dawî jî xwestibû ku em bêjin… Ango ji hevala Binevş xwest… Lê hevalê negot, nikaribû bigota… Got: "ez ê sibê piştî çalakiyê bêjim…" Lê heval venegeriya…

- Mala we xira bibe! Ji bo min jî ev stran a hevalê Kemal e. Dema ku ez dibêjim, an jî dibihîzim ew tê bîra min… Lê dîsa jî bibore hevala Binevş… Ji bo îro… Lê em ê bi hev re bejin ha! Îro nebe jî em sibê, rojên din, jê re bejin. Ji bo wî bêjin. Dema ku em li Sasonê bûn jî, vê stranê digot… Jixwe tişt û bûyerên li ser xatirxwestinan, tim bandoran li ser wî dikirin… Bibore hevala Binevş.

Ji ber wê bîranînê, çavên wê zuha bûn, lê dile wê digiriya… Çawa ku hinek ken bê hîqehîq in, lê kenîn in dîsa, kûr in. Hin girîn jî wiha ne… Ziwa ne çav bê baran in lê dil wisa digirî, wisa digirî ku lehî û laser radibin… Binevş jî, di nava girînek wiha de bû… Digiriya bê deng û bê baran, di nava wê roja payîzê ya berêvarkî de.

Kendal:

- Hevala Zozan, em sibê an jî dusibê biçin cihê we yê bere. Çenteyên we, tiştên hevalê Kemal bînin erê… Ê hevalê din…

Hevalê Piling bû ne? Ên wî jî. Ku navnîşan hebin em nameyên serxweşiyê jî bişînin ji malbata wan re… Hûn nas dikin ne wisa? - Na… Çi heyf ku em nas nakin! Em ew qas bi hev re jî man. Em ê bi aliyê malên wan ve biçûna ango wan ê me bibira.

Binevş:

- Em dizanin ku herdu jî, ji navbera Bedlîs û Mûşê yan jî Tetwanê ne… Lê cihê wan nizanim… Jixwe wekî ku heval jî got, me nizanibû ku tiştek wiha bibe… Divê ku mirov, ji bo van rewşan jî amade be… Ez ê navnîşana xwe binivsînim… Jixwe di veşartek-arşîvan de heye… Lê bila li ber destê we jî hebe… Hûn jî yê xwe bidin min ha! Tu mîsogeriya jiyanê tune… Hevalno, li zora min diçe ha!... Hinek berê hûn peyivîn we got: "Wiha bû. Wiha baş bû. Hez dikir…" Ev jî li zora min çû! Çima em nikarin bêjin: "Heval ji wê stranê, ji asîman hez dike…" Em dibêjin "hez dikir…" Ango mirin çawa zû mirov ji hev vediqetîne… Mirin çima dikare wan hevalên ciwan û bi xeyal û armanc ji me didize û dibe? Em çima nikarin hevalên xwe biparêzin? Mirin çima wiha bi stûyê me ve daleqandiye wek kevirekî… Wek kevirê aşê mezin û qirase bi stûyê me ve daleqandiye mirin.

- Hoy hoy! Ez te fêm dikim heval! Dema ku hevalên me şehîd diketin min jî wiha digot: "Ku wiha be, em hemû di carekê de bêne kuştin çêtir e! Bila dinya jî zû ji me xelas bibe, em jî zû jê xelas bibin…" Ango di demên wiha de jiyan, saxmayîn; dibe dojeh li ser serê mirov… Tehl dibe ji jehriyê xerabtir… Mirin û jiyan dibe nakokiyek û li tevayê hebûna mirov dilefe. Zor e pir zor e. Û encax ên ku jiyan û mirinê, gulebaran û kenê, zilmê û berxwedanê bi awayekî dirêj û kûr dîtibin dikarin fêm bikin û bijîn… Ango yên ku nejîn tu caran fêm nakin… Nikarin fêm bikin… Gelek rastiyên jiyanê, dem û ramanê, encax bi jiyanê tên fêmkirin… Çawa ku mirov ji yekê kor re nikare bêje; "De were ji min re qala gul û kulîlkên biharê, qala rengên berbangê û rûyê yarê bike! De were li hêşînahiya vê mêrgê binêre, li vî çemî binêre…" Mirov ji yên ku hinek rastiyan ne jiya bin re jî nikare qala van tiştan bike… Jixwe ku mirov bike jî dê şaş û metal bimînin… Dibe ku xeyalên wan jî tarûmar bibin… Ango me dilkevir, dilpola dizanin… Dibêjin qey, qet girîna me nayê, dilê me bi alaw û pêtan naşewite… Em birîndar nabin bi veqetînên bêdawî hûrhûrî nabe giyana me di kuştin û çûndinên nîşka ve de… Ango dibêjin qey em bêdil in… Lê belê…

Zozan:

- Lê belê dilê me jî heye… Dilekî ku tim bi agir e…

- Hevalê Kendal! Çay amade ye.

- Weyî, hevalê nobedar! Biborin me xwe jî demê jî jibîr kiriye. Heval hemû amade ne?

-Erê, hevalên li tepê jî hatin.

- Haydê em biçin hevalno. Hûn refên qulingan dibînin? Koç dikin… We dît bûn zincîr…

- Dema ku em zarok bûn, me digot: "quling werîs, quling zincîr…" Ku xwe wiha dikirin, me digot qey, ji zimanê me fêm dikin loma xwe wiha dikin zincîr.

Bi ken û henek, ber bi hevalên xwe yên din ve çûn… Di bîranîna zarokatiyê de bûbûn zarok jixwe… Li rûyê hev, dinêrîn, zarokatiya hev û zarokatiya xwe didîtin di çavên hev de… Jixwe zarokatî; tim li pey wan bû... Welatê herî rast bû lewre ji wan re jî. Ji hêvî û mengiyên wan re jî.

Hatin ba sifreya xwarinê. Sifreya ku li ser axa çolê hatibû danînê û ji çay û penêr û nan pêkhatibû… Jixwe terz û mercên jiyana wan, xwesertiya xwe dixwarin û vexwarinê de jî dida xuyakirin… Wekî ku tê gotin: "Ji kevir nermtir" çi bihata ber wan 'xwarin' dipejirandin… Ango tu kesê êdî nazdarî û hilbijartokiya xwe ya li malê dewam nedikir. Xwarin û vexwarin, tenê ji bo hêza jiyanê bû. Ger ku bûbûya, dê bê xwarin û vexwarin bijiyana, lê nedibû… Loma jî, çi bihata ber wan!... Ango nazdarî, tamdarî û zewqên kesîtî yên herî biçûk û mezin, li pey xwe hiştibûn, derbas bûbûn ji wan… Di navenda dema wan de; di navenda hemû hebûna wan, temen û ramanên wan de tenê şer hebû… Parastin, paqijkirin, hişyarkirin… Erê, hişyar bûbûn ji hemû daxwaz û riyên ferdî, ji tarîtiyên di kûrahiya dil de… Ji gotinên herî veşarî hişyar bûbûn ew û bi navenda hişyariyê ya di hebûna xwe de dibeziyan bêsekn. Dibeziyan… Dem awarte, gav roj, roj sal bûn êdî…

Demsal, temenek dirêj bû… Yekê/a ji wan ku demsalek bimaniya bê şehadet, ango demsalek xwe temam bikira li serê wan çiyayan… Temendirêj dihate hesibandin… Jixwe ew î kesê bi xwe jî vê bûyerê hîs dikir û li demsala ku li pey xwe hiştiye dinêrî. Wekî ku li pireke ji mû ziravtir, ji agir germtir li pey xwe hiştibe binêre…

Êvarekê şîrîn, êvarekê dost… Êvar rê û rêwîtî bû ji bo wan. Êvar kilamek li ser lêvan, daweta şevê, xatirxwestina rojê bû. Bi meşa wan dengên daristanê zêde bûn. Di gel dengê şalûl, hechecik û bilbilan, di gel dengê xuşexuşa pel û şaxên daran… Dengê lingên wan û giyayên hişk-

bûyî jî dihat êdî… Bêdeng, lê bi awaza ramanên pirsdar dimeşiyan. Gihîştine nav şiveriya ku di serberjêrê de wek marekî dizivire. Gavên wan lezgîntir bûn. Di cihê wiha de ling û gav, çok û siya mirov, ji ber xwe ve dimeşiya… Dimeşiya? Na, diherikî û hemû bi hev re, dibûn şîpeyek (şelale) û li çiyayan, diherikîn ber bi deşt û bajaran ve…

Binevş:

- Hevalno, ev saet, ne ya Mûrad e?

Kendal:

- Erê… Min jî vê şevê dît… Ev jî ya wî ye. Çawa meşiya ye?

Zozan:

- Hevalno, mesele meşa wî nîn e! Bi zanîn wiha kiriye! Jixwe bi zorê ji me dûr ket. Piştî ku meşiyaye jî bêrîkên xwe vala kiriye. Zanibûye ku em ê di vir re derbas bibin… Wekî ku xelatan ji me re danîbe… Kurdên ecêb!

Hevalno, werin em tiştekî bikin… Dema hatî cem me… Beriya ku were em jî gul û kulîlkan, destmalan deynin ser riya wî.

Çekdar, (nobedarê li jorê.) Bilez ji pêşiya komê vegeriya û hat li ber Kendal sekinî:

- Heval… Ew eşyayên me li mala mêvan bûn ne wisa, ango em ê dîsa biçin mala wî? - Erê… Em bibin du kom, hinek li mala wî, hinek ji me jî, li mala jorîn. Hûn ê niha biçin…

- Erê… Ez û hevala Zozan û hevalê Rizgar.

- Haydê oxir be… Em ê hev bibînin.

Bi gavên lezgîn ji wan dûr ketin û winda bûn di nava rengê êvarê yê çilmisî de… Yên din jî dimeşiyan! Her meşek çîrokek bû. Her çîrokek, hêlîna hest û ramanan… Her meşek, baranek bû… Barana ciwaniya wan, xeyal û rastiyên wan… Barana bêriyên wan…

Binevşa ku ji xemgînî û veqetînên wê şevê çilmisîbû, dît ku gavên wê hêdî bûne û ji hevalên xwe paşve maye. Gavên xwe lezand. Xwe bi xwe ji xwe re got: “maşala Binevş! Tu dîsa bi ku ve çûyî? Van lingan jî hema mirov didin dest ha! Çiqas ku ez bikevim nava ramanên kûr ên min ji cih û zeman dûr dixin; piyên min wiha hêdî dibin. Çawa bêjim… Hêdî dibin çi ye? Ango giran dibin û li pey min nayên. Ez dereng dimînim. Heqet, pî çima wiha ne… Ma ku dil û raman diçin derekê, pî jî diçin, ango pî jî, li gorî rastiya ew gavê ya daringî tevnagerin, naçin? Rojbaş, rojbaş! Ma mirov ne yek parçe ye!...

Hooy! Ev bû sêcar ku porê xwe dixurînim… Porê min qirêj bûye.

Porê min ê zerik… Ma çawa qirêj nebin! Ew toz û dûman, barût! Porê zerik û tozdûmana cengê! Aax! Porê Kemal jî zer bûn! Ez naxwazim bêjim “zer bû!” Ez ê bêjim: “Porê wî jî zer in!” Ew heye lewre… Neçûye tu derê… Ew naçe tu derê! Ma qey te ew jibîr kir? Di vê çend saetên ku derbas bû de te wî û Piling qet neanî bîra xwe! Ez çiqas bêwefa me! Ma min çi zû ew jibîr kirin! Hêna dengê wan di guhê me de, kena wan li ser rûyê me ye… Na! Ez ne bêwefa me! Min jibîr nekiriye… Lê çima tim nehatin bîra min…

Di bîra min de bûn… Lê dibêjim qey, piştî ku me Kendal dît… Ango piştî ku em hatin ba hevalê Kendal wan… Hinek bêhna min derket. Çawa? Wekî ku Kemal bû Kendal!

Herdu pir dişibin hev jî! Pir ji hev hez jî dikin… Loma jî êdî min mirina wî, şehadeta wan herduyan jibîr kir… Ango êdî mirin çû. Lê min wan herduyan, di kesbûna hevalê Kendal de dît… Erê erê! Loma êdî mirin, veqetîn nehate bîra min… Hevalê Çekdar jî dişibe Piling! Êdî dibe tarî… Ew çi ne li wê deştê reş dikin… Bostan mostan in qey. Bostan… Axx! Hevalê Piling ew qas got: “em hinek li vê bostanê bisekinin… Zebeş û petêxan bixwin!” Bostanvanê welat, ew qas got! Lê em nesekinîn! Min bi xwe jî got: “Nabe heval, vê şeva hanê bila bimîne piştî çalakiyê…” Xwezî me wisa negota! Em çima wiha ne? Me çima nehişt...

Bawer im Kamûran Bedirxan e gotiye: “Ku min zanibûya veqetîn heye… Min ê ramûsana çavên wî… Minê çavên wî ramûsana…” Erê wî gotiye. Xuyaye ku vî derdê hanê jiyaye… De vê rastiyê jî qet pey me bernade! Em tim dibêjin: “xwezî û xwezî!” Xwezî min stran bigota ji Kemal re, xwezî ez şervanek leheng bûma di dema serhildanên tevayên dîrokê de. Xwezî ez bibûma çengek ax li ber dilê kuştiyên me! Çiqas bêhna giyayê şewitandî hat… Bêhnek xweş e… Baş e ku poza mirov heye… An na dê mirov çawa bijiya, bêhnê bistanda!... Na , mirov tenê bi poza xwe bêhnê nastîne...

Bêhna Kemal ji Kendal tê! Ez çawa hîs dikim… Hinek tişt, hinek bêhnên xweş û delal, bi dil tên hîskirin… Em çiqas bêdeng dimeşin… Tu dengek tune… Serê min dîsa xuriya! Gelo dê li gund derfet hebe ku em porê xwe bişon? Na- na!... Ez qet naxwazim li gund porê xwe bişom! Mirov tiştekî fêm nake, wekî ku panzer li dû mirov be wiha ji bo me bi xeter in. An jî wekî ku di nava dorpêça panzeran de bim… Ango tiştên wiha. Şûştinên malvanî, rûniştin û razanên hêsanî, ne li gorî me ne êdî, ne li gorî min in… Baş e ku wiha ye… Binevşa leşker…! Zozan çima

sekinî… Benikê sola xwe girêdide… Kî çi dizane ku ew niha çi dirame? Carinan çiqas dibe gundî. Gundiyek bi per û bask… Gundiyek saf û seranser… Xwezî wiha nebûya… Ji hêla hîs û ramanê de jî pir li pêş e… Çawa dibe? Dilê wê saf e… Ango di hestan de. Çawa bêjim? Biçûk û saf maye… Dengeyek xurt tune di navbera raman û hestên wê de… Xwezî ne wiha bûya… Dîsa "xwezî"… Çima jê re nabêjim? Na, min carek ducar jê re got… Lê xeyidî, ew xeyd jî ji gundîtiyê bû… Gelo pir maye? Maye ev gund dûr e ji me… Ez ê sibê porê xwe bişom, li ber kaniyê. Wiha nabe… Wîî! Ew ne Zozan e… Kîjan heval e? Min digot qey Zozan e… Na-na ew jî bi hevalê Çekdar re çû… Kendal çi dirame gelo...

Em zû hînî hev bûn… Na, ma nîvroj ne hindik e… Ku mirov ji dil nêzî hev bibe nîv saet jî ne hindik e ji bo hev nasîn û destpêka hevaltiyek xurt. Lê ya me? Hevaltiyên me bê hevdîtin jî dest pê dikin… Divê ku em di demeke kin de biçin çalakiyê û vê carê hemû bi hev re spîsax vegerin… An jî ku yên bê veger hebin bila ez bim… Êdî naxwazim derdê bê vegeriyan bikşînim… Erê, ger ku hebe, bila dora min be êdî bêvegerî, kuştin, mirin! Jixwe ez epey jî mam… Hevalên ku nû hatine hene… Ew hêj pir nû ne… Dengê bilûrê tê… Çi xweş lê dixin… Mihemedo… Hevalê Kendal jê hez dike… Got: "Çi xweş lêdixe!" Gelo ew jî dizane li bilûrê bixe… An jî dengê bilûrê çi tîne bîra wî?

Dengê bilûrê çi dianî bîra wî… Wî biribû û çûbû! Loma jî li ber xwe neda û di nava meşa bêdengiya şevê de got: "çi xweş lêdixe!" Û hezaran îmge, bangewaziyên bêdeng, pirsên lal herikîn ji hebûna dil û ramanên wî… Ku bibûya min ê bi roj û şevan tenê guhdariya bilûrê bikira… Ez ê ker û lal bûma… Min ê tu gotin û tu zimanek nepejiranda… Lê hemû hebûna xwe bida dengê bilûrê… Ji navendê jî tu xeber nehat… Sibê were baş dibe… Em encax dest bi amadekariya çalakiyê bikin. Hevalên li Botanê, vê heftê hemû bi çalakiyan derbas kirin. Qurbana çavên wan! Divê ku em jî dengê xwe bilind bikin… Jixwe şev jî, her diçin dirêj dibin… Hooy hoy! Payîz hat. Bêhna payîzê çi xweş e… Em biçin gund, ez ê li mala mêvan bimînim… Mêvan!... Ku rojek dijmin, bibihîze em jê re dibêjin "mêvan" dê bela veke li serê wî û bêje: "mêvan kod adlı Metîn…" Metîn ê ku bernavê wî mêvan e… Gelo em Zinar bi derek din ve bişînin çi bikin? Ew û herdu hevalên keç li hev nakin… Ji bo ku Zozan bi rêzanan re çû, ew neçû… Jixwe Zozanê jî ew nepejirand… Hêrsek mezin ketiya navbera wan! Hêrs û bêbaweriyên bi vî awayî, hevaltiyê dikujin û dikin bihevrabûneke mecbûrî-neçarî. Dikin

bihevrabûneke tehl û şikestî… Ew şikestin jî, hemû tiştên dozvaniyên delal û dilgeş, dişkîne hûrî-hûrî dike… Bûyera herî zor jî ev e di jiyana me de… Ango ev bihevrabûna delal û pîroz, ji ronahîtiya hevaltiyê tê dûrxistin û dibe xewnereşkek neçarî… Erê, dema ku mirov nû tevli refên şoreşgeran dibe, mirov dibêje qey, her ferdê ku tê, delal, azad, paqij û leheng e… Lê gava ku dem dibore dide xuyakirin ku ne wisa ye… Gur û hirç û zexel û fenek û bêbext jî hene di dilqê şoreşvan û hevalan de… Baş e ku mirov dibîne… Jixwe encamek xwezayî ye jî… Ma mirov û kesbûnên wan, ji karistana xwedê derneketine, ku hemû wek hev bin. Ji karistana ku ji serdestî, qirêjî, xayintî û zordestiyê pêk hatiye têne em… Em çi bikin; em jî bûn paya vê mekan û vê demê… Ma her kes, ne berhem û ristdarê dem û mekana xwe ye? Lê xwezî di dem û dîroka tu kesî de xiyanet tunebûya! Mala min ê! Kemalê me jî bi destê xiyanetê çû… Rojek, çiqas xweş peyivîbû li ser xiyanetê… Na! Semîner dabû me, li ser xiyanetê… Ev çi rastiyek malmîrat e ku, mirov tevdîran jî digire lê dijî… Lê xelas nabe… Çend hevalan ji me stend û hêj dê çend heval jî biçin! Kî çi dizane, dibe ku mirina min jî bi destê wan be? Naa! Bila ne wisa be! Bila tu heval bi destê wan neçin şehadetê! Jixwe tu kes naxwaze. Tu hevalekî şehîd nedixwest ku bi destê xayinan terka vê dinyayê bike!... Jixwe Kemal ji min re negotibû? Mala min ê Kemal! Tu jî bi destê wan çûyî. Te gotibû: "Dibêjin ku xayin û xiyanet weke mar e"!

Lê ne wiha ye… Mar, mar e… Lê xayin li gorî mar jî bibe hindik e… Gerçî ku mirov aliyên dîrokê dirame, dibîne xiyanet; encama rastiya dîroka me ya malxirab e… Lê dîsa jî… Ne mecbûr bûn ku bûbûna xayin… Tu caran ne mecbûr bûn. Ne mecbûr in… Tu çawa çûyî Kemal… Em ê biçin li wêne û nivîsên wî binêrin… Gelo ew kefiya min li ba wî bû… Dibe ku di nava eşyayên wî de be… Ez bipirsim ji Binevşê… Na lo! Jixwe halê wê, besî wê ye… Pir ji Kemal hez dike! ma kê jê hez nedikir? Kemal hevalek wisa şîrîn bû ku mirov nikaribû hindik jê hez bikira… Hezkirina mirov, li heman derî nedima… Diherikiya, bi naskirinê kûrtir, xurtir dibû… Kemal wiha bû… Lê her kes ne wisa bû… Bi piranî li gorî sînoran diçin û tên hevaltî û hestên me… Lê bi wî re hest û raman, çalakî û hevaltî, bilind dibû, xurt dibû… Sohbetek mirov ji ya din pêştir, dewlemendtir dibû bi wî re… Lê bi piranî em nagihîjin bêsînorî û kûrahiyan an heman dîsgotinê dubare dikin, di diyalogên xwe yên ferdî û gelemperî de, an jî hev dişkînin biçûk dihêlin… Ferqa wî ya herî mezin ev bû! Mirov pê re mezin dibû. Wî wek me he-

mûyan cucetiya mirov nedihewand, bi rewşa xwe ya xwezayî, nedipejirand. Lê mirov û hestên mirov, heya xeyalên mirov jî mezintir dikir. Birastî jî mirov pê re dubaretiyê nedijiya… Tu sohbetek wî jî wiha nebû… Ku rewşên wiha didît, pê re digot: “ma me wê rojê, di wê sohbetê de vêya zelal nekiribû hevalê min… Çi hewce ye ku em niha dubare û dirêj bikin!” Ax aax… Ez te rexne dikim Kemal! Divê ku tu wiha zû neçûya! Ez sîtemkar, gazinkar û dozdar im ji te! Goya me yê dewra -vedora- zivistanê jî bi hev re derbas bikira… Piştre dê bihar bihata Kemal!... Ronahiyên gund nêzik dibin… Dengê hevalan hat.

- Kendal… Gund amade ye. Me nobedar jî danî cihên ku diviyan… Tu yê biçî mala mêvan ne wisa?

- Erê hevalê Çekdar… Hûn jî biçin aliyê din…

Hevalno, em ji hev diqetin… Hûn bi min re werin heval… Binevş te nebihîst?

- Ez li hevala Zozan digeriyam… Ew jî ne li ba me ye.

- Na îşev, vê çend saetê hûn ê cuda bin ji hev… Ew bi Hevalê Çekdar re li mala din e. Tiştek nabe ne wisa?

-Tişyek nabe heval! Hema min pirsî… Ez dikarim li nobedê bisekinim ha!

- Na na, niha di nava civatê de divêtiya me bi te heye… Jixwe nobedaran bicih kirine… Lê ku tu ji bo -devê xwe anî ber guhê wê- Zinar dibêjî… Ew ê neyê hundir… Min rast fêm kiriye… Tu û Zozan jî ne hindik in ha! Rebeno, newêre li we binêre… Lê ji bo ku hûn mafdar in em nikarin tiştekî jî bêjin… Lê wiha nabe! An divê hûn, hinek cudatir, bê hêrs nêzîk bibin, an jî em wan bişînin dereke din.

- Tu cara dilê min lê venabe, li Sînan jî… Çiqas wan dibînim ew şev ango duh bi şev tê bîra min…

- Kêmasiyên bi vî awayî derdikevin carinan. Hûn jî ew qas hişk û hêrsdar nêzîk nebin… Dîsa jî hevalê me ne!

- Heval, tu tiştek…

Lê êdî gihiştibûn ber derî û koma zarok, mêr, jin û kalan li pêşiya wan bû… Pê re rû û dengê wan ê ku hinek berê, ber bi hêrs û axaftinek dijwar ve diçû, guherî û bi rûyê geş û gotinên jidil û germ peyivîn:

- Çawan î baş î dayê? Ka destê te maç bikim… Ê te jî kalo… Bisekine heval, çeka min ji te dirêjtir e… Hinek din jî mezin bibe, paşê ez ê bidim te. Werin em bi hev re rûnên… Erê heval, hevalên keçik yên wek min pir in.

Kendal:

- Hevalê mêvan! Tu baş î… Em ji te re nebêjin Metîn. Tu dizanî, di rê de çi hate bîra min? Min di dilê xwe de got niha ku dijmin bi navê wî yê mêvan bihese, dê bêje "mêvan kod adlı Metin"… û ez keniyam. Talûkeyek wiha tune ye?

- Na heval! Hebe jî xema min nîn e. Qey ez ji girtinê ditirsim? Ez Mêvan im Mêvan… heya mirinê jî, dê navê min wiha bimîne.

- Hevalê Mêvan, çima ji te re dibêjin Mêvan? Ango çîroka vê meseleyê çi ye? Henek-menek e yan?

Çavên Mêvan tije bûn… Serê xwe hejand. Fêm kir ku heval nû ye, mafdar e ji pirsa xwe… Jixwe wî jî, dixwest ku çîroka xwe bibêje. Ji heval û hogiran re. Hem dixwest û hem jî, ditirsiya ku ew xewnereşka dojehî nûber bibe… Lê dîsa jî li nava çavên wan nihêrî û çû nava wê newala dojehî… Newala ku bû sedema koçberkirina wî…

- Elî, ma nayê bîra te? Em hevalên hev ên zarokatiyê bûn… Me çiqas ji hev hez dikir! Tu çima dengê xwe nakî Elî? Ew hevaltî û dostaniya me, çawa qediya?

Çavên wî yên ku ji bîstrojan ve girêdayî bûn, nedidîtin, lê hîs dikir ku Eliyê hevalê wî yê berê, niha lê dinihêre di wî cihê binê erdê de. Ji gava din de pê re dipeyivî, bi dûyê cixara wî dikuxiya. Lê tu deng ji Elî nedihat. Diramiya. Ez çi bêjim?

Tu halekî tê de nehiştine! Mêjiyê wî, bûye weke kevir… Ez çiqas tî bûme… Û qirêj bûme. Loma ewqas can û porê min dixurê. Ez dîsa serê xwe di dîwarê axîn bidim…

Wekî ku Elo rabû piyan. Çi ofînek pê ketiye! Wekî ku aciz bûbe… Rabû piya dê çi bike gelo? Ez bipirsim:

- Elî, hevalê min ê zarokatiyê! Qey tu diçî? Lê te tu tiştek ji min re negot. Elî bi hêrs:

- Hiş be kafir, hiş be! Ez hevalê te nîn im. Tu pir dipeyivî ha!

Piştre jê dûr ket… Dengê qelpaxa wî hundirê di binê erdê de hat.

- Çû Elo, çû. Wey gidî Elo! Ez ji te re dibêjim "Heval", îcar tu napejirînî! Rast e Elo! Ez ne hevalê te me! Baş e ku ne hevalê te me… Em ne heval in. Min pir rûmetê da te got: "Hevalê min ê zarokatiyê, ye dê rojekê li zarokatiya xwe vegere"… Min xwe dixapand qey? Min digot: "hevalê min ê zarokatiyê ye dê xwe, ji nava lepên qirêj xelas bike û vegere welatparêziya xwe." Lê min xwe xapandiye. Wey gidî? Min çawa xwe xapand?

Metîn, te xwe pir xapand! Te got: "Ez tu car nakevim nava lepên

wan! Ez nabim nêçîr ji wan re! Ez bi tedbîr im… Bi rastî, ez çawa ketim nava lepên wan xayînan? Bû çend roj ku ez li vira, di vê gorê de me? Ev hal, ji mirinê xerabtir e… Ez çawa hatim girtin? Min çi jibîr kiribû? Erê erê, piştî nîvroyê bû, ez ji mal derketim… Egîdê min, bera dû min da. Min ew, hembêz kir û ramûsa. Piştre, min gazî yara xwe kir. Gazî Gulbînê kir. Ax ax! Tim jî, bêhna gulan jê dihat. Min Egîd da hembêza wê û pirsî: "Tiştek lazim e, an na? got: "weleh sêvên me tune ne. Ku tu êvarê werî sêvan bîne, dibe ku mêvanê me jî hebin." Bi ken axivîbû: "Bila sêvên zer jî, sor jî hebin, erê." Ez jî keniyabûm û min gotibû:

"Gulbîn, sêvên kesk û hêşîn jî bînim?" Gulbînê pêsîra xwe dabû devê Egîd û bi ken gotibû: "De wê de here loo! Tu jî henekan dikî!" Piştre ez leqayî diya xwe hatibûm li ber derî. Min xatir ji wê jî xwestibû û bi rê ketibûm. Bi rê de rastî texsiya hevalekî hatibûm. Em hinek peyivîbûn… Gotibû: "were ez te bibim heya kargehê! Van rojan, rojên bi mij û dûman in. Tenê û peyatî neçe!" Lê min gotibû, na riya min nedirêj e. Jixwe hindik ma. Ku dirêj bûya, ez jî peyatî û tenê nidiçûm… Weyî! çiqas canê min dixurê, ev bû çend roj? Ez ê ku pir paqij û tîtiz bûm… Gelo niha saet çend e? Xwezî saeta min di destê min de bûya! Salnameya wê jî hebû, min ê rojê jî zanibûya ka roja çendan e û çi roj e! De na loo! Ku tu zanibî çi ye nizanibî çi ye? Jixwe haya tu kesê jî, ji te tune! Tu yê bimrî herî, di vê gora bi saxî de.

Ax! Goya ez, hişyar û bi tedbîr bûm! Min digot: "Ez tu car, ji van xayin û mijokdaran re nabim nêçîr!" Lê tewş bû! Ez bûm nêçîr! Êdî ne Egîdê xwe dibînim, ne hevalê Azad û koma wî… Ne diya xwe û bajarê xwe! Ne jî xwişka xwe ya kezîzer Nazê dibînim. Keziyên wê çiqas dirêj, paqij û xweş in! Ku min jê re digot: "Naza min, çilkeziya min! Kezîzera birayê xwe!" Dikeniya, çiqas kêfa wê dihat… Ditirsim… Ditirsim ku Nazê wan keziyên xwe yên delal kur bike! Nazê, keziyên te pir xweş in xwişka min! Ku ez mirim (qirika wî dîsa tije bû) tune jî bibim… Tu keziyên xwe yên zer, bi ser bejna xwe ya dirêj de berde û bimeşe! Nebe nebe! Tu keziyên xwe, kur nekî ji bo kekê xwe! Keziyên te heyf in Nazê… Lê Gulbîn… Gulbîna min, şîrîna min bibore! Min sêvên sor û zer, ji te re neanî malê… Bibore cana min, ez venegeriyam û min dilê te êşand. Lê weleh min, nizanibû yara min!... Pîrê… Te şeva dawîn jî, dîsa dia kir û got: "Ooy Metînê min! Emrê te dirêj be înşalahh! Mûyên spî bikevin çoka te!.." Dema ku te wiha dia dikir, min digot qey, bi rastî jî, dê temenê min dirêj be û ez ê têr û tije bixebitim ji bo welatê xwe. Lê,

nebû pîrê! Qey diayên te nehatin pejirandin… Çima ez wiha bûm nêçîr… Na na pîrê, emrê min kin e! Ez ê 32 biçim ji vê dinyayê. Hem kin e, hem jî dirêj e… Lê ez hê jî porreş im… Ango "mûyên spî" nakevin çoka min… Lê bi por û simbêlên reş diçim ji vê dinyayê… Temenê min kin e…

Xwezî ez razama û qet ranebûma êdî. Hema çi dibe, bila bibe! Van pirs û ramanan min kuştin! Jixwe hemû jî bê bersiv û tewş in… Tu… Metînê zana, fîlozofê nava hevalan, ji ramanan re, ji ramînê re dibêjî: "tewş e" na? Ev çi hal e Metîn? Ez ji ku dizanim çi hal e? Xwezî ez razama! Meraq neke! Jixwe tuyê razêyî û êdî qet ranebî Metîn! Van mîratan jî çûn û nehatin. Ez îro çima ew qas tî dibim? Tasa min a avê jî vala ye. Pariyê nan jî qediyaye… Tasa min vala ye. Ez tî me. Haa hat bîra min!

Ev çend roj e ku dikim nakim nayê bîra min, çawa hatime kuştinê… Kuştin? Ango qefaltinê. Jixwe herdû jî eynî ne! Hate bîra min, ez tî bûbûm di wê roja biharê ya xemilî de… Ez tî bûm… Ez tî me! Cîger û lêvên min dişewitin… Ez tî bûm, min berê xwe da kaniya li binê rê… Ew kanî çiqas şîrîn e yaw! Ji zarokatiya min de heye. Timî ava xwe ya hênik û şîrîn û zelal dide me. Min berê xwe da ber kaniyê… Jixwe min bêriya ava wê kiribû… Ax, kanê kanî? Dema ku ez çûm, tenha bû, tu kes tunebû. Dar û berên li dorê bi carekî hejiyan. Bala min kişand… Lê min got qey, bayê li wan xistiye, loma dihejin… Erê erê. Bayekî hênik dihat di wê roja biharê de… De bes lo!... Dûre ez li ber kaniyê rûniştim. Xuşîna pelên daran hat… Darên spîndar û bîhan bûn ne wisa? Erê xuşîn hat, lê ez nezivirîm, min li paş xwe nenihêrî. Gotina Gulbînê ya li ser sêvan hate bîra min û ez keniyam. Piştre min, eynî weke berê, li rûyê xwe mêze kir. Rûyê xwe yê, di nava ava kaniyê de… Dema ku em zarok bûn, min û Nazê, me tim diçû, di ava kaniyê ya zelal de, li xwe mêze dikir. Çi xweş bû. Min avê vexwar?... Xwezî ez tî nebûma. Min avê vexwar?

Ka bise!... Na, min destê xwe, di nava avê de kire çeng, çenga xwe vekir, tijî av kir, min ê bibira ber devê xwe. Lê nebû! Min hew dît ku du destan bi qirika min girtin û gotin: "Kafirê bê Îman!" Min, destê xwe, avête berîka xwe ya paşîn ku, çardexurê derxînim… Lê nebû! Derbeyek giran li paşiya serê min ket û min êdî xwe nedît… Eynî wiha bû ne wisa?... Piştre jî min, xwe di vê gorê de dît… Çav û dest girêdayî, pê û çok zencîrkirî, tî û birçî û qirêj. Di binê vê ampûla bêîman de… Ku destên min vekirî bûna, min ê çavên xwe vekira dema ku ew biçûna… Dema ku bihatana jî, min ê dîsa weke niha bikira… Vekirîbûna baş bû!

Na, weleh nebaş bû! Ku vekirî bûna jî, ez ê di vê gorê de bûma, girêdayîbin jî… De çi dizanim. De bila êdî min bikujin… Çima kes bi ser min de nayê? Ku werin ez ê bêjim: "Ku hûn, min dikujin, bikujin. Ji min re ne xem e! Lê min di vî halê de nehêlin!"

Erê, ez ê eynî wiha bêjim. Xwezî ez razama! Zûde ye ku ranezame. De ka dîsa razêm. Gelo ji bo ku çavên min girêdayî ne, loma xewa min nayê? Ez ranazêm.

Xwe kişande hev, xist weke lepekî û hêdîka raza çû… Di xewa xwe de, kete nava geliyekî tarî û bêbinî, winda bû, çû… Nizanî ku çiqas raza an jî çawa raza. Nizanibû ku sax e an mirî ye jî… Dilerizî û dicemidî di nava wê dema xayîn û tî de… Nîşka ve veciniqî ji wê dema nediyar. Veciniqî û got qey hate kuştin, bi wan gurmînên çekan… Lê dît ku hêj dibihîze û ew gurmînên çekan hê jî didomin… Hişê wî, hate serê wî. Xwe bi xwe peyivî… Kenekî veşarî hate ser lêvên wî yên çilmisî… Dilê wî jê re got: Dibe ku heval in, jixwe digotin "Em ê bavêjin ser hêlînên wan!" Ma ev kîjan cih û hêlînên wan in? Weleh Metîn dibe ku heval bin… Na lo Metîn! Dîsa xwe nexapîne! Xeyalek xweş e, lê nabe rastî… Dîsa deng hat. Vê carê dûr diçe… Ku ew jî bin, dê biçin jixwe… Ma heval dikarin li van deran bisekinin? Ma dizanin ku ez li vir im? Ax, dengê çûkan, ew dengê xweş, çû… Xwezî çavên min vekirîbûna. Û destên min… Metîn beg, xwestekek te ya din jî tune ye… Her kes amade ye, li ber ferman û daxwazên te! Dengê lingan tê...

Hin ji wan, bi vir ve tênê… Bi xatirê te Metîn beg! Çîrok xelas dibe!... Dengê lingan nêzîk tê.

Dibe ku, Elo be jî… De kî dibe, bila bibe loo! Çi bi helkehelk in. Ne yek tenê ye vê carê pir in û bi tirkî dest pê kirin… Serleşker encax bi tirkî bipeyive… Ma cerdevan jî wiha nakin! Zimanê xwe xwaromaro dikin û nizanim çawa bi tirkî dipeyivin.

- Dia bike ku karê me derket! An na me yê te bikuşta… Tu yê bûbûyayî qurbana guleyekê û dê haya tu kesî jî, ji te tunebûya!... Ango em ê te ji vira derxin… Wî rakin!

Elî:

- Kafirê kafir! Zû rabe ser xwe!

Ma ji ku karibûya rabûya ser çokên xwe! Te digot qey, hemû hestiyên wî, zengarî bûne riziyane. Qet nemeşiyaye qet ji cihê xwe neliviyaye. Wî bi zorê rakirin û li ser piyan hiştin. Pişta wî dane dîwarê binerdîn.

Qeyd û zencîrên di qevdên dest û piyên wî de vekirin. Lê ew jî bi-

zorê vebûn, bi goştê wî ve zeliqî bûn. Piştî ku vekirin, ango "wî rizgar kirin" ji nû ve jan û êşan dest pê kir. Lê ji ber tevizandinê hêj tam şiyar nebûbû bedena wî. Ango fersenda şiyarbûnê nedîtibû hêj.

Bi çepilên wî girtin wî kişkişandin û derxistin jorê. Piştre bi bayekî hênik û bêhna gul û giyayan hîs kir ku derketiye ser rûyê axê. Ji gorê xelas bûye. Bayekî hênik û nermik dihat, lêdixist… Bêhna wî derdiket, lê dilê wî jî dişewitî. Wekî pela, li ber bayê payîzê bû. Peleke zer û weşandî… Peleke nexweş û şewitandî. Nizanibû ku kî ye, bi ku ve diçe?...

Bêhna benzînê tevli bêhna şeva biharê bû… Dengê erebeyekê hat. Derî vekirin û şixulandin, xuyabû ku ajovanê wî, hoste bû. Baş diajot. Dilê wî jê re got: "Erê Metîn, êdî jiyana te diqede!" Ê niha te bikujin. An jî li texsiyê siwar bikin, bikujin û bavêjin . Gelo dê guleyên çawa min bikujin… Ji paş ve li min bixin, an jî li nava eniya min bixin? Wekî ku di romanan de derbas dibe. Xwezî çavên min, cara dawîn bûya jî vebûna! Min bidîta ku ez li ku me, li ku dimrim… Na lo!..

Çi fêda wî heye…Te ha dît, ha nedît…

Binêre! Em ê te heya derekê bibin û paşê berdin… Lê ku tu ji kesî re bêje… Em ê te, ji kuştinê xirabtir bikin! Ji kuştinê xirabtir ha!

Bicehime biçe û li paş xwe nenêre…

Pihîn lêxistin. Dît ku wayê di nava texsiyê de ye… Bi lez diçûn, dilê wî, defa hewarê lêdixist û digot: "Çi dibe, bila zû bibe…" Ji bêhna dûyê cixarê ku êdî kişandinê jibîr kiribû, kuxiya, ew mabû ku bifetise.

Bi zorê hilmê stend, dehfekî wisa lêxistin ku weke gulokeke pembo, ji texsiyê kete erdê kete çala li kêleka rê… Bi wê avêtinê çavên wî jî vebûbûn, destên wî jî. Wekî ku wan potik û werîsan jî, êdî nema karibûn îdare bikin, riziyabûn û qetiyabûn… Bayekî hênik xwe li rû û canê wî dixist… Hinek dicemidî jî. Lê ne dikaribû çavên xwe veke ne jî xwe bileqîne… Di navbera mirin û jiyanê de mabû. Ne sax bû ne jî mirî. Ne kevir bû, ne jî bedeneke zindî! Û hest û ramanên wî, wekî pêlên behra Wanê diçûn û dihatin. Hinekan di guhê wî de behsa mirinê dikir, lê tu tiştek fêm nedikir û dilê wî jî diperpitî.

Nizanibû çiqas dem derbas bû, nizanibû ku sax e an mirî ye, şiyar e an jî di xewê de ye… Deng û bêhna erebeyan dihat. Guhê xwe dayê, wekî ku ji nû ve dibihîze… Lê hêdî hêdî şiyar bû. Hate bîra wî ku wî; ji texsiyê avêtibûn… Fêm kir ku nêzîkê rê ye. An na, dê dengê erebeyan negihîşta guhên wî. Destên xwe da eniya xwe.

Destên wî, li qapaxên çavên wî ketin… Dîsa veciniqî… Çav û des-

tên wî, ketin bîra wî û herdû jî vekirî, ango negirêdayî bûn... Hem dilşad bû, hem jî xembar. Lewre nizanibû ku çi bike bi wan dest û çavên xwe. Wekî "mirovê ewil" naşî, neçar û zarok bû. Nizanibû çi bike... Hin tişt nêzî bîra wî dibûn... Lê di nava mijê de bûn, baş nedidît... Dengê tiştekî bihîst û çavên wî bi xwe vebûn... Çawa ku vebûn, li asîman nihêrî, çûkek dît... Çûk û firîn hate bîra wî. Wî dengê gavek berê jî nas kir ê çûkê bû... Çavên wî tije bûn... Asîmanê sibeha biharê geş bû, jê re dikeniya... Çavên wî çûne ser riya qîrkirî û zeviyên li herdu aliyên rê û bajarokê ku ji dûr ve xuya dikir û darên li qeraxê bajarokê... Rûyê wî yê qirêj û çilmisî, zerbûyî keniya, çavên wî çirisîn... Erê, ne xewn bû... Sax bû, kes li dora wî tunebû! Xwe li ser kêlekê qeliband, li aliyê din jî nihêrî... Dîsa keniya her alî nas kir... Eynî kevir û dar, eynî rê û pireya ku ji dûr ve dixuyê... Her der nas bû... Lê ew, ew xerîb bû!

Hemû hêza xwe civand û rûnişt. Ketibû heyecaneke xurt... Gava ku rûnişt, derdora xwe baştir dît. Erê, erebe diçûn û dihatin... Sibe bû, dema kar û xebatan... Hêdî hêdî, dilop bi dilop, tirsa wî şikiya û dilê wî got: "Rabe Metîn, rabe ev ne xewn e! Rabe, biçe malê..

Hêdîka, weke zarokekî ku nû bi ser piyan dikeve bi gavên lerzok meşiya, çû ser rê...

Kîjan erebe bihata dê bida sekinandin û biçûya bajêr... Texsiyeke zer xuya, ber pê ve dihat... Reng hatin bîra wî... Çend roj, an çend sal bû ku ji rengan jî dûr ketibû... Di nava rê de sekinî û destê xwe li ba kir. Texsî, berê hinek li dûr sekini. Wekî ku ajovan şaşwaz bûbû û biryar nedida ka nêzîk bibe an na? Hinek paşê hat, li ber sekinî. Metîn, bi dengekî nermik û nizim:

- Roja te bixêr! Tu dikarî min heya bajêr bibî?

Ajovan:

- Erê erê qey tu nexweş î bira? Tu çima ew qas zer û lawaz xuya dikî?

Di çavên wî yên zer de dilşewatiyek dixuya. Xuyabû ku mirovtî û dilşewatî, hêj nemiribû.

- Ez hinek nexweşim bira... Divê ku biçim nexweşxaneyê, ba bijîjk... Tu taxa Enwer Paşa nas dikî? Ku tu min bigihîjînî wira pir baş dibe... Piştre were, ez ê deynê te bidim. Berê xwe jê zivirand, awirên xwe, berjêr kir... Bi bêhna xwe ya qirêj û nexweş hesiya... Erê, weke termekî ku ji ser sergoyan rabûbe, hatibe qirêj bû... Xwe qurmisand. Pirtir bû şerma wî... Lewre Mehmûdê ajovan nas kir... Di dilê xwe de got: "înşalah min nas neke!"

-Deyn ew qas ne girîng e! Bila tu baş bibî. Ma qey camêrtî miriye? Ez ê te bibim, li "taxa Enwer paşa" deynim. Nasên min jî li wira hene…

Metîn bi tirs:

- Li wê taxê, şîn hebû van rojan?

- Erê dibêm qey digotin ku "Kontrayan dîsa welatparêzekî qetil kirine, winda kirine…" Qey te nas dikir?

- Erê, çend nasên min hebûn.

Texsî ji demekî de ketibû rê û bilez diçû ber bi bajêr ve… Texsiya hevalekî ajovan, di ber wan re derbas bû û bi kêf û şahî silav dane hev… Wê demê axaftinên wan, ango pirs û bersivên wan hatine birînê… Metîn, hem dixwest ku gavek zûtir bigihîje malê, hem jî ditirsiya ku biçe… Hem li dora xwe nenihêriya jî, her der nas dikir, hem jî her tişt jê re dûr û biyanî dihat… Lewre ew bi xwe jî, ji xwe re wisa dihat… Çavên wî çûne ser rojnameya tewandî ya ku di çaviyên pêşiya texsiyê de bûn...

Veciniqî! Lewre ew rojnameyê nas kir… Rojnameya "Welatê Azad" (Özgür Ülke) bû navê wê… Bêhna wî derket, bi ajovan ewledar bû… Dît ku pirsek bi xwe hate ser zimanê wî… Pirsek daxwazî:

- Ez dikarim li rojnameyê binêrim?... Lê ajovan, jê pir dûr bû, nebihîst pirsê dubare kir.

Bibore, hişê min çûbû dereke din. Fermo binêre! Rojnameyê girt, da destê wî. Metîn, bi hesret û keserek mezin, lê nihêrî rûpel bi rûpel… Lê ditirsiya jî… Hate rûpela dawiyê ya pakrewan. Ango, bangên ji bo pakrewanan. Û agirekî bi dilê wî ket! Lerizî… " Ew, lawê çiya û mêrxasê bajaran bû! / Hevalê Xecê û Siyabend, dostê rojên giran bû… Welatparêzekî hêja, hevalekî dilagir bû! / Oxir be ji te re hevalê Metîn! Hezar car oxir be! / Bîranîna te, ronahiya riya me ye! Şehîd Namirin!" Malbata wî û dost û hevalên wî… Lê wêne? Wêneyê wî yê çar sal berê bû… Ji wêneyê xwe yê paqij, çavbelek û serbilind şerm kir… Xwe qirêj û bêçare hîs kir. Çavên wî tije bûn, lê nedixwest ku bigirî… Bi hesret û keser li xwe meze kir! Li wêneyê xwe yê berê! Wêneyê xwe yê pakrewan! Bi xwe re peyivî bi bêdengî… Lo lo Şehîdo! Tu çiqas şîrîn û delal î! Şehîd namirin! Tu yê qet nemirî! Lê ez çima sax im? Ez çi dikim li vir? Çima min nekuştin? Ez ê çawa li rûyê vê şehîdê binihêrim… Ez çi bikim ez ê… Çiqas paqij û serbilind e! Û dibêjin "oxir be ji te re!" Ez ê çawa di pey vê gotinê re biçim bêjim "Ez hatim!" Ez kî me? Ez ê niha bi ku ve biçim… Ku ez biçim malê, dê çi bibe?

Dê hemû bimrin… Ku ez biçim, wan ji şehîdê wan veqetînim! Çi

mafê min heye ku wiha bikim? dê Gulbîn û Nazê… Dayê û heval û hogirên min bêjin çi? Ez ê çawa li rûyê wan, li şînî û xemgîniya wan binihêrim? Ez ê bêjim "Ez ji goristanê hatim!"

Texsî sekinî, leq lê ket…

-Em gihîştin cihê xwe. Gotina min ji te re, tu çawa çûyî zû biçe nexweşxaneyê bira! Ez ê ji bo deyn jî paşê werim… De haydê oxir be ji te re!

- Ji te re jî!

Baş e ku ev dar hene û kes min nabîne. Û baş e ku cilên min, nespî ne. An na, dê qirêjiya wan, pir xuya bikra… Ax ax! Ev dara tûyê… Hêj li cihê xwe ye! Her tişt li cihê xwe ye. Ev kevirê reş jî, li cihê xwe ye. Her tişt nas e! Lê ez xerîb û bêhal im! Ha ketim, ha ketim! Baş bû ku ajovan min nas nekir. Ma ez ketime çi halî?

Gelo niha jî hinek neyên… Riya min nebirin, min nebin dojehê? Baş e ku mala me wiha li perê navçeyê ye… Ha, diyarê xanî xuya kir!... Gelo niha, civata şînê rûniştiye?

Divê ku ne wiha be… Dema belavbûnê ye niha… Ez ê çawa biçim û wan ji Metînê wan ê leheng û şehîd biqetînim? Hişê min diçe, ditirsim ku niha li vira bikevim û bimrim.

Ez kuştî me… Lê tu car nabim bi qasê "Metînê Şehîd" Çi gotibûn; "Ew lawê çiyayan bû!" Erê, de ka ez li derî bixim êdî… Gelo zengil dişuxule? Çiqas bêdeng e mal? Gulbîn li ku ye?

Tiliya xwe danî ser zengil… Bê mecal bû, ew mabû ku biketa… Dixwest ku biçe û xwe bavêje hembêza maliyan, piştî navê mirinê… Lê ditirsiya jî! Ku derî vebûya, dê çi bûbûya…

Derî vebû! Nazêya porkur, derî vekir! Gava ku rûyê mêvan dît, çavên wê yên mêşinî… û lêvên wê yên sor, bi şaşwaziyê cemidîn di cihê xwe de.

Destekî wê, bi derî ve ma. Yek çû ser serê wê. Hem xemgîn bû, hem jî dilgeşiyek dihate ser rûyê wê yê gilover û xweşik… Lê tu gotin, ji devan dernediket. Diya wê meraq kir, ji hundir pirsî:

- Nazê, lawo mêvanê me kî ye? Çima tu nayinî hundir?

Lê tu deng, ji Nazê dernediket. Metîn jî xwe di şaşwazî û kelegirîniya Nazê de winda kiribû.

Nazê, dawiyê bi dengekî lerzok:

- Dayê, mêvanê me şehîd e! Kekê min ê şehîd hatiye, kekê min mêvan e dayê!

Dayik bi qêrînekê pekiya ji cihê xwe, hat… Lê heya ku gihîşte ba wan, Metînê mêvan xwe, bi hesreta xwe û azadiyê, avête stûyê Nazê!

Ew hembêz kir bi bêhaliya xwe.

- Nazê, xwişka min, kanê keziyên te? Te çima keziyên xwe kur kir Nazê… Kanê porê te, pir xweşik bû xwişkê!

Nazê, bi kenê nava girînê de:

- Kekê, por dîsa tê dirêj dibe. Lê kuştî, mirî nayên! Ka tu baş be! Bila porê min tune bibin Kekê… Bila porê min, qurbana kekê min ê şehîd bibe… Dayê, ka binêre…

- Mêvanê me hatiye! Kekê hatiye!

Metîn li diya xwe zivirî û wêneyekî xwe yê mezinkirî dît… Çiqas pakrewanek delal û mêrxas bû… Berxwedan û pêşeroj hebû di çavên wî de… Li nava çavên wêneyê xwe yê ‘Şehîd’ nihêrî… Du hêsir barîn ji çavên wî…

- Oxir be Metîn! Oxir be şehîdê min! Tu çiqas gernas û paqij î… Oxir be, hevalê min, pakrewanê min!

Ev gotin jî, ji ber xwe ve hatin ser zimanê wî… Dîsa li nava çavên wêne nihêrî… Lê bi qîjîna Gulbînê lerizî, serê xwe bilind kir…

- Delalê min, ji goristanê hatiye… Tu li ku bûyî Metîn…

Diya wî Egîd ji destê wê girt û bir, da ku ji wan dengan û rûyê Metîn netirse…

Ka bêje ev çi hal e Metîn?

- Nizanim, weleh. Nizanim, Gula min! De ka min bibin ez westiya me, heliya me. Xewnereşka wî xweser bû… Eynî weke wêneyê wî bû… Xewnereşka wî bêdawî bû di nava pêlên newala jiyanê ya kûr û dijwar de jî tim li pey bû… Her ku dihate bîra wî, ew dibir û diçû, ji nû ve dikir mêvan.

Te fêm kir Hevala Binevş… Navê min ji vê derê tê… Ku got “vê derê”, destê xwe da ser dilê xwe… Vê dera min, birîndar ma bi mêvan! Ew mêvan, ez bûm! Ez mêvanê xwe… Mêvan ê min ez. Êdî bes e… Ez mêvan jî bim bi navê xwe, mêvanê rastî û pîroz û ciwan hûn in niha… Ka binêrim şîv çawa bû… Diya min ji çend saet berê de dest bi pijandinê kiribû… Lê wayê nehat…

Kendal:

-Xwedê bike dîsa pir zehmet û eziyetan nedîtibe… Dayê jî xwe dikuje… Mirov poşmam dibe ji, mêvantiyê... Mêvan û Mêvan… Zanibe ku ez, te, çend caran guhdar bikim jî, aciz nabim.

Mêvan ji hundir derket û çû… Binevş melûl bûbû bi vegotina wî… Hersê jî melûl û xemgîn bûbûn… Dibe ku li zora mirovtiya wan çûbû ew çîrok û êşiyabûn dibe ku di wê vegotinê de hin tiştên kûr, dîrokî û

pêşerojî didîtin… Hin tiştên ku çiqas bi welatê wan ve girêdayî bûn ew qas bi wan ve, bi hesretên wan ên ku nehatine ser ziman ve jî girêdayî bûn û bi vegotina Mêvan, mêvantiya xwe… Rastiya dojehtiya cîhanê, serdariya tarîtî û koletiyê kûrtir dîtibûn…

Dayê bi rûyekî ken û şîrîn kete hundir:

-Biborin biborin lawo… Ez hinek dereng mam… Li qusûrê min pîrejinê nenihêrin… Ka werin, werin kerem bikin… Ne liyaqê mêvanên min ên şîrîn be jî biborin.

Kendal:

- Na dayê, zêdeyê serê me ye jî! Tu her car wiha dibêjî… Lê sifreya herî dewlemend jî pêşkêşê me dikî… Ka tu jî were rûnê…

- Na na! Noşîcan be!... Keça min, navê te çi ye? We zûde ye keç bi xwe re nedianî Kendal! Baş e ku te vê carê anî… Wan bi xwe re bînin lawo! Keçik ziyaret in, xêr û oxiriyan tînin bi xwe re…

Kendal:

- Na Dayê, min ew bi xwe re neaniye, wan ez-em bi xwe re aniye…

Binevş:

- Na dayê, wî em bi xwe re anîne... Em di komek cuda de bûn… Niha jî nû hatine vê komê.

Di ber xwe de jî ji Kendal re got:

- Çi aciz dibim, ku hûn van propaganda-bangeşaniyên malxirab dikin li ba gel. Ango ez hevala keçik, serleşkera te me ne? Tewş in ev tişt hevaal…

Ev cara sisêyan bû ku Binevşê aciziya xwe ji hevalên xwe yên xort re dida xuyakirinê… Li zora wê diçû? Çi li zora wê diçû? Nêzîkatiya hevalên xort ên forsdar… Her heval ne wisa bûya jî… Hinekan ji wan, li gundan, li ba gel xwe bi şoreşgeriya keçikên heval, qure dikir… Tim mînak didan; binêre daye, binere heval. Vê hevala me jî wek te keçik e...

Lê kî çi dizane ku çend leşker kuştiye, di çend çalakiyan da êrîş kiriye… Û hwd… Loma jî Binevş hêrs dibû û digot: “Bila tu kes bi min, bi me forsa xwe neke, xwe qure neke!”… Carekê ew û Zozan jî bi hev ketibûn ji bo vê meseleyê… Zozanê gotibû: “Tu çima xwe aciz dikî… Bila xwe bi me qure bikin, forsê bikin… Ma ne hevalên me ne? Ku bi me dilşad û şanaz nebin, dê bi kê bibin… Tu jî pir ecêb î… Qey ku me biçûk bidîtana baştir dibû ?” Bi hêrs gotibû: “De tu jî çi seranser diramî… Ku wek te be divê em niha “hemd û şukur” bikin ji bo ku me biçûk nabînin, xwe bi me qure dikin...

Wek zarokan ji hev xeyidî bûn du rojan nepeyivîbûn bi hev re…

Loma dema ku Kendal jî wiha gotibû; Binevşê di dilê xwe de gotibû: “Tu jî heval! Min digot qey tu ne wisa yî!” Û hêrsa xwe anîbû ziman…

Mêvan jî hate hundir…

- Noşîcan be hevalno!...

Silavên Gulbînê ji we re hene. Dixwest ku were we bibîne, lê hinek nexweş bû…

Pir dixwest ku te jî bibîne hevala Binevş û got: “Cara hatî, bi taybetî ew… Mêvana min e”

- Ser çavan silav û vexwendin wê… Tu jî gelek silavên min jê re bibêjî… Min jî dixwest ku wê bibînim…

- Eleykum selam! Ka tu jî were nan bixwe.

- Na, spas! Jixwe hevala Binevş jî min dawet kir… Ez têr im…

- Egîd li ku ye Mêvan? Xwezî me ew bidîta…

- Jixwe ez çûm ku wî bînim… Lê Oblomov beg, razabû… Bi roj qet nasekine… Loma bi şev jî dikeve û şiyar nabe…

- Tişt nabe… Ku baş e xem nîn e, bila ji xwe re razê.

Binevş, ji ser sifrê rabûbû, li ser mîndera li ber dîwar rûniştibû.

- Hevalê Mêvan, te çima ji Egîd re got “Oblomov beg!” Ma ne zarok e hêj?

Mêvan keniya bi hirîn… Piştre got:

- Weleh biçûk e, zarok e hêj… Lê ez dîsa jî, jê re wiha dibêjim pir radizê… Çawa bêjim…

Kendal:

- Te pirtûka Oblomov xwendiye ne wisa?

- Erê. Ango ez rewşa wî, pir, hindik dizanim.

Binevş:

- Hevalê Mêvan, înşalah tu jî wek meseleya “Navê min li te, kumê min li serê te” nekî… Ango tu, Oblomovtiya xwe di hebûn û kesbûna rebeno de binav nekî!

Mêvan dîsa keniya… Bi kena wî dilşad dibûn ew… Rojên wî yên dojehî, rojên wî yên li goristanê dihate bîra wan…

- Heval, hûn çi yeman in! Ya star ji destê we!... Ez tilar… Oblomov nîn im, lê dîsa jî tu mafdar î… Dibêjim qey ez navê xwe li wî dikim.

Kendal:

-Tu ev gotina Lenîn dizanî ne wisa? Dibêje ku: “me sê şoreş jî pêk anîn… Lê Oblomov xelas nebûn, neqediyan. Ku ji bo Rûsyayê ev rastî derbasdar be, ji bo welatê me hay hay derbasdar e! Her yek ji me çend

"Oblomovên" heftreng, di xwe de dihewîne ne wisa?

- Erê heval, mesele pir alî ye ango… Dibe ku niha hevalê Mêvan, poşmam bibe ji bo ku vê gotinê şixuland… Wekî ku bêje: Eman ji destê we! Mirov newêre henekekê jî bike ji destê we!

- Na heval, estexfîrulah! Li xweşa min çû ku we wiha li ser peyivî… Careke min ev henek kiribû... Li hinek hevalan… Ew jî gerîla bûn ha!... Lê çawa bêjim? Ew heval nexwendî bûn. Bi gotina we "gundî" bûn. Qet fêm nekirin… Gotin "Tu dibêjî çi heval… Ew kî ye?" Ez rastiyekê bêjim ji we re… Dema ku min nezantiya wan hevalan dît pir bi ber ketim û min şerm jî kir!... Ne ku ez wan biçûk dibînim ha! Şervan û lehengên me, delalên me ne… Lê xwezî nezan, nexwendî nebûna… Mirov dixwaze ku rêberên mirov zana bin! Ango bi qasî ku gernas in, zana û ronak bin jî…

- Te rastiyek girîng daxuyand Heval! Ji bo vê semîmiyeta te ya ronakî, spas dikim. Bi rastî jî girîng e… Xwezî her kes jî wek te bûya… Bi nêzîkatiyên ronakî encax şoreş bi kûrahî ango di bêdawîtiya dil û ramanan de pêk were… Jixwe ku her kes wek te bûya, dê hevalên wisa nezan xwe biguhertana… Ango dê nezantî biheliya, hem di nava me de, hem jî di nava we de… Lê mixabin ne wiha ye! Nezantiyên me hev xurt dikin.

Binevş:

- Baş e baş, Hevalê Mêvan! Te ji me re got "hûn yeman in!" Lê tu jî hindik yeman nîn î… Ez jî dilgeş bûm bi vê rewşa te… Ji ber ku nezantî nahêle ku felsefe û rastiya şoreşê jî were fêmkirin... Nahêle ku mirov Serok jî fêm bike… Lê min ê tiştek din jî bigota; nezantî, tenê ji nexwendinê nîn e! Mesele kesbûn, kûrbûn û mezinbûna dil e jî… Ango hin hevalên xwenda jî pir nezan û seranser in carinan.

- Rast e heval. Ên wisa min bi xwe jî dîtine. Heval, çima hûn cixarê xwe vênaxin… Ev tûtin pir xweş e ha! A hevalekî min e… Bi taybetî hatiye ajotin û çinîn… Pêxin weleh ez ê bi heste bigrim! Tu jî pênaxî hevalê nivîsmend? Vê hevalê nivîsmend qet nesekinî, hatiye nehatiye dinivîsîne… Keniya û got:

- Na, ez ne nivîsmend im… Ku nepeyivim jî guhê min li sohbeta we ya xweş û germ e… Nivîsmendî tune li ba me hevalê Mêvan! Divê ku tu bizanibî.

- Rast e ez dizanim… Ji bo her tiştî "Dinya bi dor e" li ba we… Hûn her tiştî bi dorê dikin… Loma min got qey, dora te ya nivîsmendiyê hatiye…

Kendal:

- Her tişt bi dor e… Lê her tişt ne bi dor e jî! Mesele meseleya xeyd, ne

bi dor e… Nexweşiyên kesbûniyê ne bi dor in! Oblomovtî ne bi dor e… Fenektî ne bi dor e.

- Hoy hoy hevalno… We dîsa min mat kir! Lê ez kêfxweş jî bûm… Ango hûn, sirên di nava xwe de jî, ji min re dibêjin… Min liyaqê vê dibînin.

- Hevalê Mêvan… Di bingeha xwe de em jî bêriya rewşên bi vî awayî dikin. Ango em jî naxwazin ku tim ji gelê xwe re propagandayan bikin… Ew rewş, veşartinek, ango sansurek tîne bi xwe re… Tu şaş fêm nakî ne wisa? Ne ku propoganda ne rast in! Rast in, rastiyên pîroz û dîrokî ne! Lê tenê nebes in! Ango rastiyên jiyanê, mirovan û dîrokê; tenê propoganda nîn in… Tenê propoganda, nikarin hemû rengên jiyanê bidin xuyakirin… Ger ku mirov, xwedî kesbûn û îradeyê bûna… Civak li ser vê bingehê ava bûbûya, qet hewceyî propogandayê jî nedikir… Lê na! Ne wiha ye… Malxiraba rastiya dîrokê kevalek şikestî, tevlihev, tarî û lal kiriye para me… Loma jî ku em mecbûrê propogandayan bûne… Mînak, mirov di propogandayê de tenê aliyên rastiyan ên xurt û ronahî dide xuyakirin… Aliyên asteng, tarî û bêxêr nayên xuyakirin. Divê ku neyên xuyakirin. Mesele mirov di propogandayê de nikare îxanetê bi berfirehî bide xuyakirin. Lê îxanet heye û her roj… Canê me dikuje, karên me zortir dike. Mesele mirov di propogandayan de, kêmasiyên me yên giyanî, ramanî û kesbûnî û şervanî nikare bide xuyakirin.

Wekî ku te niha got: Hinek tişt, dibine sir, di propogandayan de… Lê na rast in jî! Van nebesiyên ku me ji te re jî got, rast in… Lê nayên gotin, divê ku mirov nebêje… Lewre civaka me nezan e… Nezantî jî kor û tarî ye, nikare rastiyan bibîne û fêm bike… Lê mesele hevalek wek te ne wiha ye… Te dît me çawa bi te re parve kir… Biborin, ez pir peyivîm.

Binevş:

- Na, ji bo propoganda nebû em aciz nebûn! Tu dizanî hevalê Mêvan, em jî pir bêriya axaftinên wiha rasterast dikin… Dixwazin ku carinan derdê dilê xwe bêjin… Lê nabe… Mînak; divê ku em tim rûgeş, çalak û bêkêmasî bin… An jî rewşên derveyî van mijaran, çawa bêjin, veşêrin, nebêjin… Lewre gelê me, civaka me ne amade ye ji tiştek wiha re… Ango rûyê gerîlayê rastî ku heye cuda ye, yên ku gel dixwaze, cuda ye… Gel, rûyekî pir delal û leheng afirandiye û mafdar e jî… Lewre gerîla wiha ye, delal û leheng e! Lê tu rastiya dîrokê ji van bûyeran, ango tenê ji delalî û lehengiyê pêk nayê… Loma gerîla jî tenê delalî û lehengî nîn e… Rastiyek dîrokî ye, hemû êş, jan, tarîtî û birîndariyên dîrokê di nava

xwe de dihewîne… Lê nabe, mirov nikare van rastiyan beje.

- Ooy hevalno, em ji ku hatin li ku! Dema ku ez van tiştan diramim pir li zora min diçe! Her tişt pir li zora min diçe. Li aliyê din wekî ku we jî got, gel jî mafdar e… Gerîla jî mafdar e… Ê ku ne mafdar û zalim e, dîrok e…

Îskanên we vala bûne… Ka ez tije bikim… Min çawa jibîr kir!

- Na heval, spas! Destê me jî hene… Ka tu jî ya xwe bîne.

- Min teyb jî venekiriye… Em biliyê sohbetê bûn. Hûn ji Aram hez dikin, ne wisa? Bila “Ay dil” bêje. Hûn guhdar kin, ez diçim û têm hevalno.

Binevş:

- Ev heval jî mînakek awarte ye… Helal be! Ku hinekên din bûna piştî ew bûyera ku hatibû serê wî dibe ku dev ji her tiştê berdana hişê xwe jî winda bikirana… Lê ew…

- Erê… Loma ez pir jê hez dikim… Ew jî di rastiya xwe de, gerîlayek e. Wekî ku rastiya me ew temam dike… Ango parçeyek ji me ye ew jî miriye û ji nû ve, vejiyaye.

- Ez hatim hevalno… Min bi zorê we ji destê diya xwe xilas kir! An na dê bihata û “operasyonek” vekira li dijî cilên we. Te gelek baş kiriye.

- Ez ê tiştek ji we bipirsim… Ez dev ji şermoktiyê, feodalîtiyê berdim… Dibe ku dazarokek min çêbe. Ez dikarim Binevş, an jî Kendal lê deynim? Li gorî zayendê ango… Hûn dipejirînin? Bila li we biçe, ew jî. Delal û leheng be.

-Ji bo me şeref e, şanazî ye ev daxwaza te… Lê nebesiyên me jî hene… Mesele ez carinan dîno-mîno me… Carinan ker û lal dibim… Bila zarokê, reben nekeve bin siya me…

- Ez jî carinan pir xeydok dibim û carinan jî pir bêsebir, hişk û bêdeng dibim… Heyfa zarok nîn e… Lê wekî ku heval got, dilşadî ye ji me re zaroka te, an jî zarokê te, bixêr û ser çavan were.

Band digeriya, stranên Aram diherikîn nava wê civata şevê… An jî difiriyan diçûn, digihiştin asîman… Ku digihiştin asîman, dilê mirov jî bi xwe re dibirin… Jixwe ew ozanê mezin, Aram jî nebûbû dilê Kurdistanê, dilê tevayê rojhilatê, Ermenistan û Qirgizistanê… Kîjan împarator û serdar, dikaribû dengê xwe bida ber dengê wî… Weke wî dil ronî û geş bikira… Ew çemekî rojhilatî bû, diherikî hemû dilên evîndar û xembar… Strana “Ay dil û lo lo pismamo” Kendal girt û bir welatê bîranînan… Ew welatê dûr û xweş… Kemal hate bîra wî… Dîsa di dilê xwe de got: “Divê ku te wiha nekira Kemal! Ma ez ê çawa bê te Aram guhdarî bikim…” Hogir hate bîra wî… Di çend şevên sar û tarî de, dilê

wan, bi dengê xwe yê zelal germ kiribû… Jixwe têkiliya wan a destpêkê bi dengê Aram çêbûbû… Herdu jî pir dûr bûn ji hev… Tew awirên tûj dinihêrtin li hev… Lê rojeke biharê Hogir, li hewşa dibistanê, li binê darekê rûniştibû… Dengekî pir xweş bihîstibû. Deng û stranek xweş… Dengekî nerm, kûr, stranek kûr… Ji stranên Aram, pê re rabûbû, li dora xwe nihêrîbû… Lê kê bibîne û çi bibine! Ê ku wê strana xweş digot Kendal bû… Kendalê ku navbera wan nexweş bû û tim dilê hev diş-kandin… Çawa bûbû ku herduyan ji heman hozanî û heman stranî hez kiribûn? Şaşwaz bûbû… Piştre ber pê ve çûbû û gotibû “qey tu jî kurd î, ji Aram hez dikî? Dengê te pir xweş e!” Vê carê Kendal şaşwaz bûbû û li rûyê wî, li nava çavên wî nihêrîbû… Dîtibû ku ew gotin ji dil in. Piş-tre rabûbû û nizanibûn çawa û çima lê bi awayekî kelogirî hev hembêz kiribûn… Gavek bi rûmet bû ew gav. Lewre ew gav bûbû bingeha hev-altiyek bêdawî… Ango wê stranê û wî ozanê, hevaltiyek delal afiran-dibû di nava wan de… Loma jî carinan digotin: “vê hevaltiyê bi stranekê û bi hozanekî dest pê kir! Em tu rexne napejirînin” Temenê hevaltiya wan jî dirêj bû… Wekî temenê stranê, ozanî û muzîkê bû ango temenê hevaltiya wan… Wê direjtir jî bûbûya. Lê nebû, mirinê riya wan birî… Hogir şehîd ket. Temenê Hogir bîst û du salî ma!

Wek stranê dirêj nebû bi sedsalan… Lê nerast e. Dîsa jî dirêj bû temenê Hogir… Ji hemû stranan dirêjtir… Lewre temenê wî, ciwantiya di nava aheng û awaza dengê Aram de bilind dibû digihîşt dilan, dihihîşt ronahiya çavan û dengê wî tim hêvî û bêriyên Hogir digotin ji mirovan re.

Loma jî dîsa wî diramiya wî hîs dikir… Wî dijiya Kendal. Carinan jê re digot: “Binêre! Ku min stran negota, tu yê min nedîta, nas nekira û dê ev hevaltî tunebûya.” Wî jî bi ken digot: “Ku min jî, ji stranê hez ne-kira… An jî ku dile min ker û lal bûya dê ev hevaltî tunebûya…” Ken-dal dîsa hestyar bû û ji xwe re got: “Dilê min di di navbera Kemal û Hogir de diçe û tê… An li ba wî me, an jî li ba wî!”

Binevş:

- Hevalê Kendal, ev stran a Kemal e ha!

Kendal bi dilşadî:

- Erê, ez dizanim. Lê min ji tirsan ji te re negot… Şaş fêm neke ha! Min nexwest ku bînim bîra te… Hêj nû ye… Ango birîna wî, û birîna me hê pir nû ye…

- Ma qey bi zeman re kevn dibe? Çiqas dem here jî dê nû bimîne… Em sibê diçine cihê me yê bere ne wisa? Ez rê nas dikim. Zozan jî nas dike.

- Çekdar jî nas dike… Em ê sibê biçin… Rast e, kevn nabe… Derî lê dikeve!

- Hevalê Kendal, em ê êdî ranebin?

- Erê min ê jî ji te re xeber bişanda.

Mêvan çûbû amadekariya xwarina wan a ji bo sibê dikir… Bi destên tije hat.

Vana bicih bikin hevalno! Ka çentê xwe deynin, ez bicih bikim.

- Na Heval, spas! Em dikarin bicih bikin.

Êdî dema xatirxwestinê hatibû… Şeveke din, çîrokeke, din straneke din jî xelas bûbû dîsa. Dayê yeko yeko wan hembêz kir… Mêvan jî wan hembêz kir. Dema ku Mêvan Binevşê hembêz kir…

Binevşê got:

- Tu dizanî Heval! Carinan hevalên gundî yên mêr, dibêjin qey ku em jî xort in me wisa sert hembêz dikin, radimûsin. Dema ku dibînin wayê em keçik in şerm dikin, soromoro dibin û cih nabînin ku xwe veşêrin! Lê yê te ne wiha bû. Ne “qeza” bû ?

- Na heval! Em xwişk û bira, heval û hogirên hev in… Ku em hev hembêz nekin, em ê kê hembêz bikin?

- Rast e heval.

Kendal bi ken:

- Rast e hevala Binevş? Çawa rast e? Ku wisa be divê hûn hemû hevalên xort jî hembêz bikin… Hem ên me, hem jî yên ji gel

- Way! Te ev raman ji ku anî hevalê Kendal! Ez bawer im ku tu dizanî ez çawa û çima dibêjim “rast e!”

- Erê erê… Em bi rê kevin êdî… Dem, ne dema şer e.

Di tarîtiya gund û kûrahiya şevê de gihiştin hev. Parçebûnî qediya. Dema ku digihiştin hev û parçebûnî diqediya dilxweş û ewledartir dibûn… Dema ku parçebûyî bûn; tim xetere û talûke li pey wan bû lewre… Lê pirê caran jî parçebûn bingeha gihiştin û yekbûyînê bû.

Binevş li Zozanê digeriya… Cara çendan bû ku piştî veqetînên kin jî bêriya wê dikir. Çavên wê lê digeriyan, pirs dihatin ser zimanê wê…

- Merheba Hevalno!... Yeko yeko. Merheba dane hev… Û dîsa bûne rêz, rêzek ji ciwanan, ji dilên bi şewat, rêzek çav li stêrkan, rêzek berî li çiyayan…

Yekê destê xwe hêdîka li ser milê Binevşê xist di nava tarîtiya riya şevê de. Veciniqî û li paş xwe vegeriya… Zozanê bi dengê nizm got:

- Xwedê li te xistî! Ev çend car e ku bangî te dikim, tu li ku bûyî, te çima nidibihîst?

- Ay tu yî! Min jî çavên xwe li te gerand, lê tu nexuyayî.

Ji hev qetiyan, ango her kes çû cihê xwe… Ji hev re negotin "min bêriya te kiriye." Lê fêm kirin ku bêriya hev kirin e… Bilez dimeşiyan… Zêdetirîn bi lezê dihatin ser xwe… Hebûn û cudabûna xwe hîs dikirin. Bi demê re, bi çem û bayê re di pêşbaziyek de bûn lewre… Bi lêdana dilan re jî… Gund û şev ji wan dûr diket… Lê çiya û berbang nêzî wan dibû. Ango deştê û şevê, gund û bajarên li dûr, wan bi rê dikirin, lê çiyayan û sibeyan sînga xwe ji wan re vedikirin…

Pişta wan li deştê û şevê, rûyê wan li pêşerojê, berê wan li çiyariyan bû… Ji newalan derbas dibûn. Ji cuh û newalên ku ava wan hindik mabû, li ber ziwabûnê bû derbas dibûn… Ji çeman derbas dibûn… Çemên dîn û har ku wan şilopilo dikirin… Ji zeviyan, ji daristanan, ji strî, dirî û keleman… Ji gul û sosinan, ji kulîlkên payîzê û ji giyayên ku bi tava payîzê ya emirkurt xapiyane û bejin avêtine, derbas dibûn… Lê ji xwe jî derbas dibûn… Ji daxwaz û bêriyên xwe, ji bîranînên xwe yên li deşt, bajar û gundên dûr… Lê ji xwe jî derbas dibûn… Ji siya xwe, ji nexweşî û biçûkatiyên xwe, ji striyên xwe… Ango navekî wan jî "Derbas bû!" Tu kes bi qasî wan, nikaribû derbas bibûya lewre… Tu kes wekî wan derbas nedibû.

Gihiştibûn ber darên guvîjan. Darên kevnare û aderî, darên bi fêkî… Dengê darniqrokekî hat ji ser darekê… Piştre pisîkekî kire newînî… Piştre herdu deng jî hatin birîn… Tenê dengê pel û şaxên daran ma… Berbangê hêj rûyê xwe dernexistibû holê. Lê hatina xwe dida hîskirinê bi her awayî… Bêhnên xweş dihatin.

Ji nişka ve dengek hat… Dengekî bê tedbîr… Cihê wan bilind û asê bû… Lê dîsa jî rûniştin di cihê xwe de. Xuya nebû ku, dê kêngî çi biqewime… Guhdar kirin. Hinek paşê Çekdar hat, xuyabû ku pir lezandiye, bi zorê hilmê distend… Li ba Kendal rûnişt. Yên din jî ber bi wan ve çûn, rûniştin…

- Me digot qey dijmin e… Em hêdî hêdî nêzî cihê ku deng jê dihat, bûn… Li biniya newalê ye… Me xwe bi erdê ve dikişand. Lê me çi bihîst. Yekî bi bêhalî digot: "Nemire heval, heval nemire!" Me dîsa fêm nekir… Piştre dengê hevalekî din hat… Digot: "Na heval, xem neke! Kes namire, heval nemiriye!" Lê ew dîsa dinaliya û digot: "Nemire! Me wê demê fêm kir ku mesele çi ye? Lewre hevalê Nûhat… Me ew bihîstibû… Piştî şehadeta hevala Rûçem dîn bûbû. Belkî jî ji xwe çûbû… Me nizanibû ku bi çol û çiyayan ketiye, bi aliyê me ve tê.

Kendal:

- Niha li ku ye?

- Li berjêrê me ne. Hevalek me jî li ba wan e… Em ê wan bi xwe re bibin ne wisa?...

– Erê… De ka em rabin…

Rabûn, lê her kes ketibû bêdengiya xemgîniyê wekî ku ew xeber guleyek bû li wan, li berbanga wan, li kena wan ketibû… Wekî ku di hebûn û kesbûna Nûhat de, ew dîn bûbûn, bi çolan ketibûn, wî fêm dikirin, derdê şehadetê pir zor bû lewre… Derdê evînê, derdê veqetînê! Dixwestin ku gavek zûtir bigihîjin balê. Ji şevê jî dûrtir, ji keviran ker û laltir bûn niha… Gihiştin ba wan… Lê rênas nesekinîn û ber bi jor ve lezandin. Nûhat bêdeng bû… An westiyabû, an jî diramiya… An jî diqîriya, lê kesî nedibihîst… Meşiyan, kişiyan jor… Te digot qey ew û roj jî ketine pêşbaziyê… Her ku dilezandin, roj nêzîktir dibû… Şeva wan destpê dikir. Şeveke nû û dirêj. Pir westiyabûn jî…

Di demên wiha de lingên mirov li pey mirov nayên… Bi taybetî jî ku mirov li malên germ û nerm be pirtir xewa mirov tê…

Gihiştin cihê xwe yê di taldeya daristana bilind de… Dinya ronî bûbû… Tîrêjên rojê, çavên Nûhat ên xweş û reş diçirisandin. Li rojê nihêrî… Destê xwe dirêj kir… Piştre li nava destên xwe nihêrî… Gelo çi didît, çi dibihîst? Gelo çawa gihîştibû wê dîtina ku tu kesî nedidît… Çawa, çawa… Çima wiha dîn bûbû… De ka bêjin, ew çima wiha bûbû?

A wî, rêwîtiyek bû ku nedixwest bipejirîne… Rêwîtiya bi mirî re, rêwîtiya bi mirinê re… Reqsa bi kuştî re, reqsa bi kuştinê re an jî… Mirina xwe, mirina mirovan ku pir jê hez dikir, li pişta xwe kiribû. Dilopên xwêdanê, yên ku ji eniya wî ya fire dihatine xwarê diketin çavên wî û dişewitandin… Hêsirên çavên wî, dibûn cihokek biçûk, diherikîn hinarikên wî. Dûre digihiştin stûyê wî, ji wir jî derbasî ber sînga wî dibûn, wî dicemidandin, vediciniqandin.

Bi zorê gavên xwe avêt û dîsa dest bi axaftinê kir!

- Tê bîra te heval? Havîna çûyî em li vê derê mabûn… Tu pir tî bûyî, qirika te ziwa bûbû. Ji bo ku berjor e pirtir zorê li me kiribû tîbûniyê û Ehmed jî li vira bela xwe di me da bû… Tu aciz bûbûyî te gotibû: “Tu ne mecbûr î ku tim, bibî siya li ser rojên me yên xweş! Bisekine, êdî bes e!” Tu min dibihîzî ne wisa? Riya me hindik ma. Xwezî hewa wiha sar nebûya! Tu dicemidî ne, dicemidî? Baş e, bersiv nede… Tu dikarî bersiv nedî… Ez nacemidim pir zêde xwêdan didim, şil bûme niha… Vê xwêdanê, çavên min dişewitîne.

Bisekine ez paqij bikim, an na ber xwe nabînim…

Binêre. Çivîk koç dikin ref bi ref… Dema ku ez biçûk bûm jî, min ji wan hez dikir.

Min dixwest ku firîna wan temaşe bikim. Ez xemgîn jî dibûm. Wekî ku ez neçûbûm bi wan re nediçûm, li paş dimam, dereng dimam… Ango wekî ku ew çûbûn, lê ez mabûm di nava tenêtî û derengiyê de… Van çivîkan, yên derengmayî ne. Di nava wan de, ango di cîhana çivîkan de jî, yên ku di dema wê de karên xwe nakin û dereng diminin, hene. Dibe ku jibîr dikin… Piştre berdêlên giran jî didin. Lê di her tiştî de yên ku herî dereng mane em in… Dibe ku navekî me bibe “ên ku dereng mane!” Derengmayîn; negihîştana baskê kevokê, rengê kulîlkê, dengê bilbilê ye. Derengmayîn û derengmayîn!

Min te aciz kir? Çi dizanim! Sebra min nayê. Tu hiş bûyî, bêdeng î. Tiştê ku ji min re wek barek giran tê û min diwestîne, ev bêdengiya te ye. Tu çima bêdeng î. Dibe bersivê nede min, bide xwe. Tiştekî bêje qey çi dibe! Bipeyive da ku hinek guhdarî bikim… Bû du roj, bû du roj ku min, dengê te qet nebihîst Rûçem!

Bibore! Naxwazim ku te aciz bikim. Dibe ku te bêriya derengmayînê kiribe. Dibe! Em mirov in. Carinan mirov hiş be, bêdeng bimîne… An jî bi bêdengiyê di bêdengiyê de biqîre bigirî, bixwaze bi bêdengiyê hez bike… Ez jî carinan bêriyê dikim, bêriya bêdengiyê. Lê dem tune, derfet tune… Ango derfeta hişbûnê jî tune! Lê carinan çivîk jî hiş dibin.

Loma jî ez naxwazim ji te re bêjim: “Tu çima bêdeng bûyî?”

Şaş fêm neke ha! Tenê dixwazim bêjim ku min bêriya dengê te kiriye… Dibe ku tu niha diramî, dibêjî “divê ku ez bêriya bêdengiya te jî bikim” Dibe… Divê ku mirov hev, wisa fêm bike ku bêriya bêdengiya hev jî bike… Lê te dît. Te carinan digot tu carinan dibêjî; “Em ji seranserî û klasîzmê xelas nabin!”… Ev rastî bingeha pirî tiştan e…

Soz didim te! Ez ê bêriya bêdengiya te jî bikim! Ez ê gotinên di bêdengiya te de, qêrîna di bêdengiya te de û hezkirina di bêdengiya te de fêm bikim!

Ez hinek pişta xwe bispêrim vê darê vê darê tam li gora dilê te ye. Darek pir kevnar, stûr û bilind e… Wekî ku min dîsa bihîst, te got: “ka li bilindî û şanaziya vê darê binêre!” Te wiha got, erê… Birastî jî darek xweşik e şanaz e. Kî dizane ku di biharê de, çiqas xweş dixemile? Em wê demê jî werin? Em werin ne wisa? Em werin û vê rêwîtiya xwe ya di zemherê de bibîr bînin… Helbet dê wê gavê vê dara bihîvê rengo rengo be…

Kulîlkên bihîvê pir xweş in! Jixwe çi ma ji biharê re heval! Em di dawiya zivistanê de ne… Wekî ku me zivistanê xelas kiribe. Di demek wiha de mirin tê carinan! Mirin ji biharê ditirse ne wisa?

Bibore heval, qey çi dibe bibore! Ez çima qala mirinê dikim…

Çi pêwendiya wî bi me re heye? Bi vê dara bihîvê ya xweşik re? Çi pêwendiya mirinê heye bi rêwîtiya me re? Li min bibore, mihriv, li min bibore! Ez dîsa bê ramîn diaxivim!

Dizanim ku tu ji mirinê hez nakî. Ez jî hez nakim… Ma mirov tu car qala tiştên ku jê hez nake, dike? Dema ku qal bike ew tişta ku jê nexweş e tê, xwe li stûyê wê/wî dilefîne ne wisa? Û tune dike. Em westiyan. Me bêhna xwe veda… Em biçin newisa? Jixwe hindik ma ji cihê me yê hevdîtinê re… Ez dizanim, tu jî pir hez dikî ji wê newalê… Tu yê vê carê jî, ava wê bixwî çengên xwe û stranan bibêjî? Tu yê bibêjî? Baş e, ku tu naxwazî, nebêje. Binêre, hêlîna çivîkê! Xûsî ketiye ser…

Dixwazî bînî… Tu nacemidî di vê xûsî û sermayê de? Dicemidî heval! Baş e, bersiva vêya jî nede… Ez jî westiyam ji axaftinê…

Bi bêhaliyekî giran, xwe avête erde.

- Merheba hevalno! Hûn jî ranezane… Ez li ba Omer bûm… Hevalê ku du hefte ye li ba Nûhat bûye, nobedarê wî, pir bandorgir bûye… Nikare birame, bisekine. Ditirsim ku ew jî… Min bizorê wî di xew re kir. Nedisekiniya, dixwest ku ji ba Nûhat ranebe.

Kendal serê xwe bi xemgînî hejand:

- Te baş kiriye… Divê ku têr bêhna xwe bidî. Hevalan di van şeş mehan de bi dorê lê nihêrtiye ne wisa? Carinan komek, carinan hevalek bûye nobedarê wî.

- Baş kirine ku wiha nebûya dê çi bûbûya! Dê demek dirêj li ba me be ne wisa?

- Erê.

Kendal li nav çavên Binevşê nihêrî… Dizanibû ku pir baldar e li gel rewşa wî.

- Ez ê carinan pê re bipeyivim… Li balê bimînim… Ez bawer im ku dê rojek hişyar bibe ji vê dînîtiyê… Li me vegere.

- Hevala Binevş, ez naxwazim bêjim ku “hevala Binevş, tu jî wek hemû hevalên keçik hestdar î…” Lê înşalah wisa be wisa be… Carinan bipeyive pê re… Carinan.

- Hevalê Kendal, ez jî tevli hevala Binevş dibim… Hêviya min jî heye ku baş bibe… Bêdengiyek kete navbera wan. Nûhat jî sekinîbû… Milên

xwe dabû ser çavên xwe… Wekî ku razabû… Firokek rêwiyan derbas bû li jorahiya asîman… Her sê tenê rûniştî mabûn… Westiyayî û bêxew bûn… Xewa wan dihat. Lê wekî ku tiştek hebû, nedihîşt ku razên… Çekdarê esmer ji gava din de bi rih û simbêlên xwe yên gur dileyîst... Carinan berê xwe bi aliyê Nûhat ve dikir… Wê demê awirên Binevşê û Kendal jî didît… Her sêyan bi hev re dinihêrî ew dem… Dîsa nihêrî:

- Ax hevalno. Rastiya hevalê Nûhat dide xuyakirin ku, şer tenê bi guleyan mirov nakuje… An jî piştî ku mirov dimire, tê kuştinê her gav nakeve binê axê… Carinan wiha jî dimire…

Binevş:

-Ez jî viya diramiyam heval… Ku şer tunebûya dê ev heval wiha nebûya… Ango şer, çiqas ku mecbûrî-neçarî û pîroz e, ew qas jî zoriyên wî, berdêlên wî yên giran hene.

- Erê hevalno. Divê ku hûn şaş fêm nekin… Lê gava ku min hevalê Nûhat dît… “goriyên-qurbanên- şer” hatine bîra min… Ev têgeh wiha tê fêmkirin… Ên ku dibine gorî ji şer re…

- Hevalê Kendal, min ê Mêvan bipirsiya, çawa bû… Min vê carê pê re sohbet nekir… Tu dizanî çima navê wî Mêvan e Hevala Binevş?

- Erê, ez hîn bûm.

- Hûn dizanin hevalno, meseleyek min jî wiha heye. Ne tam wekî ya Mêvan e… Li ser wêne û banga şehadetê ye… Loma jî dizanim ku ew derûnî çiqas zor e.

Her duyan bi hev re:

- De bêje hevalê Kendal. Jixwe em tenê mane… Xewa me nayê. Haydê heval.

- Ku min zanibûya hûn ê ew qas bilezînin! Him him! Kanê mîkrofon! Dê serokomar serboriyeke xwe vebêje!

Binevş:

- Van dar û beran hemû mikrofon in serokomar! Fermo!

Çekdar:

- Ez bawer im ku li metropolan derbas bûye… Hemû bîranînên nexweş, li metropolan derbas dibin.

- Wayî! Tu ji ku dizanî hevalê Çekdar?

- Dizanim, hûn bajariyên Küçük burjuva nizanin… Ji ber ku hûn pir hez dikin ji wan metropolên qirêj.

- Hevalê Çekdar, ev çi gulebaran e… Goya heval, dest bi meseleya xwe dikir û ez kengî bûme heyranê metropolan.

- Hevalno, xêr e Çekdar! Hevala Binevş tiştek negot ji te re… Te çima wiha wek Biksiyê barand?

- Na heval, hevalên bajarî pir xwe û bajarên xwe diecibînin… Ji bo ku hemû wiha ne… Hevala Binevş jî wiha ye.

- Mala te xirab e Çekdar… Te niha xwe kir gundiyekî wisa ku divê mirov bi hemû çekên küçük burjuvatiyê eniyek deyne û êrîşên te bike… Lê ez wiha nakim. Gavek berê tu tevli min dibûyî… Te ev gotin ji ku anî? Û tu qet jî ne gundî yî!

- Çawa heval! Ez gundî me.

- Hevalno!... Ku hûn heya sê deqeyan, na na sê saniyeyan, hiş nebin dê serokomar we bihêle û biçe!

- Bibore heval… Li min bibore, lê li Çekdar nebore.

- Ez li we her duyan jî diborim.

Xwe nêzîktirî wî kirin.

Ramanên wî, ji otobus a ku bilez dar û beran, gund û bajaran li pey xwe hişt bileztir bûn… Loma jî dema ku çavên wî, li ser rê bi tiştekî ve diman, ramanên wî diseknandin an jî didan jibîrkirinê. Ji bo ku pêşiya vê bûyera wî aciz dike bigire, çavên xwe girt… jixwe ji bo ku xwe ji barana gotinên vingîvala yên ji dengê rêwiyan bi qîreqîr biparêze guhên xwe jî digirt û carinan xwe pirtir dispart, şibaka otobusê. Di nava tenêtiyek ji xwe razî de, li pey ramanên hinek bitirs, nediyar, nû, kevin û bi pirs û bersiv dibeziya.

Piştî şeş salan ez dîsa vedigerime bajarê xwe. Na lo, bajarê min nîn e… Ango bajarê min, tenê ev bajar nîn e. Min wisa pir gund, navçe û bajaran nas kir ku min li her yekî parçeyekî xwe hîşt. Tevli ax û ava wan, mirov û çîrokên wan bûm. Di heman gavê de cihên ku min dît jî tevli min bûn. Şopa xwe li ser bîra min hiştin, bi dar û ava xwe, mirov û çemên xwe. Û her bajarekî nasnameyek da min…

Şeş salan, min di wê riya tozdûmana şeş salan de çikir? Riyan çi kir ji min? Ango, ez vedigerim. Ez di şeveka payîzê de çûbûm. Stêrk diçirisîn. Bayê bêhna kulîlkên payîzê dianî… Ez çawa bûm? Nizanim.

Birastî jî nizanim! Ez dilgeş bûm? Belkî dilgeş bûm… Niha jî payîz e. Payîzê çûbûm, payîzê jî têm, hatim… Wekî ku demsal qet nebuhurî be û neguherî be. Emrê wan şeş salan tenê demsalek e… Na na!... Hooy Xwedê! Dîsa dest bi qîreqîrê kirin. Guh jî nayên girtinê, payîz e… Ez piştî şeş salan, çawa dizivirim gelo? Çi guheriye. An jî ên ku guherîne çi ne? Rûyê min, rûyê min guheriye? De ka ez li wêneyê xwe yê ku min hef-

teya din kişand binihêrim. Wey lo! Burokratek çawa me! Birûyên min, çima wisa gihiştine hev? Ma dikaribûm bikeniyama. Bi tevî vê burokratiyê jî xemek, xemgîniyek heye di çavên min de… Xemek ku tenê ez dikarim bibînim. Min pir li xwe nihêrî… Dayika min bê sedem nedigot: "ewqas nenihêre kurê min! Tuyê aşiqê xwe bibî! Çiqas li min binihêriya, wiha digot… Gelo niha çi dike, sax e yan na?

Di dawiyê de wayê em digihijin bajêr. Bila ev rêwîtî êdî biqediya, ez jî xelas bibûma… Ku ez niha siwarek, hespek dîn bûma dê çiqas xweş bûya. Hevalê ku ez ê wî bibînim çi dike gelo? Ew jî bêsebr e weke min? Me berê qet hev dîtiye û îstasyon weke berê ye? Û ew rojnamefiroş, hêj li wê ye? Ku çawa biçim ez ê li wira binêrim. Jixwe nêzî termînalê ye. Termînal jî nêzî îstasyonê ye jixwe. Xwezî hinek razama. Xwe pir westiyayî hîs dikim. Lê ev westandin ne ya bedenî ye. Giyana min, çavên min, çi zanim, guhê min, dilê min westiya ye.

Oha xuyaye ku peyabûn nêzîk e… Çawa xwe dûz û rast dikin. Baş e baş!

Qet nebe niha bêdeng in… Ev heyecan çi ye? Xêr be dilê min!... Ev dar hêj li cihê xwe ye. Dirêjtir û stûrtir bûye. Lê ku yek min nas bike… Ditirsim, wekî ku, dê hinek kes, min bi tilîkan şanê hev bidin. Na na! Pir guherî me. Kes min nas nake! Hewa xweş û paqij e. Wekî berê xweş e. Kevir nû kirine. Rê jî firehtir bûye. Her kes, çawa winda bû? Ez ê pêşî biçûma li ku? Ciyê rojnameyê pir guhertine gelo? Û xwediyê wê yê berê ye? Xwedê bike ku kar nebaş neçin! Ev heyecan jî derbas nebû, çokên min dilerizîn hê jî. Baş e ku karê her kesî pir e her kes mijûl e… An na dê biyanîtiya min pir zû bidîtana. Na, di van saetan de sakîn dibe…

Wayê xuya… Kes li derdorê tune wî mêrikê ji wê derê tê… Rojnameya "Türkiye" di dest de ye. Baş e baş! Sabah Hurriyet, nayên firotinê êdî… Na lo wisa nabe. Helbet ew jî hene… Ha… di destê wê keçikê de ne "Welat"e? Çawa hembêz kiriye, pêçaye… Ku ez jê re bêjim "Merheba!" dê çi bibe? Tu nizanî dê çi bibe? Gihiştim cihê xwe ber derî…

- Rojbaş! (Ji çavên wî xuyaye ku baş e.)

- Rojbaş!

- Gelo Rojnameya Welat hebû? Firoşkar çavên xwe çimqimand:

- Ka binêrim… Heye, fermo!

Gavek zûtir ji vira dûr bikevim û li cihekî tenha bixwînim…

Piştre biçim îstasyonê. Ew heval li benda min e gelo? Mirov di vira re diçe îstasyonê.

Dibe ku li van deran be… Ez li viya binêrim û biçim.

Baş e ku rûniştek jî heye… Êdî dest pê bikim. Bi reng e jî. Rûpelên wê pir in. Dibe ku rastî navên nas jî werim. Jixwe talûka wê jî tune. Lewre wêne, mirovan nas nakin, napeyivin jî.

Ev bang, ev banga ji bo şehîdan çima dane. Kengî hatiye kuştin? Çima nas tê ji min re… Ez kengî mirî me? Ez çima dilerizim wiha. Çiqas delal e jî rûyê wî… Diçirisin, çavên min, min li ku daye kişandinê. Ew ronahiya ku çavê min wiha çirisandiye, ji ku bû? Kenê min ji ku bû? Ev dilgeşî, ji ku derê hatiye û rûyê min xemilandiye wiha… Divê ku demsal bihar bûye. Na na havîn e… Loma min tîşort li xwe kiriye… Xuya ye ku ev wêne di germa havînê de hatiye kişandin.

Lê ez, çi bikim ên ku di vira de nivîsandine rast in, an ez? Ez niha çi bêjim… Hozanek dibêje: “Yarê min… Tu çawa jî bêxem dikenî ji jiyanê re / haya wêneyên te tune ku tu êdî mirî yî…” Niha ez çi bibêjim. Haya wêneyê min na, lê haya min tunebûye ji mirina min… Ango wêneyê min e ya rastî...

Xwedêyo! Du wêneyên dijberên hev hene di berîka min de… Ez wî burokratê di berîka xwe de çi bikim? Qey ez digirîm?

- Wax-wax kurê min! Tu çima digirî. Qey yara te, terka te kir? Negirî kurê min! Tu mêrê qirase yî! Hêj dê pir yarên te çêbin… Ma mêr digirîn?

- Ev kêm bû ji serê min! Qet nebe ez sakîn bim.

- Çima pîrê! Ku mêr bim jî digirîm. Ez jî mirov nîn im.

- Ooy kurê min! Hûn hemû eynî ne, wek kûpa tirşiyê… Çi karê min jê ye! Heya ku hûn pîr nebin, aqil nagirin!

- Ox! Çû. Êvar nêzîk dibe vê carê jî êvar nêzîk dibe… Û vê carê jî ji hêrsê dilerizim. Bi lerizînê hatim bajêr, hê jî dilerizim. Û digirîm jî… Bi bêrî û xemên salan digirîm… Bes e! Min wêneyê xwe jî şil kir bi hêsiran.

- Heval, min tu dîtî. Baş e ku rojeke sekan e. Merheba! Lê tu digirî, na tu nagirî. Tu digirî. Çavên xwe yên hêşînî ku rûyê wî yê girs dixemilînin berjêr kir, li kêleka wî rûnişt. wî jî bi rûyê xwe yê ku sê roj bûn rih û simbêlê xwe jênekiribû bi çavên xwe yên sor û biriyên xwe yên stûr keniya, ango bişirî, li nava çavên wî nihêrî û got: “Mêr nagirîn!” Lê ez giriyam! Dibe ku taviyek biharê bû giriyam… Em biçin êdî…Û ezîtiya xwe ya ku di navbera herdû wêneyan de maye ramiya…

Erê, qediya… Hûn çima wiha bêdeng in… Hevala Binevş… Hevalê Çekdar…! Çima berê xwe dizivirînî… Armanca min ne ew bû ku hûn wisa xemgîn bibin.

Binevş:

- Em armanca te dizanin heval! Lê carinan dixwazim ku lal bibim. Tu gotinek dernakeve ji devê min… Naxwazim bipeyivim… Divê ku tu me fêm bikî. Me te fêm kir lewre. Ev xeyd meyd nîn e…

Dengê wî ji nişka ve bilind bû û rojeva hersêyan pê re guherî… Nemire Heval, Nemire!... Binevş ber pê ve beziya… Gihişt balê, destê xwe da ser milê wî… Hêdîka got:

- Hevalê Nûhat… Heval namire.

Nûhat, sekinî wekî ku lê guhdarî dikir… Binevşê dubare kir dîsa…

Rabû rûnişt, pala xwe da darê. Lê hê jî çavên xwe venekiribû.

Hişê Binevşê, hem hêj li ser vegotina Kendal bû, hem jî, li ba Nûhat bû. Pirsek hate bîra wê. Bilez rabû çû ba Kendal û Çekdar.

- Hevalno, ez ê tiştekî bipirsim. Hevalê Nûhat, di wê dema çûyî de bi hevalên keçik re maye an nemaye? Û hevala ku li ser pişta wî bû keçik bû ne wisa?

Çekdar:

- Erê heval. Ew heval keçik bû… Dibêjin ku Rûçem bûye navê wê… Û di wê dema dawîn de jî, bi hevalên keçik re nemaye… Jixwe ne di koma wan de hebûn, ne jî ew li derekê sekiniye.

Kendal:

-Hevala Binevş! Min vê daxwaza te fêm kir… Daxwaza te ya pê re axaftinê. Çawa nehate bîra min!... Girîng e, ev jî girîng e helbet. Dibe ku tu, hevalên keçik Rûçemê bînin bîra wî.

Nûhat, dîsa serê xwe hejand û wê gotina xwe dubare kir… “Nemire Heval!” Binevş bilez çû balê.

- Na, Hevalê Nûhat… Nemirî ye. Namire!

Dubare kir.

Nûhat dîsa sekinî û vê carê çavên xwe vekir yeko yeko… Wekî ku ji nû ve li dinyayê binihêre… Serê xwe bilind kir li roja ronî nihêrî. Lê hêj li rûyê Binevşê nedinihêrî… Dîsa destên xwe vekir û wekî ku li tiştekî bigere bilind kir, da ber çavên xwe… Pir mezin û ramandar û dîsa pir zarok û biçûk dixuya. Binevş:

- Hevalê Nûhat, xewa te nehat? Veciniqî, destê xwe ji ber çavên xwe danî ser çoka xwe…

Binevşê dubare kir. Serê xwe tam bilind kir. Û li nava çavên Binevşê nihêrî…

Xwe rast kiribû, li dora xwe dinihêrî… Li Binevşê… Wekî ku li Binevşê digeriya. Dît û gotina xwe got dîsa!

- Nemire Heval… Na na… Rûçem… Rûçem!...

Wekî ku ji Binevşê re digot. Jixwe Binevş, zûde çûbû balê… Kendal, bi baldariyek mezin li wan dinihêrî…

Rabû çû… Çavên wê, bi çavên Zozanê ketin, herdû jî keniyan û Zozanê ew hembêz kir…

Kendal:

- Ez tiştekî bêjim. Carinan dexesiyê ji we dikim… An jî dibêjim: "xwezî me jî karibûya hev hembêz bikira.

Zozan:

- Heval! Mala te xera nebe! Ma me çend caran li ba te, li ba we hev hembêz kiriye ku tu dexesiyê dikî?

Binevş:

- Li aliyê din heval, ku bibûya an jî ku her kes wekî hev bûya mirov dikaribî her carê we jî, hevalên xort jî, ji dil û can hembêz bikira… Lê nabe. Mesele ez hinek hevalên xort qet naxwazim hembêz bikim… Hinekan! Lê hinek paqij in. Mirov dizane ku talûkeyek tune ye… Mirov dikare wekî hevalên keçik wan hembêz bike. Lê ev jî nabe. Ji ber ku dê balê bikişîne an jî yên din, tiştên nexweş derxin, bigerînin…

- Hevalno, dîsa we qezenc kir! Lê min dît ku we min fêm jî kir, rast e… Û ew mesele "hinek hevalan, kesan" ji bo hevalên keçik jî derbasdar e, ne wisa? Binevş:

- Erê heval. Min ê tiştekî din bigota… Hevalê Nûhat, ji min re got: "Rûçem!" Ku bixwaze ez ê navê xwe biguherînim… Êdî Binevş tune, Rûçem heye, dibe ne wisa?

Zozan:

- Hevala min, ma ez ê çawa hîn bibim? Ji kengî ve ye ku em bi hev re ne? Ez derveyî Binevş navekî din naramim ji bo te. Nikarim bangî te bikim.

Kendal:

- Bila ew tenê ji te re bêje. Û hevalê Mêvan jî ji bîr neke… Navê zaroka xwe gotibû. Dibe ku keçik be. Û navê wê jî deyne Binevş!

- Hooy hevalno! Hûn çiqas dûr û kûr dinihêrin! Hevalê Kendal, ez Rûçem bim jî dîsa Binevş im! Ma qey Binevş namire, li cem hevalê Mêvan jî ez ê tim Binevş bim, Binevş im… Jixwe ez jî ji vî navê hez dikim… Hevalê Kemal û Piling jî min bi vî navê dizanin… Ji bo ku ev nav, bi dev û dilê wan jî hatiye gotin pîroz e li ba min. Lê dîsa jî ku hevalê Nûhat ji min re wiha dibêje, dixwaze ku hevala şehîd Rûçem bibîne di hebûn û kesbûna min de… Ez ê navê xwe biguherînim… Bibim

Rûçem jê re… Bes bila baş bibe… Ku em ji hevalên xwe re nebin derman, viyanên wan pêk neynin, em ê yên kê pêk bînin…

- Tu pir ketî bandora vê bûyerê Binevş!

- Dîsa bi hestên "dayiktî" dipeyivî. Zêde xwe bernede bi vê bûyerê ve… Ditirsim heval… Mirov diçe weleh… Ez bawer im ku hevalê Nûhat ji raman û hestên zêde kûr wiha bûye…

Bi hev re keniyan, heya ku hêsiran di çavên wan de avêt. Jixwe tim wiha bûn… Bi rewşê herî zor jî henekên xwe dikirin...

Dikeniyan, bi mirin û kuştinê, bi zindan û şewitandinê… Li gorî wan ew bûyerên erjeng û awarte jî pir asayî bûn… Jiyan tevayî agir jî bûya asayî bû êdî. Lewre wan; jiyanên nermik, avaman û bêreng, jiyanên di germahiya malan û livînan zûda jibîr kiribû, avêtibû ji lênûska xwe… Loma jî her çiqas ku di gelî û bêriyên veqetînan, li dojehên kuştinan de ji nû ve parçe parçe bûbûna jî; dikeniyan, dibeziyan li axa Kurdistanê… Zêdetirîn jî li ciwantiya xwe; li mêrg û zozanên dilê xwe yê ciwanik û dînik dibeziyan… Bi vî awayî dibûn karxezalên li rûyê dema bêbext… Û di leyîstokên nêçîrvanan de canên xwe jî winda dikirin… Lê dîsa jî dikeniyan û dibeziyan! Dizanibûn ku li rojhilat; hemû leyîstokên jiyanê, bi talûke bûn, diçûn cihên berkendal hemû leyîstok nêçîrvan bûn! Loma jî bi qasî ku dibûn nêçîr ji bêbextî û tarîtiya hundir û derveyî xwe re; dibûn nêçîrvan jî… Gotinên xwe yên asîmanî, karên xwe yên pîroz, meşa xwe ya gernasî, pêk dianîn… Navê wan gelek bûn! Lê carinan tu navekî bes nebû ku rastiya wan bida xuyakirinê… Bi qasî ku navdar bûn, xuyayî û li her derî bûn… Bênav, nediyar û nexuyayî, bêcih û bêwar bûn jî… Lê ew, ew bûn! Û henekên xwe dikirin bi leyîstokên bêbextiya demê… Nebesi hebûn… Lê tu car "Bes" nedikirin.

Û bi qasî jiyana xwe bi kuştina xwe jî digotin: "êdî bes!" Ango ew delal, paqij, ronahî û ciwan dimiriyan jî! Her tişt, gotin û doktrîn, tac û text kevn û qirêj dibûn, winda dibûn, lê ew tim geş, tim ciwan û xweş bûn bi jiyan û mirina xwe. Bi qasî ku sax bûn, şehîd, bi qasî ku şehîd bûn jî sax û jîndar bûn. Û ew çiqas veşartî û nediyar bûn, ew qas jî baş didîtin, rast didîtin rûyê dinyayê… Ango wan di bênavnîşantiya xwe de neynika mezin afirandibû û bi wê neynikê rastiyên dinyayê didîtin, nîşanê hev û mirovê xwe didan… Jixwe demê jî wan kiribû neynik. Demê rastiyên xwe di hebûna wan de dida xuyakirin… Û di wê neynikê de hem dojeh hebû, hem jî buhişt… Û di gel her tiştî her yek çiyayek bû û hûrikek xîz… Her yek çiyayek bû û dilopek avî…

Her yek ji wan bajarek bû û çengek ax… Çengek ax bû, her yek ji wan…

Nobedarê pêjgehê:

- Rojbaş hevalno! Xwarin amade ye!

Hemû li ba hev, lê hinek jî belawela li dora daran rûniştîbûn… Bi nobedar keniyan û gotin:

- Ji te re rojbaş! Em zûde hişyar bûne…

- Ku wisa be, baştir e. Werin em çayê dagirin…

Çûn rûniştin, cih dane hev…

Zozan:

- Hevalê Omer… Maşalah te dîsa çay kiriye wek dimsê… (şekir diavêtin nava çaydanê, dem û derfeta wan tune bû ku yeko yeko û hêdî hêdî biavêjin nava îskanan.) Hûn tim dibêjin: “Hevalên Başûrî, şîrîn vedixwin!” Lê weleh we ji me derbas kiriye! Ma ev çi ye?

- Şêrîn baştir hevalno! Bila tu kes gazinan neke… Lê ku dora we hat, hûn dikarin çaya tehl bidin me.

- Hevalê Kendal, em ê îro neçûna cihekî… Cihê me yê berê?

- Erê hevala Zozan… Em ê berêvarkî bi rê kevin…

- Ez rê nas dikim ha! Yek jê ez im.

- Erê, tu, ez Çekdar… Dibe ku Binevş jî bixwaze were. Ez bim neyê baştir e. Dê hestiyar bibe. Carinan pir hestiyar dibe, carinan jî dibe zarok. Ez çiqas dibêjim zarok bîranînek me tê ber çavên min… Rojekê em çûbûn gundekî… Gund nebû, gom bû. Du-sê mal tenê hebûn, di newalek fireh û kûr de… Malek li vî aliyê newalê, dudo jî li wî alî...

Em çûne mala bi tenê. Ketin hundir. Malik pir baş bû ha… Lê xortekî sêzdeh-çardeh salî li navê diçû û dihat. Binevşa me jî, ji zarokan pir hez dike… Bi wan re dipeyive, dileyîze. Zarok jî hînî wê dibin. Ew roj jî, li wî lawikê nihêrî, -jixwe bi bejna xwe bi qasê hev bûn- got: “Xorto merheba! Tu çawanî!” Lê lawik çavên xwe bi hêrs vekir, satorek derxist ji binê qazaxê xwe û da pey wê… Ji aliyek ve jî digot “tu yî xorto! Ez ê te bikujim” Malik hemû rabûn ser piyan. Pir tirsiyabûn… Lewre ew lawik dîn bû û carekê yek birîndar jî kiribû. Bizinek kuştibû… Em netirsiyan berê… Binevş jî keniya û ber pê ve çû… Lê ku me tirsa malbatê dît, me fêm kir ku mesele zor e… Jixwe wek gurekî har, êrîş dikir… Em pir tirsiyan heval! Ka birame ku hevalek mirov di rewşeke wiha de were kuştin, ku me û malbatê Binevşê neparasta dê bikuşta… Jixwe me ji aliyek nobeda xwe digirt, aliyek de jî ya Binevşê… Hem kenê me dihat, hem jî pir bi hêrs bûn… Carinan bûyerên wiha ecêb jî derdikevin pêşiya

me… Bibore, tu jî dikenî, lê ku tu li wê derê bûya, tu yê jî bitirsiyayî heval… Ew qas nekene! Dema ku ez jî, ji Binevşê re dibêjim "sator û xorto" em dikenin… Lê ew qas jî kenokî nîn e… Ez ji dînan pir ditisim heval! Dînê bi wî awayî…

Ew herdû tenê mabûn. Her yek çûbû cihekî, siya darekê… Amadekariya êvarê dikirin… Binevş hate ba wan! Kendal, bi zorê kenê xwe dabû sekinandin:

- Hevala Binevş na na Rûçem! Dê hinek paşê ez û hevala Zozan û Çekdar biçin cihê xwe yê berê… Çentê hevalê Kemal bînin… Tu yê li vir bimînî?

- Erê ku ne ji hevalê Nûhat bûya, ez ê bihatama. Lê ez li vir bim baştir e… Jixwe hûn ê zû vegerin ne wisa…?

- Erê… Hoo… Mêvanekî me tê… Hûn wî nas dikin ne wisa?

Nihêrîn û nas kirin. Ew xortê Koçer ê ku ji wan re qala şehadeta Kemal û Piling kiribû, ew bû… Rûyê wî sor bûbû û bi xwêdanê jî şil bû. Ber bi wan ve hat bi rûkenî.

- Merheba Hevalno! Wa hûn gihiştine hev… Çawa ne, baş in?

- Spas dikin, tu çawanî?

- Ez jî baş im. Silavê diya min dîsa ji we re hebûn… Hevala Binevş û Zozan, ji we re jî bi taybetî.

Kendal:

- Erê heyrah, bi taybetî!

- Hevalno, xeberek min ê xweş ji we re heye… Min gotibû ku hevalê Kemal û Piling şehîd bûne, ji bo ku komê xelas bikin.

Çavên wan vebûbûn, dilên wan ketibû gurmîniyê… Digotin qey, dê bêje şehîd neketine, sax in… Ew xeber nerast bûye.

- Min je we re gotibû… Duh ez çûm nava bajêr.

Ez û du-sê heval… Min li cenazeyên wan pirsî… Ango me li malbatekê pirsî… Wê malbata ku xwedî li cenazeyên wan derketibû. Me wan dît. Em bi hev re çûne ser goristanê… Hêj ew veneşartibûn… Me li rûyê wan nihêrî… Teqez diviya ku min bidîta… Lewre ji min re gotibûn ku Kemal dikene! Eynî wiha gotibûn hevalno! Gotibûn Kemal di nava wan birînên xwe yên kûr de dikene… Çawa bêjim… Min li rûyê wan nihêrî… Ay hevalno! Bi rastî jî dikeniyan… Kemal dikeniya û ew çavên wî yên hêşîn jî, eynî wek xwe bûn… Te digot qey li cihekî xweş dinihêre û dikene… Ew mabû ku min xwe negirta û bigota; "Ka em wan rakin bibin serê çiyayan, ba hevalan, nemirine sax in"!

Bi rastî jî sax bûn hevalno!... Ango rûyê wan sax û geş bûn… Lê canê wan parçe-parçe bûbûn! Lê dikeniyan… Piştre ew veşartin. Xeberek xweş bû ne wisa?

- Rast e xeberek xweş bû… Lê destpêkê me got qey tu yê bêjî “sax bûn!” Loma em wiha bûn… Tu fêm dikî? Mirov, her çiqas zanibe ku heval şehîd e, venagere jî… Dîsa guh û çavên mirov, dilê mirov, li bendê ye ku rojek hinek werin bêjin: “me dîtiye, me ew dîtiye pir baş bû. Ew xeber nerast bûye!” Vê derûniya bendewar, ji bo hemû hevalên şehîd tê jiyîn. Mînak, ji bo hevalê Egîd jî… Mirov dibêje xwezî yek bihata, bigota: “Egîd li Gabarê ye. Silavan li we dike! Egîd nemiriye… Dibe ku ev bendewarî ev hestdarî; ji nemirtiya şehîdan tê. Mirov wan mirî hîs nake, kuştî nahesibîne û hêviya xwe tu car, ji wan qut nake… Erê, ji rastiya şehadetî ji erjengtî û awartetiya mirina, wiha pîroz tê ev rewş.

Zozan:

- Hûn zanin çi hate bîra min… Dema ku em li Botanê bûn… Carinan gel dihat, ji me re digot: “Me hevalê Egîd li filan derê dîtiye. Hatiye gundê me. Hespekî wî yê spî hebûye… Bi kêf bûye… Te jî niha ji bo hevalê Kemal got… Hemû jî, ji heman rastiyê tênê…

Ozkanê ku gavek berê ji gund hatibû bi hevalekî xwe re:

- Ez çi bêjim… Çawa bêjim hevalno… Mirov pir dilgeş dibe bi rewşek wiha… Ez niha dilgeş im… Ji ber ku Kemal jî, mirinek, şehadetek wiha dixwest… Carekê ji min re gotibû: “ku ez şehîd bikevim, an jî ji vê dinyayê bar bikim rojek… Dixwazim ku weke stranekê bim, li ser zimanê gel û hevalan…” Daxwaza wî ev bû… Hevala Binevş, ka “dayê ez xatir ji te dixwazim” bêje.

Hemûyan bi hev re lê nihêrî, bi çavên bendewar…

- Erê em ê bêjin hevalno… Jixwe heval jî keniya ye… Dayê ez xatir ji te dixwazim… Bi xwendin û zanîn ez serfiraz im… Nebêj kurê min (keça min) bûye eşqiya… Dibim pêşmerge diçim ser çiya…/ Dirêj bû… bû rêyek bêdawî ew stran… Hemû bi hev re di nava wê riyê de dibeziyan, kenê Kemal didîtin… Beza Piling temaşe dikirin… Ew stran bû xeyalek asîmanî… Ji dengê Binevşê yê wek ava çeman… Û ew hemû bûn çûkên rengîn firiyan, firiyan di wê xeyala hevaltiya Kemal de… Binevş jî firiya çû balê di awaza stranê de... Bû qevdek binevş, li ber goristana wî… Got “bibore Heval, bibore…”

Dû stranê bêdengiyek girt ser wan û zozanan…

Zozan:

- Hevalno, xwezî gora hevalan li bajêr nebûya, em biçûyana ba wan…

Kendal:

- Ku li bajêr be jî em ê rojekê biçin… Tiştek hate bîra min hevalno… Ez dibêjim em hefteya li pêşiya me, bikin hefteya Kemal û Piling û şevê li du-sê gundan civînan çêkin… Li ser kesbûna wan, di kesbûna wan da jî li ser lehengî û şehadetê… Hûn dibêjin çi?

Hemûyan bi hev re gotin: “Pir baş dibe heval…”

Zozan:

- Ku wiha be em zû bikin biçin çentê wî bînin… Jixwe wêneyên wan jî hene.

Em dikarin li gel belav bikin… Jixwe li ser xiyanetê jî em ê bisekinin, ne wisa?

- Erê.

- De hûn rabin biçin çi hûn? Ez bi we re têm… Em rabin.

Wekî her gavê bi rextê xwe girt û li bejna xwe ya zirav pêçand… Her çaran jî çenteyên xwe avêtin pişta xwe…

Divêtiyên xwe girtin û xwe ji rê re amade kirin. Xortê Koçer:

- De ka ez jî bi we re werim hevalno! Jixwe riya min jî bi aliyê we ve ye…

- Baş e ka were! De bi xatirê we hevalno! Serkeftin. Em êvarê li gund hev bibînin…

Bi rê ketin û çûn. Wek qefleyek baz bûn li rûyê asîmanê demê… Bazên dilê xwe bûn, û ji hêviyên xwe re difiriyan… Çûn winda bûn di şiverêyên zivronek û zirav de… Asîmanê berêvarkî hêşîn dikir… Çend pelekên ewrê spî konê xwe vekiribûn li navê… Qefleyên çivîkan derbas dibûn, koçber dikirin ji payîzê, ji erdnîgariya rojhilatê. Diçûn germiyanan… Ku neçûna nikaribûn bihatana jî… Ku koçberkirin tunebûya, vegera biharê jî tunebû… Û ku hêviya biharê tunebûya, bask jî tune bûn, firîn jî tunebû…

Binevşê got ax ax!... Ez çiqas pir dibêjim ax… Dema ku ez dibêjim ax, tim axîn tê bîra min… Gelo niha li ku ye? Axîn; wekî axê kûr bêdawî, wekî axê bê cih û bêwar, wekî axê birîndar bû… Wekî Axê, tenê jî bû Axîn, tik û tenê… Tu niha li ku yî Axîn? Carekê wê jî gotibû Ax! Min gotibû “Wîî, tu jî weke min dibêjî Ax!” Gotibû “na! Gotina me yek be jî, wateya ku em hîs dikin cuda ye… Em naşibin hev!” Wiha gotibû, wê jî dengê xwe nekiribû, lê dizanibûn ku, hin tişt hene wan di hinek welatên bênav de digihîjînin hev… Çiqas neşibin hev, ewqas jî dişibin hev… Dema ku li wê bajarê bindest û bimij û dûman bûn jî, rojekê Axînê

gotibû; "Ez naxwazim werim vir… Ez çiqas têm xemgîn dibim!" Hem şaş bûbû, hem jî fêm kiribû. Lewre çend dem bû ku dizanibû di wan hevdîtinên revok û firyar ên wê bajarê tarî û bi strî de; hin tişt siya xwe didin ser sohbetên wanên zarok, rengîn û bi pêl. Lê nizanibû ku ew sedem xemgînî ye… Ew bi xwe jî xemgîn dibû jixwe, xemgînî weke siya wan, tim li pey wan bû lewre. Carinan ramiyabû li ser wê rewşa Axînê… Gelo çi heye di navbera gotinên me de… Ez dîsa çûm. Axîn, tu niha li ku yî… Me stranek bêdawî got… Di demek kurt de stranek bêdawî… Temenê demê û riyên wî bajarî kurt bû, lê temenê hevaltiya me pir dirêj bû Axîn… Mirov bi tu kesî xwe jibîr nakin, min jî xwe jibîr nekir bi kesê re… Lê min xwe di hevaltiya te de jibîr kir Axîn… Ez li wê derê, li wê warê me yê dîn û bêkes mam Axîn… "Min xwe bi te jibîr kir" wekî ku hozanek dibêje: "Min xwe bi te re jibîr kir… Axîn, Kemal êdî bû ax, bû çem, bû kulîlk, bû taveheyv… Piling jî bû ax, bû gulistanên bêdawî…

Ez rabim, ji xwe xewa min nayê. Biçim ba Hevalê Ozkan… Ew jî pir mabû li gund, gelo karê xwe xilas kir… Ha, wayê li wir sekiniye…

Ber pê ve meşiya:

- Hevalê Ozkan, ku divêtî hebe ez dikarim biçim nobedariyê ha! Îro qet neçûme…

- Na heval, ma ji xwe tu, nobedarê Nûhat î. Nobeda herî girîng a wî ye… Pir li min giran tê ev rewşa wî…

- Te, ew berê nas dikir?

- Erê… Hevalekî wisa xweş bû, pir zana û dilnizm bû. Dengê wî jî pir xweş e ha, Binevş! Kemal jî ji dengê wî hez dikir… Dema ku bihîstibû pir bi ber ketibû… Em gavekê paşê bi rê kevin ne wisa? Ku em xwe bera jêrê bidin, encax di dema xwe de bigihijin… Gelo heval niha çi dikin. Ew tiştan dîtin, nedîtin!

- Erê ez jî meraq dikim. Divê ku bibînin. Zozanê cihê wan zanibû. Lê çi kirin, çawa ne gelo? Carinan qet naxwazim ji hevalan veqetim. Ango hem bi her kesî re, her hevalê re li her derê bim, an jî li tu derê!

- Ew jî bêderfet e, lê operasyon didomin, mirov ditirse… Gelo niha çi dikin?

Gelo niha çi dikirin… Çawa ne gelo? Zozan li nava koma zarokan rûniştbû. Zarokên şivan, berxvan û mêvanên wan, xwe ji çîrokê re amade kiribûn û gazinên xwe jî didomand:

- Hay Heval! Xilasî tune ji destê te! Ma diviya ku em zû biçûyana…

- Heval, ew tenê naxwaze, em hemû jî dixwazin. Çîrokên te xweş in.

Kendal:

- Hevala Zozan, qet gazinan neke! Te wan hîn kiriye… Ew kîjan gotine; “Hîn neke, ku te hîn kir jî jibîr neke!” Ê te jî wiha ye… Te carekê xwe bi çîrokbêjiyê daye naskirin û hezkirin. Hemin ku wiha ye, zû bêje ku em jî zû bi rê kevin… Jixwe em jî guhdar in!... Min nizanibû ku ez ê rojekê bibim zarok û ne li çîrokên pîrika xwe, lê li çîrokên hevalekî xwe guhdar bikim…

-De bes heval! Ez dest pê dikim:

Gundî hemû bûbûn kevir. Mêr, li nava zeviyan, li ber pezan, jin, li bêriyê, li ber bexçan, Zarok, di nava heyecana leyîstikên xwe de, li ber kaniya, li ser bênderan bûbûn kevir… Ku bûbûya; mirov dikaribû bigota; keviristan! Lê nedibû, navekî wiha tunebû. Û ew, mirovên kevirîn bûn.

Ronak, li pêşiya hevalên xwe dimeşiya û diramiya… Ew jî wekî her çar hevalên xwe ciwanik bû, çavreşekî bi hêrs bû… Tim diramiya û dipirsî… Niha jî, pirsên wî, dijwar û bêbersiv bûn, lê dîsa jî dipirsiya… Ev gund ji kengî ve wiha ye? Gundî, ji kengî ve wiha ne? Û wan ên ku têne dora van keviran kî ne? Ango ev kevirperest kî ne? Wî, ji xwe dipirsiya û diramiya, dimeşiya. Hevalên wî jî, ji wî dipirsiyan. Çima çima? Got: De ka sebir bikin! Me heya duh jî, digot qey, vana zinar minar in. Lê em îro dizanin ku ne zinar in. Mirovên kevirîn in… Lê divê ku em sedemê jî fêm bikin. Çima bûne kevir û yên ku tên, wan diparêzin; ango wan kevirperestan kî ne? De ka werin, em dîsa biqîrin! Bangî wan bikin, dibe ku bersiv bidin:

“ Hêê… Kevirno! Gundîno! Hûn kengî bûne kevir? Ma mirov, dibin kevir? Heyfa vê gundê nîn e!” Lê tu deng derneket dîsa. Çûn, destê xwe di guhên wan dan. Lê tewş bû, kevir hişk bûn. Û bê guh bûn. Nedibihîstin, nedipeyivîn. Li dora wan çûn û hatin û dîsa qîriyan. Lê nebû. Ronak meşiya ber bi çem ve. Û di dilê xwe de got: Ez ê ji çem bipirsim, dibe ku zimanê çem hebe… Yên din jî, dane pey wî û çûne ber çem.

- Çemo, ho çemo! De ka bêje ji me re van mirovan ango van gundiyan çima û kengî bûne kevir? Çemo, bextê te me, tu bi ava xwe ya zelal bikî, tu bêjî!

Çima dengê me nabihîzin? Destê xwe, li eniya xwe ya xwêdandayî xist, û rûnişt li qeraxê çem. Ew jî, hevalên wî jî pir westiyabûn. Jixwe tenê bûn jî, tik û tenê, li hemberî bajar û artêşên mezin ew tenê bûn û tu warekî wan jî tunebû! Dem, êvarek bêkes û xemgîn bû û ew; li benda bersiva çem bûn! Pêlên çem çûn û hatin û dengekî jê hat: “Ev gundiyana ji nezantiyê bûne kevir. Beriya wê jî, ji bêevîntiyê! Ango rojekê, dengê

"şeytan" hate wan, guhê wan qirêj bû û hezkirin jibîr kirin. Dema ku hezkirinê jibîr kirin jî, bêbextî li xwe kirin… Û piştre jî li hev bêbextî kirin. Piştî ku li hev, bêbextî kirin jî bûne kevir û rûyê xwe yê rastî jibîr kirin. Û ew, bûne kevir, bûne gor ji xwe re.

Ronak, lerizî bi vê bersivê, Xeyrî xemgîn bû, Kemal hêrs bû! Egîd birîndar bû û Mazlûm şewitî. Ewrên baranê derbas bûn ji çavên Ronak. Bersiv, li zora wî çûbû.

Bersiv, ji kevir girantir, ji agir şewatir, ji şûr tûjtir bû. Lê nebes bû! Dixwest ku hîn bibe, ka çima ew gundiyên zindî jî kevirperest in? Bi lez meşiya. Şev nêzîk dibû êdî.

Lê li asîmanan şopa tîrêjan hebû, ewrên lê, rengîn bûn. Lingên wî, gihîştin Deşta Fîsê.

Dît ku xezalekê, li ser Qulingekî baskşikestî digirî. Hêsirên wê, dibin gol. Di wê golê de rûyê xwe yê zarok û hinek jî xemgîn dît. Pirsa wî hate bîra wî, got: "Xezalê, tu çima digirî? Negirî, ez ê pirsek ji te bikim. Çima li wê gundê ku hemû bûne kevir, kevirperest hene û diçin xwe xwar dikin li ber wan keviran? Qey nizanin ku, kevirperestî tewş e. Û kevir jî ker û lal in?

Xezalê got: Ew, kevirperest in Ronak, roniya çavê min! Kevirperest in lewre giyana wan jî, di wan keviran de heps kiriye! Dibêjin qey zindî ne, lê na, ew mirî ne! Xwezî bûbûna kevir, lê na, ji keviran xirabtir in!

Hevalên Ronak hatin dora wî! Xeyrî yê ku, bayê çiyayên Çewlikê li ser porên veşartîbû; Ronak, tu rêzanê me yî! Te pirsî û me da ramandinê. Tu ji me zanatir î Ronak! Apê me yî! Me fêm kir ku hinek kevir in, hinek jî kevirperest… Lê çare çi ye? Ronak? Çavên Ronak ên reş, pirtir çirisîn. Biharek rabû ji dilê wî û xwe li Deşta Fîsê danî… Hemû dîrok bû dilopek aviya ser pelên gulan û kete nava destên wî… Lê mêze kir, rabû piya, ber bi keviran ve çû. Êdî şevê cihê xwe digirt li rûyê dinê, şeveke mijdarê, lê ji biharê, şevekî merd, zarok û destpêka riyek bêdawî… Ronak gihişt ber wan keviran, hevalên wî jî li dora wî bûn. Jiyan hate bîra wî û azadî û stranên evînê. Bayê li porê wî yê ku bi germehiya Heranê reş bûye xist… Hilkişiya ser zinarekî û got:

- Rabin, ji xewa mirinê, rabin! Kevirno, hûn mirov in. Liyaqê azadî û hevaltiyê ne. Rabin, di azadiyê de dest bi jiyanekî nû bikin!

Gotinên wî, weke çirûskên agir, şevê ronî dikirin. Mazlûm, li bilûrekî dixist, Xeyrî stranek digot, li ser azadiyê. Şev; şevek, cîhana malkambax, hêlîna bindestiyê bû. Deşta Fîsê, kulîlk bû li ser porê Ronak.

Heyva mijdarê, di rûyê wan de dipeyivî û qala azadiyê dikir.

Ew miriyên ku bûbûn kevir, hişyar bûbûn ji xewa mirinê… Çavên wan tarî bûn, nedidîtin… Ronak ber bi wan ve çû. Tiliyên xwe yên qelemî hêdîka, weke yên dayikekê, weke yên dayika xwe, li ser rûyê wan gerand… Û ew gav, ew gav çirisîn çavên wan ên kor û gotin “Azadî azadî!” Mazlûm, qevdek kulîlkên Newrozê anî, bi ser serê wan de barand. Kemal, ji daristanên Deryareş, bayê hênik anî ji wan re û Xeyrî, li bilûrê xist. Qala evînê û azadiyê, qala şiyarbûna ji mirinê kir… Û ew kevir û kevirperest, li wê derê, li Deşta Fîsê, bûn mirov! Mirovên çavronahî, dilgeş û ramanbilind… Mirovên ji zinaran zexmtir, ji asîman bilindtir… Ronak, silav da ax û rojê. Silav da warê dayika Uweyş û zarokistana mirov… Û di çemê Feradê de Zîlanê dît, ber pê ve baz dida û dikeniya… Di keskahiya Dîcleyê de Semayê dît, bûbû çûkekî perbelek û dişewitî… Çiqas dişewitî, ew qas azad dibû û bi Çemê Dîcle re dikete govendek bêdawî… Piştre dibû bûkek dest bi hine û kon vedigirt li Agirî û li hemû zozanan… Ronak temaşe dikir bi kenekî… Ronak didît û dilgeş dibû! Keviristan bûbû warê jînê, bûbû gulistan li ser şaristaniyên kevnare û winda, li ser xweliyên “ buhişta winda”…

Ronak cîhanek afirandibû! Ew cîhan paqij û dildar, dost û heval bû. Ji kaniya zaroktiyê û şîrê dayikê diherikî.

- Erê zarokno! Gerçî hûn ne zarok in… Jixwe hevalên gerîla jî guhdarî kirin… Vê gavê bi xatirê we… Niha çîroka me xelas bû…

Zarokek:

- Ronak li ku ye? Wî bi xwe re bînin

- Ronak, li her derê ye, digere. Em ê rojek wê bînin.

Haydê bi xatirê we, kanê ez we hembêz bikim… Hevalno, Hevalê Kendal, hûn çima wiha bêdeng bûne.

- Ez çîrokê diramim heval! Gerîla çîrokbêj e jî… Haydê bi xatirê we hevalno, delalno! Yeko yeko xatir xwestin ji wan… Bi rê ketin. Lê zarokan bi tevli xortê koçer, weke her carî dîsa dan dû wan… Lê ew bilez meşiyan, winda bûn di biniya geliyê kûr û bi dar de… Êdî tariya êvarê dikete erdê… Lê bi wê lezê, dê zû bigihiştana cihê xwe. Di ber zozanek valabûyî de derbas bûn… Vala bûbû, ango xwedî û rûniştvanên wê, koçên xwe bar kiribûn û çûbûn ji ber hatina payîzê… Çûbûn, lewre payîz hatibû… Çûbûn, lewre diviya ku ji nû ve bihatana… Diviya ku bihar bihata. Loma jî bi hatina payîzê çûbûn ew… Lê şopa jiyana wan li wan deran bû hêj.

Xwelî û pêlîstokên zarokan, şûna stûnê konan û piyan xuya dikir hêj… Ango ax û ava wê zozanê, bi tevayê hebûna xwe wan jibîr nekiribû.

Kendal:

- Koçerên vê zozanê, îsal lezandine, berî her kesî çûne… Nizanim çima, çiqas ku koçer wiha koç dikin û em di zozanan re derbas dibin, şûn û şopa wan dibînin xemgîniyek dilê min digire… Dibînî eviya solek zarokan e… Kî çi dizane ku fera wê li ku maye viya benê dergûşê ye.

- Li min jî bandor dike heval… Jixwe çûyîn, veqetîn tim zor û tehl e, bi jan e! Û em jî her kesê her tiştê dibînin. Kî diçe, kî tê, kî rind e, kî nerind e. Çima gelo, kes me nabîne? Em li serê riyan û çiyayan in û her kesî dibînin… Em rûyê dinyê yê veşartî ne. Lê haya dinyê ji me tune…

Çekdar:

-Hevalno, dengek nayê we? Hemûyan bi hev re guhdar kirin.

Erê, dengek dihat. Dengê pisîkê… Xuyabû ku zûde dike newînî… Û ji ber wê newenewa bê encam, hal tê de nemabû… Di binê holika tenûrê ya ku hatibû xirakirin de mexel ketibû û mabû.

Zozan:

- Hevalno, em wê bi xwe re bibin gund.

Çekdar

- Heval ma em niha naçin gund…

Kendal:

- Riya me pir nema Çekdar, ku em bibin bidin gundiyan baştir e. Dê kêfa zarokan jî were… Ma dema ku tu zarok bûyî, te jî hez nedikir ji pisîkan…

- Ho hoo! Ji bo pisîkê ez nikarim zarokatiya xwe bijîm, bidim xuyakirinê!

- Gundî, kî ji te re dibêje "Zaroktiya xwe bîne bîra xwe û bijî"! Hewce nake ku mirov veke… Jixwe tim bi mirov re ye, dîsa gundîtiyê te girtiye…

- Sax bî hevalê Kendal. Tu jî ji eniya hevala Binevş î. Erê heyran bila ez ne küçük burjuva bim, bila gundî bim!... Û piştî ku mirov mezin bibe zaroketî marokatî namîne! Mirov an zarok e an jî mezin… Hûn çiqas romantîk in… Xwezî Binevş jî li vira bûya.

Zozan:

- Meraq neke, Binevş li vir e heval! Ez jî li vir im û tevli wê dibim… Gundîtî jî tiştek ewqas baş nîn e… ( dengê xwe bilind kiribû.) Ku wiha be, heft Kurdistan jî rizgar bibin, dê ev nakokiyên ecêb bidomin!

Kendal:

- Çekdar… Sax bî te min poşmam kir! Lê dîsa jî ez ê pisîkê bînim… Ez wê bixim berîka çentê xwe dibe ne wisa heval?

Zozan:

- Erê Heval. Ka tu bisekine em bi hev re bigirin. Jixwe pisîka kedîkirî ye, ne kûvî ye.

-A ha… baş e ku berîka te jî mezin e… Hiş be psîkê. Dê kekê Çekdar te bikuje…

- Hûn mirov dîn dikin, Zozan. Te jî wek pîrika min peyîvî… Pisîka reben netirsîne, bila bêtirs bijî…

- Maşallah bila pisîk jî bêtirs bijîn… Hûn çiqas ecêb in loo… Ditirsim ku rojek, hûn her du “Komeleya mafên pisîkan” ava bikin…”

- Dibe heval, çawa nabe…

- Erê û em ê te jî bikin serokê komeleyê.

Hevalno, em nêzî cihê xwe bûn. Bêdeng bin.

Zozan:

- Ne ku em nêzîk bûn, em gihiştinê hevalê Çekdar ji hêrsan, te xwe jibîr kir. Ev dara hevalê Kemal bû. Ew tim li vir rûdinişt, radiza. Xwezî gora wî jî li vira bûya. Pir hez dikir ji vira, ji vê derê…

- Na ji cihê xwe jî razî ye, dilxweş e. Ma negotin ku “keniyaye”…

- Erê… Keniya ye. Dikene. Hemû ev in. Ka bixin nav çentê min. Ez dikarim hevala Zozan. Tu yên din bigire heval. Tiştek nema. Îcar berê me li gund e, ne wisa? Ka binêrin ev ne xweliya we ye hevala Zozan… We baş veneşartiye.

- Nizanim Hevalê Kemal, beriya birêketinê, li serê vî kevirê rûniştibû… Em zû biçin. Jixwe heval gihiştine gund. Heyv jî bilind dibe. Û dîsa geş e. Wekî duh, wekî pêr… Ez dixwazim ku vê heyvê zû kevn bibe, biçûk û tarî bibe…

Dibeziyan. Lê beriya bedenên wan xeyal û bêriyên wan dibeziyan… Bi nakokiyên xwe; ango bi hest û ramanên xwe yên nakok û kesbûna xwe ya tarî û ronî, dibeziyan… Bi qasê ku çeleng bûn, westiyayî, bi qasê ku westiyayî bûn nûhatî bûn… Dibeziyan di riyên demê û welatê xwe de… Lê zêdetirîn di riya dilê xwe de dibeziyan… Carinan jî ji xwe dibeziyan. Ji bêhêzî û avamaniya xwe hêzek digirtin û dibeziyan ew bez; rev bû jî. Lewre ji xwe, ji qereqol û tarîtiyên xwe jî direviyan; her yek ji wan revokek jî bû ango. Ma demên revok û qedexe; kesbûnên revok û qedexe nediafirandin?... Û mirov û rastî, hebûn û cîhanên qedexeyî, pirî caran; ên herî delal û azad jî nebûn…

Bayekî nerm rabû û baranê anî bi xwe re.

- Binêrin! Min got, payîz diqede. Payîz qediya bi vê baranê…

Lez kin em xwe bavêjin gund… Divê ku heval gihiştibin gund… Em heya berê sibê encax bernameya xwe ya vê hefteyê amade bikin. Ax payîz qediya, em şil bûn

-Mala te xera be romantîk! Kendalê romantîk… Ma barana payîzê tune qey? Hevalê min.

- Ka hiş bin hevalno! Dengek tê…

- Qey ji gund tê. Em pir nêzîk bûn… Baran gur bûye. Ne dengê baranê ye?

- Na na… Hinek dipeyîvin. wîî! Heval in, heval!... Haa-way dimeşin… Binevş û Nûhat û Ozkan… Ev baran jî çi gur bû.

Merheba Hevalno…

- Hevalno, hûn hatin

- Hevalê Kendal! Nobedar bicîh bûne serbest werin.

Ozkan:

- De ka em biçin hundir hevalno… Qey hûn dixwazin bimirin li ber vê baranê!

Û Nûhat, dîsa dest pê kir rûniştîbû jixwe. Pala xwe jî dabû tehta li devê rê… Nemire Heval… Heval nemire ez bûme baran… Rûçem ez bûme baran… Nemire heval! Ez bûme baran… Rûçem, nemire, baran tê! Ez bûme baraaan… Kendal di dilê xwe de digot:

Tu çi xweş dibêjî! De bêje hevalê min… Weleh em bûne baran… Em bûne baran… Kemal dikene li bin wê heyveronê û em dibin baran…

Dayikê dît ku gotin fêde nake, çû çirayek pêxist û anî ba wan…

Porê wan ê şil, ne bi heyveronê, lê bi agirê çirayê diçirisiya. Weke zarokan paqij, weke axê aderî weke şevê veşartî û weke hêviyê delal bûn… Nûhat, çavên xwe digirt, serê xwe dihejand û digot: Rûçem ez bûme baran… Nemire heval, ez bûme baran…

Barana payîzê ya temenkurt sekinî… Nûhat rabû hemûyan bi hev re dane dû dayikê û çûn hundirê wê mala kevnare… Baran çûbû, bêhna wan jî bi xwe re biribû…

Payîz neçûbû, bahara wan ji xwe re kiribû dil. Dilek bêdawî… Dil neçûbû, çavên wan ji xwe re kiribû war, li dijî demên bi sêdar 9'ê -Tebaxê-2002'yan- în…

# PAŞGOTIN

*Bi rastî jî bûn baran…*

Dema min di sala 2002'yan de vê berhemê xwend; pêhesiyam ku ez di xeweke giran de bûme. Çima? Tevî ku bi salan bû wek kurdekê ez ji şoreşê haydar bûm jî; bi vê berhemê min rastiya şoreşê, êş û xweşiyên şoreşê hîs kir. Lewre, berhema "Em bûn baran" ji aliyê şoreşgerek hêja û leheng ve hatibû nivîsîn. Mizgîn Ronaka ku ji temenê zarokatiyê ve bi hesta kurd û kurdewariyê mezin bûbû û di temenek pir ciwan de berê xwe dabû nav refên şoreşê; bi jiyîn, raman, hest û xeyalên xwe berhemek şoreşê afirandibû.

Şoreşek hat jiyîn, trajedî û qehremaniyên bêhempa çêbûn. Lê bes; ev şoreş, nehat vegotin. Yan jî vegotinên şoreşê girîng nehatin dîtin ji aliyê kes û weşanxaneyên kurd ve. Xwediyên weşanxaneyan gotin; "jixwe em in nivîskar, divê nivîskar navek wan hebe xwedî etîket bin. Ji ber wê ne hewce ye em li berhemên ku ji derên herî zor tên mêze bikin û serê xwe bi wan re biêşînin." Di ser re jî ji vê berhema ku niha li ber destên me ye re gotin; "sloganvarî ye, ne wêjeyî ye. Hevalên girtî ji xwe re xwe mijûl dikin! Ka çi ji wêjeyê fam dikin!" Lê ji ber 'nankoriya'xwe nizanibûn yan jî nedixwestin bizanibin ku ew û weşanxaneyên xwe bi xêra wan 'sloganan' hene.

Di vê paşgotinê de, min xwest ji ber derengxistin û serpêhatiya vê berhemê, van nêrînên xwe bînim ziman û rewşa me ya nexweş û şaş bînim bîra me. Lewre divê em hin tiştan tu carî jibîr nekin! Bi taybetî jî rastî û wefadariyê! Gelo qey kesên bi salan e, temenê xwe ji bo tekoşînê di cihê zortirîn de derbas dikin vê yekê heq kiribûn? Hem jî ji aliyê kesên ku wan wek heval û hogirên xwe dibînin ve!

Lê bawer im hêdî hêdî maske dikevin. Dawî li nêzîkatiyên tarî û nedurust tê. Lewre her tişt vedigere ser koka xwe. Û ger em îro dikarin bi-

nivîsin û biweşînin; ev bi xêra koka me ye! Û em tev baş dizanin ku koka me şoreşa me ye. Em ê bi vegotina şoreşê bikaribin bi dil û wijdan, bi aqil û ramyarî binivîsînin. Yan na em ê ji çi û ji kê re binivîsînin? Em û ji kîjan rastî û dîrokê re bibin bersiv. Divê were zanîn ku yên ji derveyî van rastiyan dinivîsînin tenê derdek wan heye; jî ew û komikên xwe ne!

Ka werin, em di vê berhemê de, sê serpêhatiyên ji hev cuda, lê ji heman êşê, ji heman evînê û ji heman şoreşê bixwînin. Em bi destpêka wêjeyî ya dibêje; “Roj hêdî hêdî diçû ava. Bayê berêvarê pelên daran dihejand, bilbilek dixwend û dixwend di kûrahiya daristanê de” dest bi xwendinê bikin. Û bi taybetî dixwazim balê bikşînim ser paragrafên şîroveyî yên nivîskar. Ji derveyî diyalogan li ser her dem û bûyerê bi vegotinên wêjeyî şîroveyên gelek hêja hene.

Di mijara pêşîn de, em ê Kemal, Binevş, Zozan, Piling, Kendal Nûhat û gelek şervanên din binasin. Li qehremaniya temenên wan ên biçûk biramin û wan birêz bibîr bînin. Em ê bizanibin ku ew ne çîrok in, rastiya herî dildar a welatê me ne. Bi wan re em li herêma Serhedê, bi taybetî li Deşta Mûşê bigerin û zozan û koçerên wan binasin, bibîr bînin. Bizanibin ku êdî ne ew zozan û ne jî ew koçerên Mamediyan mane! Û strana dengbêjiyê ya dibêje: “Çiya gazî dikir digot çiya/ kanê Koçer û akinciyên li van ciyan / temam zivirîn germa bin xaniyan/ Germa bin xaniyan xirab e, tirsim xira bike reng û rûyê van zeriyan… / guhdar bikin û zozanên ku her yek ji wan bihiştik e bibîr bînin. Bizanibin ku ew zozan, îro bûne gorên komî û diêşên. Bifikirin, dibe ku niha Kemal û Piling jî, di wan gorên komî de razayî bin!

Di mijara duyem de em ê serpêhatiya koçberiyê bixwînin. Koçberiya navdewletî û bazirganî! Em ê çîroka Mûrad û Nîhad, Nêrgiz û Asmîna biçûk û Qasimê Hewlêrî bixwînin û bi mirina wan a bêbext re bigrîn.

Di mijara sêyem de em ê serpêhatiya Metînê ku ji ber hovîtiya dîtiye nehatiye nasîn û bûye mêvan! Mêvanê ku ji darbestê rabûye û hatiye bixwînin. Mêvan dê ji me re behsa hovîtiya hîzbîkontrayan bike. Kontrayên ku ji xwe re dibêjin hîzbullah. Yanî leşkerên Xwedê! Lê jixwe gelê kurd, navê wan ê rastîn zanî û ji wan re got: “hîzbulşeytan” Behsa hevalê bêbext Eliyê xwefiroş bike. Em ê bi serpêhatiya Mêvan xemgîn bibin lê dawiyê jî em ê bi vegera wî ya malê kêfxweş bibin û bi navê wî yê ‘Mêvan’ ku ji ber nenasbûna wî lê hatiye danîn bikenin.

Gotina dawî; spas ji bo Mizgîn Ronakê ku berhemek wiha hêja û

rast pêşkêşî me xwendevanan kiriye û navê wê daniye "Em bûn Baran!" Em jî dibêjin bi rastî jî şehîd û lehengên Kurdistanê bûne baran û bi bereketa xwe axa welatê xwe yê bêhempa av didin jiyandar dikin. Kî bûn ew? Baran bûn… Hê jî dibarin û bi her barînê re bêhna xwe belav dikin… Bi her barînê re dilê me ji valahî û qirêjiyên demê dişûn. Em jî bi rêz û hezkirinên bêdawî wan bibîr tînin û hewl didin layîqê keda wan bimînin.

***Dîlan Aydin***